



bang a heq ji kelhaamed

kovara Îslamî çandî û hunerî


Sal: 3 • Jimar: 8 • Bihar 2011 • Biha: 5 TL

“Ez çî bikim, min ‘ecele kir, ez di zivistanê de hatim;

Hunê di bihareke wek cennetê de werin.

**Tovên nûrê ku niha têne çandin,
ewê di dema we de kulîlkan vekin.”**


(Munazarat, Seîdê Kurdî)



**Çend Roj Li
Kurdistana Iraqê**



**Fêmkirina
Rîsaleyên Nûr**



Mela Ahmedê Xasî



**زێنانی گێڤی
ژێڤێ ره ڤێڤی**



Şêx Ahmedê Xanî

Ey wasîteyê wicudê kewneyn
Şayesteyê qurbê qabe qewseyn

Şahînşehê textîgehê Medîne
Mu'cîz ji te ew qeder me dîne

Seyra felekan li nik te gavek
Fexra melean ji te silavek

“Şeqqel qemera” te yek îşaret
“Zağel besera” te yek îbaret

Ey padîşahê serîrê “Lewlak”
Rabe here asîmanê çalak

Hazir ji te ra “Buraq” û “Refref”
Şatir bi te ra ferîşte ref ref

Da refî bibin ji ber te perde
Bê perde digel xwedê xeber de

Bêje Tu Qadir û Zulcelal î
Bêje, Tu Qedîm Layezal î

Em fanî û jar û miştexak in
Hadî ne tu bî, xwe em helak in

Ewwel ji bo çi da me te'zîm
Danî li serê me tacê tekrîm

Teşrîfî xîlafetê, te da me
Gava te emanetê xwe da me

Me'lumê te bu, ku em nezan in
Qedre wê emanetê nizan in

Herçî te ji bo me kir îrade
Yek zerre me lê nekir ziyade

Haşa ji kelimê refeta te
Dûr e ji celal û rehmeta te

Kufr û gunehan bikî behane
Lâîq te bitin ev e şahane

...

Qehra xwe bikî eger tu zahir
Cennet li me dê bibîte agir

Wer feydê biket sehabê rehmet
Dozex li me dê, bibîte cennet

Ger kafir û ger gunahkar in
Bîl cumle ji te umîdewar in

Kes nîne ji kafir û 'usatan
Mezher nebitin ji bo sifatan

Kafir buyîn em bi ismê Qehhar
Çeffar e ku em kirin gunehkar

...

Fîl cumle me cumle xas û 'aman
'Asî û şeqî û natemaman

Têk ra bi şefeta xwe xas ke
Vêk ra me ji agirî xelas ke

Amadekar: Necat Özdemir

Kewneyn: Dinya û axret

Şayeste: Hêja

Qurb: Nêzîkî, nêzîkbun

Qabe Qewseyn: Bi qasî du kevanan nezişkuna Allah
te'ala di Mî'racê de

Şeqqel Qemera: Dûcîbûna heyvê, mu'cîzeke
resulullah e.

Zağel Besera: Şaş nedîtin

Serîr: Text

Lewlak: Hedîsa Qudsî ku Allah dibê: “Heke tu
nebûya...”

Çalak: Fe'al, bi can

Ferîşte: Melek

Refî: Rabin, bêne hîlanîn

Miştexak: Şayanî axê ne

Tekrîm: Rumetbilindî

Refet: Piyarî, merhemet

'Usatan: Gunehkaran

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

Ji Weşankar

Bismîhî Sûbhanehû

Ji bona gihîştina biharê, em hemd û şukrê xwe ji rebbê ‘aleman re dikin û bi qasî gul û çîçek û xweşikahiyên biharê, salat û selamên xwe ji ruhê Resulê Ekrem re dişînin. Dîsa em silav û rehmet û bereketa Xweda, li xwendevanên xwey hêja dikin.

Dîsa ronahiya, avêtina roja hîdayetê, giha me. Dîsa kaînat weke bukekê xwe dixemilîne ji bona dîlan û ‘îda Muḥammedî. Dîsa Kelhaamed, “**Xêrhatin**”a xwe teqdîmî “bihara dila” dike.

Meşa Kovara Kelhaamed didome. Demsal bi demsal, sal bi sal zikrê me her ewê bidome însaallah. Kelhaamed, bi lutfa Xweda bûye mekteb û zanîngeheke hêja û roj bi roj xebat, û nivîsên hêja di vê zanîngehê de zêdetir dibin. Belê, ji bona çêtir û sipehîtir bibe, hinek tewsiyên me li nivîskarên me hene. Em dixwazin wan daxwazî û bîranînên xwe binvîsin.

Hinek Bibîranîn Ji Bona Nivîskaran!

Em dixwazin, hinek xususan bibîra nivîskarên xweyî hêja û xwendevanên ku nivîsên xwe ji me re dişînin, bînin. Ji bona pêşveçûn û sipehîtiyê divê birayên me li van xususa miqate bin. Evana rica û daxwaziyên me ne.

- Divê nivîskarên me hino hino êdî hînî îmla û gramera Kurdî bibin û nivîsên xwe bi nivîsandineke rast û sipehî binvîsînin û ji me re bişînin.

- Digel qîmetgirtina devok û zaravayan; ji bona **nêzîkbûn, fêmkirin û di nivîsandinê de wekhevî** bibe, em rica dikin ku nivîskarên me, di nivîsandinê de li **zimanê Kelhaamed yê muşterek** miqate bin û nivîsên xwe li gor vî esasî binvîsînin. Heger lazim be ku em mînak bidin: Di ciyê “**Xuda, Xwoda**” divê em “**Xweda**” binvîsînin. Yan jî di ciyê “**Win**” de em “**Hun**” binvîsînin. Di xebirdanê de devok û lehçe ne muhim e; belê di nivîsandinê de divê standartek hebe.

- Divê em bi zimanê ferhengî û kitabî nenivîsînin ku

bibe sebebê nefêmkirinê.

Çaye ji peyvê û nivîsandinê fêmkirinê na xwendevana ye.

- Ji roja ku kovara me dest bi neşriyê kiriye, xebatên pir hêja tene amadekirin û dighîjin me. Seyda, mezin û birayên meyî hêja, bi qedr û qîmet û geyretkêş, divê bizanibin ku ev xebatên wan pir pîroz û mubarek in. Her çiqas ji ber ku kovara me ji sê meha carekê dertê û pelên kovarê têrê nakin ku; em hemî xebatên xebatkarê hêja bidin jî, divê nivîskar û xebatkarên doza heq bizanibin ku ewê nivîs û xebatên wan ji vî milletê jar û perîşan re mîras bimîne û muheqqeq rojekê ewê bighîje destê hewcedara. Belkî ewê bibînin ku rojekê xebat, werger yan jî nivîseke wan di destê zarokekî Kurd de ye û “*Heyata Îbrahîm ‘aleyhisselam*” dixweyne; yan jî li aliyekî din ewê zarokên Kurd ji heyat û “*şîreta Resulê Xweda sual û cewab*”ên hatine amadekirin ji hev bipirsin û hîn bibin. Bila nivîskar û xebatkarên Îslamê gemê nexwin. Xweda helbet ewê xebatên wan bê semere û fêkî nehêle. Baxusus xebatên hînker û ‘ilmî pir bi qîmet û giranbiha ne.


Di vê jimarê de jî ewê mijarên balkêş hebin. Em hêvîdarin ku xwendevanên me, ewê van nivîsan hur hur bixwînin û ji naveroka vê kovarê fêdê bibînin.

De vê jimarê de, ji ber “**Meha Wîladeta Pîroz**” û “**Salvegera Wefata Bedîuzzeman**”, me ev herdu mijar derxistine pêş.

Heta jimareke din sipartî Xwedayê ‘aleman bin û em hêvîdarin ku hunê ji bona sitarkirin û muweffeqiya xebat û xizmetên me, du’ayên xwe, ji me qut nekin. Wes-salam...

Pêxemberê Me Kerem Kir.....	3
Xutba Xatirxwaziyê.....	4
Pêxemberê Axirzeman.....	M. M. Bêcirmanî.....6
Ji Bediuzzaman Seîdê Kurdî.....	7
Em Kurd Li Pey.....	M. Kerbela.....8
Bihara Me.....	M. M. Kılıç.....10
Hêbîbê Kanî.....	M. Salih Akay.....11
Wiladeta Pîroz.....	Ali Erdoğan.....12
Hola Muhabbetê.....	Hêvîdar.....13
Rêwîtiya Îslamê.....	M. Zanyar.....14
Mewluda Şiyer.....	M. A. Xerxûrî.....16
Kîjan Rêzan Rehber e.....	F. Şemrexî.....18
Bilbil Cewherê Zatê Gul e.....	M. Cizîrî.....19
Pêxemberê Me Wîha Kerem Kir.....	20
Ji Rêberan.....	21
Bazkên Xwe.....	M. M. Bêcirmanî.....22
Ma Emê Çanda Xwe.....	Abdulkadir Turan.....23
Sucê Me.....	Îbrahîm Êlihî.....26
Çend Roj Li Kurdistanê.....	Ferzan Muhammed.....28
Heyata Bediuzzaman.....	Selamiyê Bilêderî.....31
Metoda Rîsaleyên Nûr.....	37
Exlaqê Xebatê.....	M. Canan.....40
Bira Can.....	M. Şakir.....41
Em Kî Ne.....	Ammar Eyyubî.....42
Kelha 'Edaletê.....	M. M. Tîbyatî.....43
Tew Dinyayê.....	C. Karaman.....44
Ey Dil.....	Dilevî Botî.....47
Barana Rehmê.....	M. Tahir Soranî.....48
Doza Me.....	Dilşadî.....48
Dilo Rabe.....	Şêx Munewwer Berwarî.....49
Çiroka Berfîn.....	M. Çiyayî.....50
Baran Jî Nesekînî.....	Hasan Sabaz.....51
Ey Nûr.....	Muhammed Hênî.....53
Înson.....	M. Faruq Dimilî.....54
Mela Ahmedê Xasî.....	Î. Çebakçurî.....55
Zimanê Kurdî.....	M. Abdussamed Hilmî.....56
Em in ehlê îmanê.....	Îbrahîm Tîmurtaş.....57
Îman Bizotê Agir e.....	M. Abdulquddus Hilmî.....58
Bexçê Zarokan.....	60
Ji Xwendevanan.....	64

✍ Faysal Yaman



Kurdên Misilman in

Li me buye ferz ku peşî em cewaba van pîrsan bidin. Heta em cewaba van pîrsan nedin û bi gelê xwe nedin zanîn em nikarin xwe bi gelê xwe bidin nasîn.

24

✍ Ö. F. Sîpkani

Şazdehê Adarê

16ê Adara 1988an... Rojek ji rojê reş û bi şîn ketiye dîroka me Kurda. Di vê rojê de li Helepçe nêzî 5 hezar musulmanê Kurd bi bombê kimyewî hatin qetilkirin.



30

✍ F. Bagasî



Lîstikên Me

Serê biharê ye, wextê gul û kulîlka ye... Mijara me "Lîstikên Me" ne. Yanî: Di kultura gelê Kurd de lîstik. Bi rastî di kultura hemî gela de lîstik hene.

46

✍ C. Bozaba

Sebêb Viraştîş Însun

Zamun vêrîd yo merdim mun topikê sîlîd yo heywunêk vînen. Tira vun gulal. Binêk unyen tira o xwîr xud îna vun: Ya Rabbî! Tu ina çi viraştî o eşta mun îna sîl, in sil şunena ra?

Sebêb Viraştîş Însun



52

Sal (Yıl) : 3 ♦ Jimar (Sayı) : 8 ♦ Biha (Fiyat) : 5 TL

Bihar (Adar - Nisan - Gulan) 2011

Xwedî û Berpirsiyarê Nivîsaran
(Sahibi ve Yazı işleri Müdürü): Abdulkudus YALÇIN

Çiyê Îdarê (İdare Yeri) : Yavuz Selim Mah. Mehmetçik Sk.
No:71 K: 3/E Esenler/İSTANBUL

Têkilî (İletişim - Sipariş):

Tel : 0212 646 21 72

Gsm: 0533 300 95 45

Web: www.kelhaamed.com

Mail: kelhaamed@kelhaamed.com

PTT Hesap No: Abdulhalim TÜRE - 591 87 91

Yaygın Süreli

Çapxane (Matbaa):

Şan ofset : 0212 289 24 24

Nişe (Not): Mesuliyeta Ramanên Nivîsaran aîdê Nivîsarkan e. Berhemên têne şandin nayan veğerandin.

Pêxemberê Me

(Silavên Xweda Lê Bin)

Wiha Kerem Kir


**Hun di şeş tiştê de soz bidin min,
ezê ji bona cennetê bibime kefilê we:**

- 1- Dema hun peyivîn, rast bipeyvin,
rastiyê bêjin
- 2- Dema we we'd kir, we'da xwe bi cî
bînin
- 3- Di emanetê de emîn bin, qet'en
xiyanetê nekin
- 4- Bi 'îffet bin, namusa xwe mihafeze
bikin
- 5- Çavên xwe ji nêrîna heramiyê
biparêzin
- 6- Destên xwe ji zirarê dûr bikin.
(Ahmed b. Hanbel)



**Şeş tişt xweşik in; lê ku di van şeş
sinifên însana de bin, xweşıktirin:**

- 1- 'Edalet xweşik e, ku di amiran de hebe,
xweşıktir e.
- 2- Camêrî xweşik e, ku di dewlemendan de
hebe, xweşıktir e.
- 3- Wera' (teqwa zêde) xweşik e, ku di
'aliman de hebe, xweşıktir e.
- 4- Sebîr xweşik e, ku di merivê feqîr de hebe,
xweşıktir e.
- 5- Tobe xweşik e, ku di merivê ciwan de
hebe, xweşıktir e.
- 6- Heya xweşik e, ku di pîrekê de hebe,
xweşıktir e. (Deylemî)



Ev şeş tişt, 'emelan mehf dîkin:

- 1- Mijûlbûna bi 'eybên xelkê
- 2- Hişkbûna qelb
- 3- Hezkirina dunyayê
- 4- Hindikbûna heyayê
- 5- Daxwaziyên dirêj
- 6- Dewamkirina zulmê. (Deylemî)



Xutba Xatirxwaziyê

(Pêxemberê me Hz. Muhemmed (s.x.l) piştî mîladê di sala 632yan de, bi hîcrî sala 10an, di nehê meha zilhîccê, roja îne, piştî zewalê, di newala 'Erefatê de li ser deveha xwe Qeswa, li hember 124 hezar însana, di şexsê wan de ji temamê însaniyetê re wiha xîtap kiriye)

"Hemd ji bo Xweda ye. Em jê re hemd dikin û jê alîkariye dixwazin. Xweda hîdayetê bide kî, îdî kes nikare wî şaş bike. Ê ku Xweda wî şaş jî bike; îdî kes nikare wî bîne hîdayetê. Ez şahîdî dikim ku ji Xweda pêve tu îlah tunin. Xweda yek e, heval û şîrîkê Wî tunin. Dîsa ez şahîdî dikim ku Muhammed resûlê Wî ye."

"Gelî însana! Li xebirdanê min qenc guhdarî kin! Nizanim belkî ji îsal û pêve carî din li vir ez û we hev nebîn.

Gelî însana! Ma hun dizanin hun di kîjan mehê de ne û hun di kîjan rojê de ne û hun dizanin hun di kîjan bajarî de ne? (Sehabiya gotin: Em di meheke muqeddes, rojeke muqeddes û di bajarekî muqeddes de ne.)

Gelî însana! Çewa ev rojê we rojê muqeddes in, ev mehê we mehê muqeddes in, ev bajarê we (Mekke) çewa bajarek mubarek e, wiha jî canê we, malê we û namusa we jî muqeddes e, ji her destdrêjiyê hatiye starkerin."

Hîşyar bin! Muheqqeq zeman li ser çi esasî hatibe dayîn, bi wî hewayî derbas dibe ji roja ku erd û asîman hatiye xuliqandin. (Di pey re ev ayeta Kerîme xwend) "Bêgoman jimara mehan li cem Xweda di kitêba Wî de diwanzdeh in, roja ku Wî asîman û erd xuliqandiye. Çar ji wan mehen heram in. Dîne herî rast ev e. Di wan mehan de li nefsên xwe zulmê nekin." (Sûretê Tewbe, 36) (Musneda Îmam Ahmed)

Guhdariya min bikin! Hunê 'umir biborînin. Nebe nebe! Hun zilmê bikin. Nebe nebe! Hun zilmê bikin. Nebe nebe! Hun zilmê bikin.

Gelî mumîna! Li gotinê min qenc bihîsin û baş fêm bikin! Hemî musulman birayê hev in. Muheqqeq malê misilmanekî ji misilmanekî din re ne helal e, encex ku bi xweşiya dilê wî be. (Musneda Îmam Ahmed)

Eshabê min! Muheqqeq hunê bigêjin Xweda. We çi kiribe Ewê ji we bipirse. Nebî nebî ku hun piştî min şaş bibin û bizîvirin ser halê xwe yê berê û li situyê hev xin. Ê ku li vir hazirin bila vê wesiyeta min bigihînin wan kesê ku li vir ne hazirin. Dibe ku bigihîne yekê wisa ku ew, gotinê min çetir fêm bike.

Eshabê min! Li cem kî emanetek hebe bila vêga bide xwediyê wê. Bizanbin ku new'ê faîzê tev hatine hilanîn. Xweda wisa hukim kiriye. Di serê pêşî de min faîza 'Ebbas ê kurê 'Ebdulmuttalîb rakiriye. Lê belê perê we yê 'ededî ê we ye. Ne zulmê bikin û ne jî ji zulmê re riza nîşandin.

Eshabê min! Bala xwe bidin, çiqas 'adetê ku ji cahiliyê mane tev hatine hilanîn û dibinê piyê min de ne. Xundariya dewra cehaletê bi temamî hatiye hildan. Pêşî min xundariya neviyê 'Ebdulmuttalîb, Rebî'ayê kurê Haris hilaniye.

Gelî însana! Muheqqeq şeytan di vê erda we de bi temamî hêviya xwe ji we birriye. Lê ku hun di karê xwe yê biçuk de bidin pey, wê ev jî, wî dilxweş bike. Ji bo sitara dîne we, xwe ji va tiştê biçuk jî dûr kin.

Gelî însana! Miqata heqqê pîreka bikin û di vê xususê de ji Xweda bitirsin. Pîrek li cem we emanetê Xweda ne, û we namusa wan bi emrê Xweda li xwe helal kiriye.

Çewa heqê we li ser wan heye heqê wan jî li ser we heye. Heqê we yê li ser pîreka ewe ku, nivîna we mihafeze bikin û kesê ku hun jê ne xweş bin bê iza we, nexin mala we; lêbelê ku bê iza we tişkî wisa bikin, Xweda iza we daye, hun karin wan di nivîna wan de bi tenê bihêlin, ku rast nebun hun karin bi lêdanek sivik li wan xin.

Heqe pîreka li ser we eve ku hun bi başî, xwarin û cilê wan temîn bikin.

Gelî mumîna! Ez du emanetan ji we re dihêlim. Ku hun li wan xwedîtî bikin û li pey wan herin hun tu car şaş nabin. Ev emanet kîtaba Xweda Quran a Kerîm û sunneta pêxemberê Wî ye.

Gelî însana! Bêgoman di pey min re nebî, di pey we re jî ummet tune ne. **Hişyar bin!** ‘Îbadeta rebbê xwe bikin. Pênc wext limêja xwe bikin, rojiya remezanê bigrin, zekata malê xwe bidin, bi vîna nefsa xwe hunê pak bikin, herne Hecca mala rebbê xwe û îta’eta ululemrê xwe (rehberên xwe) bikin, bi cî anîna van hunê bikevin cennetê. (Îbnî Mace, Îbnî ‘Esakîr)

Gelî însana! Cenabê Heq, her kî heqekî wî hebûye Xweda heqê wî dayê. Para her kesî ji mîrasê jê re veqetandîye, ne hewceye ku wesyet li xwedî mîrasê bê kirin. Zaruk li ser doşeka kî çêbe ‘eydê wî ye. Ê ku zinayê bike bêpar dimîne.

Gelî însana! Rebbê we yeke. Bavê we jî yeke. Hun hemu zarwê Adem in. Adem jî ji axê ye. ‘Ereb ji ê ne ‘Ereb, û ê ne Ereb jî, ji ê ‘Ereb ne mezintirin. Ê tensor ji ê tenê wî reş, ê tenreş jî ji ê tenê wî sor ne mezintir e. Meznatî bi teqwayê

ye, bi tîrsa Xweda ye. Kî pir ji Xweda bitirse li cem Xweda ê bi qîmet ew e. Kolekî reş li ser serê we bikin amir, û ew jî bi kîtaba Xweda we îdare bike divê hun lê bihîsin û îta’eta wî bikin. Her kes bi sucê xwe mes’ule. Sucê kurr li bav naye kirin, û sucê bav jî li kurr nayê kirin.

Qenc bala xwe bidin! Qet’iyyen van çar tiştan nekin!

Tu tiştêkî ji Xweda re nekin şîrîk.

Ew canê ku Xweda daye û heram kiriye bi neheqî nekujin.

Zinayê nekin.

Diziyê nekin.

“Gelî însana! Wê sibê min ji we bipirsîn, hunê bejin çi?”

Sehabiya wiha gotin:

“Te Qasidiya Xweda bi cî anî, wezîfa xwe eda kir, te wesyet û nesîhet li me kir, emê li ser van şahidiyê bikin!”

(Li ser vîna Resulê Xweda (s.x.l) tîlya xwe ya şehadetê bilind kir, paşî bi ser cemaatê de bir û anî û wiha go:)

“Şahid be ya Reb! Şahid be ya Reb! Şahid be ya Reb!”

(Piştî ku Resulê Xweda xutba xwe qedand, Xweda ‘ezze we celle ev ayeta mubarek şand: **“Îro min dînê we ji we re kamil kir, min ni’metên xwe li ser we temam kir û min ji we re dîn, Îslam neqand”** Sûretê Maîde, 3)



Pêxemberê Axirzeman

Em xwey su'ûdin hamid in
Ku ummeta Muhammed in
Şîret riya wî bernedin
Xuşk û birayên musluman

Me-j rehbera her ew neqand
Me-j dost û yara ew heband
Me dîn û doza wî meşand
Xuşk û birayên musluman

Dîsa dem û qala wî ye
Mewlûd û sersala wî ye
Her cî gulîzara wî ye
Xuşk û birayên musluman

Bê hed selat bê hed selam
Daîm bibarin subh û şam
Ser qasidê Rebbê enam
Xuşk û birayên musluman

✍ M. Muhammedê Bêcirmanî

Pêxemberê axirzeman
Heq rehberê însan û can
Pêxember û meznê me ye
Xuşk û birayên musluman

Ew Ahmed û Muhammed e
Pêxemberê heq sermed e
Dewr û dema wî naqede
Xuşk û birayên musluman

Xwedî û Îdarevanê
Kaînatê pê re peyivî

H^z. Muhammed
(Salat û Silavên Xweda lê bin)



 **Bedîûzzeman Se'îdê Kurdî**

***Kesê Herî Kamil,
Herî Bi Qabîliyet,
Herî Xwedî Exlaqê Xweş,
Rehberê Însaniyetê...***

“Xwedî û îdarevanê vê Kaînatê, helbet bi zanebûn dike û bi hîkmet diserîfîne. Her alî dibîne û îdare dike. Her tiştî, bi zanebûn û dîtîn perwerde dike. Hîkmet û meqsed û feydê di her tiştî de xuya dibin, vîn û rêveberî dike. Madem ê dike dizane, helbet zana dipeyve. Madem ewê bipeyve, helbet bi kesê bi aqil û bi bîr û bi kesê dikare bipeyve re ewê bi peyive. Madem ewê bi bîrbir re bi peyive, helbet di nava bi aqilan de, bi kesê herî bi qabîliyet û fêmfîreh re ku cînsê însan e, ewê pê re bi peyive. Madem ewê bi cînsê însan re bi peyive, helbet di

nava însanan de bi kesê muxatab bê qebûl kirin û bi însanê kamil re ewê bi peyive.

Madem bi kesê herî kamil û zêde bi qabîliyet, herî exlaqbaş û rêberê Însana re ewê bi peyve, helbet bi ewê ku qabîliyeta wî herî bilind û exlaqê wiya baş û xweş, dost û dijmin li ser hemfikir bûne, ji pênc beşa însana, pişkek tabî'î wî bûne, nîvê dinyayê ketve bin hîkmê wî yê me'newî, pêşeroj ev hezar û sê sed sal (vêga hezar û çar sed sal zêdetir e) bi nûra wiyê aniye rewneqdar bûye, qismê însana yê nûranî û ehlê îmanê rojê pênc cara timî pê re bey'eta xwe nû dîkin. Pesnê wî didin û evîna û muhebbeta wî dîkin ku Muhammed ê (Salat û silavên Xweda lê bin) ewê pê re bipeyve û peyiviye. Ewê wî (s.x.l) bike Resûl û kiriye û ji cînsê însan re ewê wî (Salat û silavên Xweda lê bin) bike rehber û kiriye.” (Wergêr: Fexreddîn Şemrexî)

Em Kurd Li Pey Pêxember in

📖 Mela Kerbela

Pêxemberê me Muhammed (Selat û silavên Xweda lê bin) ji bo xelasiya hemî gel û milletan gelek te'de û eziyet dîtiye. Gelek derd û cefa kişandiye ji bo me zêde şewitiye, ji bo em nekevin agirê cehennemê û ji bo di dinyayê de em serbilind û serfiraz bin, ji bin zulma zordara derkevin û heyat û jiyanêke bi ewlehî xelatî me bike, gelek zehmet û eziyet dîtiye. Di vî warî de nimûne zehf in; lê em zikra çend heba kaftî dibînin.

Resûlê Xweda (Selat û silavên Xweda lê bin) xêr û feyda gelê Taîfê xwest û ji bo Rebbê wan, Xaliqê wan bi wan bide naskirin çû Taîfê. Xelqê wir şixwe daxwaza Resûlûllah (Selat û silavên Xweda lê bin) qebûl nekirin, bi ser de eziyet û te'dê nebûyî bi serê wî (Selat û silavên Xweda lê bin) de anîn. Gede û kolên xwe bi dû wî (Selat û silavên Xweda lê bin) xistin. Heqaretên mezin lê kirin, bi kevera lê xistin, heyanî sola wî tije xwîn kirin. Tevî vî qasî dema Meleka 'ezab jê re go: **"Ku tu bixwazî Xweda ewê wan helak bike."** Pêxember (Selat û silavên Xweda lê bin) go: **"Na! Ez hevî dikim ku Xweda ji nesla wan hineka derxe, ji wî tenê re 'îbadet bikin û tu şerîka jê re çênekin."** (Muttefequn 'Eleyhî)

Li hember sêzdeh sal eziyet û îşkencê, muşrikê Mekkehê ku li wî (s.x.l) û sehabiyên wî kirin, heta roja Fetha Mekkehê Qureysîya gotin: **"Em cûn,**

em tev helak bûn, wê Muhammed îro heyfa xwe ji me hilde." Lê Pêxemberê şefqet û merhametê ji wan re go: **"Hûn tev serbest in, ez ne li pey heyf û tolhildanê me."**

Wiha renga cenga Taîf û Hûneynê li hember wan eziyet û cefayan wî jî (Selat û silavên Xweda lê bin) wiha dîgo: **"Ya Rebbê min! Tu Qebîla Seqîfê (gellê Taîfê) hîdayet bikî. Ew nizanin ku ez xêra wan dixwazim"** (Tirmizî)

Pêxemberê dîlovan di hedîseka xwe de wiha dibêje: **"Mesela min û we wek mesela merivekî ku agir dadide, paşê pelapîtik (pinpinîk) û kulî lê dicivin û xwe dadikin nava agir. Ew mirov jî nahêle ku wan heşeratan têkevin agir. Ez jî ji para bi cilê we digrim û nahêlim hûn têkevin agir (ê cehennemê) lê belê hûn xwe ji destê min difilitînin û xwe davêjin agir."** (Feydul Qedîr)

Resûlê Xweda (Selat û silavên Xweda lê bin) bi vî hedîsa han şefqet û merhameta xwe, dil şewat û dil zîztiya xwe hezkirin û xêr xwestina xwe ya ji bo ummeta xwe, eşkere û bi hewakî gelek xweşik li ber çava radixe.

Lê wezîfa me li hember Pêxember (Selat û silavên Xweda lê bin) çi ye? Wezîfa me ev e; ku em Pêxemberê xwe, hebîb û roniya çavê xwe, baş nas bikin, heyat û jiyanê wî rind bixweynin û fêr



bikin û bi malbat û dost û cîranê xwe jî bidin fêmkirin. Û exlaqê xwe, rabûn û rûniştina xwe, li gorê Resûlûllah (Selat û silavên Xweda lê bin) bidin rast kirin. Lewra bi nimûnetî jiyana Pêxember (Selat û silavên Xweda lê bin) jî tevî Cîhanê re bese. Di dinyayê de serkomarek an serokwezîrek ku bixwaze gelê xwe çewa îdare bike, ferz e li jiyana Pêxember (Selat û silavên Xweda lê bin) mêze bike û tim wî jî xwe re bike rêber û mîsal. Lewra Resûlûllah (Selat û silavên Xweda lê bin) îdarevan û pêşkêş û îmamê hemî însaniyetê ye.

Dema Pêxember (Selat û silavên Xweda lê bin) dikete nav millet, bi mutewazî û xwe danînê, jî milletê nedihate ferq kirin. Heta carek şehabe rûniştî bûye, Resûlûllah (Selat û silavên Xweda lê bin) jî li wan avê belav dikir. Di wê demê de yekî gērîb jî derve hatibû, dixwest ku Pêxember (Selat û silavên Xweda lê bin) nas bike. Ji şehaban re dibêje: *“Mezinê we kî ye?”* Di cewaba wî de Resûlûllah bi rewşek mutewazî û şikandî, vê hedîsa xweya kurt û heyânî qiyametê bibe şîret û bîngêh û esas jî hemî pêşkêş û seroka re dike û jî wî kesî re dibêje: *“Mezinê millet: ê ku xizmeta wan dike.”* Bi vê hedîsê hem da zanîn ku ez mezinê wan im; hem jî bi nesîhet û şîret û jiyana tevgerê xwe dersek mezin da hemû serok û mezinê dewlet û millet û ‘eşîran.

Resûlê Xweda (Selat û silavên Xweda lê bin) nimûne û mîsal e, jî bo hemî qumandaran. Lewra Resûlûllah di cenga de qumandarê artêşa Îslamê bû. Hem bi cesareta xwe, hem bi teqîqên xwe, hem bi dilovanî û şefqeta xwe nimûne ye jî hemî Qûmandara re. Lewra Resûlûllah (Selat û silavên Xweda lê bin) bi deha û zanebûn û teqîq û îstîxbarata xwe di dil de, li dujminê xwe dida û bi dilovanî û şefqeta xwe li zarok û pîrek û ixtiyaran diborî. Bi cesaret û mîrxasiya xwe jî di cenga de şehabe li xwe dicivand û galîb dibu.

Resûlê Xweda jî bo leşkerê Îslamê jî nimûne ye; lewra Resûlûllah (Selat û silavên Xweda lê bin) di dema cengê de jî leşkerekî bêtir cîhad û êrîş û hucûm dikir.

Resûlê Xweda nimûne ye jî bo hemî bavan. Temamê bavan divê ku li heyat û jiyana Resûlê Xweda binêre û bi exlaqê wî (Selat û silavên Xweda lê bin) bi ewladê xwe re mi’amele bike û wan bi terbiya Îslamê û bi hezkirina Xweda û Resûlê wî mezin bikin. Nexasim di navbera wan de ‘edalet bikin, çewa ku

Resûlê Xweda dibêje: *“Ji Xweda bitirsin û di navbera ewladê xwe de ‘edaletê bikin.”* (Buxarî- Muslîm)

Resûlê Xweda nimûne ye jî hemî mêran re, di tevgera wayî bi pîrekê wan re. Lewra Resûlê Xweda (Selat û silavên Xweda lê bin) reîsê xwe bû, û di navbera pîrekên xwe de bi ‘edalet û şefqet û merhamet bu, û di Xutba xweya *“Xatirxwazî”* yê de wiha dibêje: *“Di heqê jinê xwe de jî Xweda bitirsin; lewra ew emanetê Xweda ne li ba we.”* Divê ku mêr li gor jiyana û şîretê Resûlê Xweda tev bigere û wî (Selat û silavên Xweda lê bin) jî xwe re bike nimûne û rehber. Her wiha lazim e ku jin jî diyên mumina, û şîret û nesîhetê Pêxember (Selat û silavên Xweda lê bin) jî xwe re bikin rehber û biya mêrê xwe bikin bê, destûra wan jî mal dernekeve û bê wan kesî jî negre hundir û namûs û ‘iffet û nixumandina xwe biparêze.

Resûlê Xweda (Selat û silavên Xweda lê bin) jî hemî cîrana re jî nimûne ye. Yekî bixwaze ku bi cîranê xwe re çewa tev bi gere, lazim e ku li jiyana û şîretê Resûlûllah binêre. Lewra Resûlê Xweda jî cîranê xwe re zehf bîhn fireh bû û derd û te’de wan kişandiye. Lê rojek cîranê xwe ne eşandiye. Û di vê mijarî de wiha gotiye: *“Hingê ku Cebraîl (‘Eleyhîsselam) tewsiya cîran li min dikir, min digo wê cîran bibe waris jî cîran re.”*

Bi rastî Qasidê Xweda bi hemî hal û hereketê xwe jî me re nimûne û mîsale. Gelek şîret û nesîhet li me kiriye û ka heq û huquqên me li ser hev çinin û ka mezin çewa bi piçûka re, piçûk çewa bi mezinan re tev gerin? Û civak divê çewa be? Qasidê Xweda hemî jî me re îzah kiriye. Bi heyat û jiyana xwe jî nîşanê me daye.

Dema em vana bi cih binin û tetbîq bikin wê li dunyayê emê bi huzûr ewle bin, wê şahî û kêfxweşî bê nav me û emê jiyaneke xweş biborînin. Li axretê jî emê herin beheştê ÎnşaAllah. Lê wexta em Resûlê Xweda (Selat û silavên Xweda lê bin) jî xwe re nekin nimûne û mîsal û Rehber, wê dunya me tevî hev bibe ne huzur, ne rehetî, ne jî ewlehî vecimîne û di axretê de jî ‘ezabê herî mezin heye. (Xweda bistirîne.)

Ji bo vê em van şîretan pêşî li nefsê xwe dikin divê ku li gelê xweyê mezlûm û bindest, gelê Kurd dikin. Lewra em zanin jî geyrî riya Îslamê û nûra Quranê pêve xelasî di tu derî de tune, û sebebê ku îro civak bi şûn de ketiye jî ber ku jî Îslamê dûr ketiye ye... Em tev emanetê Xweda bin.



 M. Mahmud Kılıç

Bihar, navê demsalek serxwebun û jîndebunê ye. Bihar, demsalek ruhekî nû dide nebat û mewcudatê. Bihar, demsalek ruh dide kaînatê; nexasim bêhnek nebewî li kaînatê difure belav dibe. Bê guman em di demsalek gelek bi xêr de dijîn. Çungî vê demsalê pêşwaziya hatina qencê mexluqa Hz. Muhammed Mustafa (s) kiriye. Ruyê erdê ji bo pêşwaziya qencê mexluqa cilê xweyê nû li xwe kiriye. Her wekî hemî nebata ji bo pêşwaziya qencê mexluqa amadekariya xwe dike. Bihar, demsalek mîna teyra sivik, bi xêr û bi bereket. Dilê me kizzîn jê tê. Û bi tevên van xususiyetên xwe em rojnî bi şan û şeref û bi rumet muşahede dikin. Û bi vîna re teblonî xerab jî car car dertên pêşiya me, em di bala wê dene. Di daîra îstîqameta bi taybet evana weke parazîta ne. Em dijîn. Bes digel vana teva dîsa jî rojnî bi hêvî, rojnî xweş, rojnî bi mizgînê barkirî li hêviya me ne. Pêşeroj gelek bi geş e. Belê, pêşeroj mînak îklîma îstîqametê rabu-ye şahê, weke çiyayê îmanê ku hêviyê didin...

Ji ber xwe ve pêk nayê ev hal û tu tiştê bi xwe ber pêk nayê di vî kaînatê de. Evêna bi sedem nûra nubuwetê bi ser me de dibare. Tiştê ku me şil dike

û bi can dike ev nûr e. Hîs û ramanên me dem dem ji gemmar û qirêja xwe dadiwişîne û ji her hêlê de me dibe demsaleke bêrdar. Bi rastî jî ku dema meha Nîsanê tê em vana hîs dikin...

Resulullah (s) herî helîmê însana bu. Li ser exlaqê herî mezin bu. Weke Qurana pîroz dibêje: “Bê guman tu li ser exlaqê mezin e.” Şixwe Hz. Resulullah (s) ji bo axlaqê herî qenc û xweş temam bike, ji bo exlaqê qenc belav bike hatiye şandin. Xwedayê te’ala di warê exlaq de ji bo wî ji însana re bike nîmune û mestere şandiye. Bi hatina wî exlaq gihastin kemala wî, bi rêdanê wî exlaq bi heqîqetê wehyê xemilîne.

Hz. Resulullah (s) herî helîmê însana, herî cesur û comerdê wan, herî ‘adil û fediyokê însana bu.

Resulullah (s) herî comerdê însana bu. Mal û serwet qet nedaye ser hev. Dema dînar û dîrhemek dikete destê wî heta li feqîr û mihtaca belav nedikir venedgeriya mala xwe. Şeva ku dînar û dîrhemê zêdeyî ihtiyaca wî, li mala wî heba wê şevê ranediza. Heta ew pere belav nekira tebata wî nedihat. Ji bil

arvanê ceh û çend lib xurme tişte li mala wî peyda nedibu. Çi tiştê dikete destê wî li feqîr û mihtaca belav dikir. Tişte ji feqîr û mihtaca venedişart. Kesê jê dixwest muheqeq dida wan. Kesek destvala venedgerand. Di dayîne de, di belav kirinê de kesek nedigihaste wî.

Îş û karê hundirê mala xwe gelek cara wî bi xwe dikir. Sola xwe didrut, cilê xwe pîne dikir, karê xwe yê şexsî bi xwe dikir.

Ji hêla heya û fedyê de herî fedyokê însana bû. Weke qîzîkek ciwan fedyok û bi heya bû. Awirê xwe di çavê yekî de cit nedikir. Feqîr, dewlemend, hur, kole îcabetî da'weta hemî kesî dikir.

Hediye û xilatê kesekî bi şunda venedgerand. Çawa xilat distend di cîh de jî belav dikir. Li miqabil vî halî sedeqe ji destê kesekî nedigirt. Sadeqê jê re dihat ji xwediyê wan re digot bibin li feqîra belav bikin. Ji bo Xweda her dem diqaherî, û ji bo Xweda hez dikir. Êrîşê ji bo şexsê xwe 'efu dikir, bes yên li Îslamê dihate kirin tu caran 'efu nedikir. Tişte tu caran ji kesekî nedixwest û ji bo ji kesekî nexwazin jî şîret li musulmana dikir.

Qîmet qet nedida dinyê û ehlê dinyê ji her dem hişyar dikir. Tiştê didît dixwar, tiştê didît vedixwar, û tiştê didît li xwe dikir. Carnan cilê Yemenê, carnan 'eba, carnan kurk û carnan fîstanê 'Erebîstanê li xwe dikir. Hingulîska zîv dixiste destê xwe û ji musulmana re zêr qedege dikir. Her dem diçu ziyareta nexweşa, tevî merasima cenaza dibu, bêhna xweş bi xwe dadikir, bi aheng dimeşîya, kenê zêde nedikir, bi zaroka re weke zaroka, bi ciwan û îxtiyara re, bi kole û mihtaca re weke wan mu'amele dikir.

Li hember lîsk û pêşbaziye xerab derdiket. Dem dem bi ehlê mala xwe re pêşbazî dikir. Bi wan re henek dikir. Bes di henekên xwe de jî tiştê rast digo. Qet tiştê nerast bi henaka jî nedigo. Wextê xwe herdem bi xêrê derbas dikir. Bi eshabê xwe re rudinişt, bi derdê wan hemhal dibu. Ji bo mal û serweta wan cihê jor nedida kesekî. Herkes li ba wî weke hev bû. Ja'r dadayîbu, sêhr lê hate çêkirin dîgel vî qasî ê ku ev xerabî lê kiribun 'efu kir ew nekuştin.

Xwendin û nivîsandina Resulê Xweda tunebu. Feqîrekî pez diçêrand, li golê mezin bibu. Li nava qewmekî cahil û putperest mezin bubu. Xwedayê te'ala bi lutf û îkrama xwe ew xwedî kir, ew di bin terbiya xwe de mezin kir. Di her mijarê de dilbijîna xelqê sitend. Wî hem ji bo dinyê û hem li axretê kire nimune ji bo tevê însana.

Hebîbê Kanî

 Mela Salih Akay

<i>Eya dîlber were carek</i>	<i>Wekî Mecnûn miki hewar</i>
<i>Bibînim bejn û balayê</i>	<i>Çav bi hêstir dil birîndar</i>
<i>Rûyê pîroz û mubarek</i>	<i>Destê min li jîyanê sor</i>
<i>Bibînim carek li dunyayê</i>	<i>Kengî bibînim Leylayê</i>

<i>Tev çûne 'îd û seyrane</i>	<i>Îslama min Qurana min</i>
<i>Stûxwar mam li cîhanê</i>	<i>Tûyî Leyla û Zîna min</i>
<i>Mam di bin berf û baranê</i>	<i>Bi te tenê tê sebra min</i>
<i>Çewa nêrim sebir nayê</i>	<i>Heta sağ bim li dunyayê</i>

<i>Hemî dilxweş çûnî razanê</i>	<i>Salihim her dem jêmgînim</i>
<i>Na panijîn di paldanê</i>	<i>Dil şewitî çare nînim</i>
<i>Rûhê me dê derket ji canê</i>	<i>Tîrsim bimrim te nebînim</i>
<i>Dil bi kulum xewa-m nayê</i>	<i>Mehrûm herim ji dunyayê</i>

Şev dirêjî şevê nîn e
Birîne me axî bîne
Gelo ma wê bê mizgîne
Şevê hat Leyla xweya yê





Wîladeta Teyî Pîroz

Ji me re Rewşen û Newroz

✍ Mela Alî Erdoğan

Bi navê Allahê Rehman û Rehîm.

“(Ey Muhammed) Me tu, ençeğ ji bona ku tu ji ‘aleman re bibe rehmet, şandiye” (Enbiya-107)


Di nava demsalên salê de demsala herî xweş û bi qîmet bihar e. Belê, bihar rewşen û şahî ye. Bihar vejîna tebî’etê ye. Bihar Newroz û nîşana mezinahî û qudreta Rebbê ‘Alema ye. Bihar demsala xebat û pêşveçûnê ye. Bihar rojeke nû ye, bihar newroz e. Hatina newrozê, hatina demsala zikirkirina gûk û kevok û firfirok û çiçek û fêkî heyewanê rengxweş û belekên li bağ û bostana ne. Newroz tesdîqa vê ayeta Xweda ye. “Li eserên rehmeta Xweda binêre. Bê çewa erdê piştî mirina wê sağ dike. Muheqqek wek vîna ewê miriyan jî sağ bike. Û ew ji her tiştî re Qadir e.” (Rum-50) Newroz berxwedan û candarbûna ummeta Îslamê ye, serhildana li hember tağut û zordesta ye, bi dest xistina xeyr û huquqên gelên mezlum e. Heyata civakî ku di zivistanê de leqayî rawestîne dibe, di biharê de ew dîsa candar dibe. Ji temamê wana girîngtir jî, bihar demsala Hz. Muhammedê mahbub e, demsala pîrozbahiya wîladeta Nebiyê Zîşan e. Demsala wîladeta mizgîna Hz. Musa û Hz. Dawûd û du’ayê Hz. Îbrahîmê Xelîl-ur Rehman e. Demsala candarkirina evîna wê ye. Demsala çoşbuna bi evîna mahbubê dila ye. Demsala nûbuna hêviya mezlum û musted’efa ye. Demsala canbuna xebatên Îslamî, xebatên Muhammedî ye. Ji ber wan wesf û hêjahiyên hatina biharê ji gelê me re rewşen û şahî ye.

Bi rastî wîladeta Pêxemberê memduh, bihara dinyayê, bihara temamê însana ye. Dinya bi hatina wî ava bu. Însan, bi hatina wî însaniyeta xwe, lazimatên mi-

rovahiya xwe nas kir. Dinya reş û tarî bu, bi hatina wî bu ronî. Zilm li ser ‘erdê hakim bu, bi hatina wî ‘edalet li ser zemînê bu hakim. Feqîr ‘evd û bindestê dewlemenda bun, bi hatina wî dewlemend û feqîr bun wekhev, ji boy mezinatiya bi teqwayê qezenc bikin, xebitîn. Însan hêşîrê ‘evdîtiya put û senema bun, bi hatina wî, bi naskirin û ‘evdîtiya Xweda azad û serbest bun. Piştê hatina wî însanan gotin; emrê te li ser çavê me ya îlahel ‘alemîn, heye çiqas salat û selam li ser nebiyê te yê emîn. Keç û pîrek wekîna malekî bê qîmet bun, bi hatina wî îradeyê xwe nas kirin. Pîrekên wek diya me ya Xedîce û ‘Aîşe ji nav xwe derxistin, ‘abideke wek “Rabî’a-tul ‘Adewîyye” ji nav xwe derxistin. Ji lew, pîrekên li Amed û Batman û bajarên dinê Kurdistanê, di mihîrcan û pîrozbahiyên wîladeta pîrozê de bi selewat û tekbîra xwe berdidin meydana. Bi hatina wî milletê împaratorî û bajarên nezan ji zilm û êrîşin hukumdara xelas bun. Mirov, bi kuştinê xwe, bi zordestiyên xwe pesnê xwe didan, bi hatina wî, bi ‘îbadet, bi ‘ilm, bi exlaq, bi ciwamêrî pesnê hev kirin.

Temamê erd û bajarên dinyayê ji wî re tî bubun, însan ji tîna ziwa bubun. Bi hatina wî ava heyatê dîtî û ji wê kaniyê têr vexwarin. Beriya hatina wî, zilmên curbicur li bajaran diqevimî, li Amedê însan hev di-kuştin û goştê hev dixwarin, piştê hatina wî Amed bu cihê heyatê, medeniyetê mezî avakirin, ‘alim û zanayên navdar ji nav xwe derxistin. Beriya hatina wê dinya cihê zilm, cehalet û mirînê bu. Bi hatina wî bu cihê ‘edalet, ‘ilm û jiyanê, bu cihê xebata ji boy Cennetê, dinya bu zeviya axretê. Bi hatina wî çagekê nû ji însaniyetê re vebu. ‘Esra se’adetê li erdê saz bu. Yanî hatina wî ji ‘alema re bu rehmet.

Belê, Resulê Zîşan temamê wan guherandin û xweşîtiyan bi wehy û Quranê, bi lebata anegora razîbuna Xweda saz kir. Îro ji avabuna temamê başîtiyan bi şewandina



heyatê di dîrektîfên Quranê de, bi hereketa li pey riza a Xweda û Resulê wî de ye. Heyateke bê Xweda, bê Resulullah û bê Quran tarî ye. Îro dinya muhtacê naskirina Xweda ye. Muhtacê naskirina Quranê, muhtacê naskirina Hz. Muhammed e. Dinya bi zilm û cehaletê tije buye. Însan bê maf, mazlum û reben mane. Qencî û xirabî tevî hev bune. Çare ronahiya Hz. Muhammed e. Milletê mezlum li xelasiya xwe digerin, carna xwe bi gotinên derewîna dixapînin, lê xelasi tenê bi Îslamê ye, azadî encex bi Quranê ye. Îro gelên dinyayê, baxusus gelên rojhilata navîn ronîger in, li ronahiyê digerin, lê ronahî ne di rojava û insanên tabî'ê fikirandina rojavayê de ye. Ronahî di heyata Muhammedê Muxtar û di sunneta wîyê paqij de ye. Însanên ku ji rê û dînê wî dûr bun, ji zalima re bun kole û situxwar, gihastine azadiyê bi rêber kirina wî ye. Çewa ku şa'ir dibêje: "Bê te dunya gelek sar e, weke ji eşqê bêpar e, bê şek tu ji mer dost û yar e, ya Muhammed tuyî çare."

Bi hatina wî dinya bu cennet û bu bihar. Gelê herêma me jî bi qerarin ku jiyandina wî cennetê di herêma me de dîsa saz bikin. Gelê Kurdistanê binîyetin ku bi evîndariya qasidê Xweda, peyama tewhîdê, peyama 'edaletê bigihêjin li temamê erd û bajarên dinyayê.

Gelê Kurdistanê misliman di demsala wîladeta teyê munewwer de gul, beybun, sosin, rêhan û nêrgîzên herî bêhnxweşên newrozê bi salewatan diyariya te dîkin, Ey Hebîbê Xweda.

Gelê Kurdistanê bawermend û heqperest di salvegera mewlûda te de ji te re li meydana nîda û î'lanê eşq dîkin; tu bi xêr û li ser cava re hatî, merheba ey eşq û evîna dila, merheba ey canê canan, merheba ey ji derda re derman, merheba ey afîtaba bê zewal, merheba ey mahê tabê la yezal, merheba ey şerefyabê bi ewsafên memdûh, merheba ey meh-tab û mehpere, merheba ey roniya qelb û 'alema.

Merheba ey ê ku bi hatina xwe deşt û çola kiriye gulîzar û lalezar. Merheba ey ê ku teşrîfa dema tarî kiriye wek roj û mehtap. Were, rojên me bike şen û gulşen, were ronî bike heyatê me wek afîtab ey hêviya mezlum û musted'efa... Salvegera wîladeta te pîroz be, ji 'alema re ronî, xelasi û newroz be.

Hola Muhebbet Ameda Muhammed

Hêvîdar

Pîroz û hem mubarek be li te ey bajarê Amed
Pîroz û hem mubarek be ewê eşqa tey Muhammed
Pîroz û hem mubarek be li wê muhebbeta bê hed
Pîroz û hem mubarek be li gellê te heta ebed

Meha wîladeta Resûl dîsa bi ser me da hate
Ji bo wî Pêxemberê heq gelek civîn li hola te
Têne 'eşqê tev bi carek didin tesbîh û selat e
Li ber wan tekbr û zikra hejî erd û semawat e

Muhebbeta Resûlullah te di qelba de bi cî kir
Gellek bajar û gundên me eşqa Resûl ji te hîn kir
Dewra 'Esra Se'adetê bi te îro ewan bîn kir
Te dijminê Resûlê heq bi eşqa xwe hemî dîn kir

Îro tu pir wefadarî li eshabê Resûlê xwe
Her û daîm ser firazî te wan danî serserê xwe
Te wê muhebbetê b-cî kir di eql û qelbê ehlê xwe
Ez dizanim tu dîlşadî li ser wê eşqa gellê xwe

Ameda Muhammedî tu çiqas şêrîne navê te
Mewlûda Pêxemberê heq nayê pîroz kirin bê te
Xweda te şa bike daîm gellek pirin xêrxwazê te
Ji bo jar û musted'efa didin cehdê mîrxasê te

Gellek zana ehlê 'ilmê dîkin îro bi te fexrê
Te civand ummeta Ahmed weka durrê di nav behrê
E zanim îro deng daye navê-te-l diyarê kufîrê
Bibî nimûne û mîsal di her zaman û her dewrê

Bi eşqa te kêfxweşin pir Huseyn û herdû Se'îda
Ji wî canê xwe derbas bûn ewan wek şêr û 'egîda
Ev berxwedan û mîras e îro li cîhan jêkî da
Xweda j-wê doza mubarek evîna Muhammedî da

Ya Rab tu bajarê Amed bi temam hemî gellê wî
Bixe hîfz û hîmaya xwe hetta dawiya 'umrê wî
Wê Ameda Mûhemmed be hate danîne navê wî
Pîroz û sed mubarek be çiqas xweş tê va dengê wî





Rewîtiya Îslamê Bê Evîna Xweda Naçe Serî

✍ Muḥammed Zanyar

“ (Ya Muḥammed) bêje ku; heger hûn hez ji Xweda dikin, wê çagê tabî'ê min bin (bi min re bin) ku Xweda jî hez ji we bike û gunehê we bibexşîne. Lewra Xweda pir 'Efûkar e û pir bi merḥamet e.” (‘Al-î ‘imran 31)

Resûlullah (Selat û silavên Xweda lê bin) kerem kir: “Mirov bi hezkiriyê xwe re ye.” (Muslîm) Hezkirina Xweda û resûlê wî, lezzet û ruknê îmana kamil in. Ji ber vê Resûlê Xweda (Selat û silavên Xweda lê bin) di hedîsekî de wiha dibêje: “Ev her sê xeslet û tişt di kî de hebin, bi wana lezzet û te'ma îmanê hildide. Hezkirina Xweda û resûlê Xweda li cem wî ji her tiştî jortir û zêdetir e. Hezkirina wî yê li kesa, bi tenê ji bo Xweda ye.

Piştî ku Xwedê ew ji kufrê xilas kir, çewa ji ketina agir nexweş be, ewqas ji kufrê jî nexweş be.” (Buxarî û Muslim)

Ev evîna hanê, çewa li dunyayê dibe te'm û lezzeta îmanê, li axretê jî dibe wesîle û navgîna bextiyarî û se'adeta ebedî û xelasî û giHANDINA hezkiriyê xwe. Dibe wesîla “Ruyetûllah” (Ditina Xwedayê te'ala) û şefa'etê... Lewra di hedîsê de hatiye gotin ku; “Di cennetê da, yek lehze temaşa cemala Xweda, ji tevî ni'metê cennetê girîngtir e.”

Di ayeta serî de tê fêmkirin ku me'na û vegotina “Hezkirina Xwedayê Te'ala” peyçûyîn û hemrêwîtiya Resûlê Xweda ye (Selat û silavên Xweda lê bin) Ev jî, bi tenê, jiyan û doza Resûlûllah (Selat û

silavên Xweda lê bin) ji xwe re bi mînak û tîmsal qebûlîkirinê tê pêk anîn. Jiyana Resûlê Xweda (Selat û silavên Xweda lê bin) ji bo misilmana her tim divê **“kifşkirin”** û **“girêdarî”** be. Lewra H.z Muhammed (Selat û silavên Xweda lê bin) hem wehîy di jiyana xwe de bi cî aniye û hem jî danezandin û tefsîra wê bi en şeklê baş pêk aniye.

Di ayetekê de ev mijar wiha tê ravekirin: *“Bi sond be! Xweda, bi şandina Pêxemberê ji mumînan re, ku ji wana ye û ku ji wan re ayetan dixwîne, wan paqij dike, kitêb û hîkmetê hînê wan dike: (ji mumînan re) lutfêke mezin kiriye.”* (Al-î îmran 164)

Helbet gewabûn û pîvana domandina jiyaneke li gor Resûlê Xweda (Selat û silavên Xweda lê bin) û sunneta wî, di alê ‘alimê Îslamê de hatiye danîn û kifşkirin. Di kitêbeka ‘ilmîhâlê de jî, bi kurtasî ev mijar cî digrin.

Hezkirin û hûbba Xweda xim û eslê mijara me ye. Vê mijarê Sehl (Xweda jê Razî be) wiha tîne ziman: *“Nîşana hûbb û evîna Xweda (celle celaluhu) hezkirina Quran a Kerîm e... Nîşana hezkirina Pêxemberê Xweda jî hezkirin û hilgirtina Sunneta wî ye. ‘Elamet û nîşana vî awayî jî nejbîrîkirina axretê ye... Hezkirina axretê jî, bi xapandina dunyayê nexapandine û jê buğz kirin e.”*

Sufyanê Sewrî (Xweda jê Razî be) dibê: *“Mûhabbet, li gorbûna Muhammed (Selat û silavên Xweda lê bin) e. Muhabbet daîm bûna li ser zîkrê Xweda ye. Ku wexta evana bûne evîn, gere mirov van evîna tim ji hezkiriyê xweyê din jortir û çêtir bibîn e.”*

Îbn-î Fela (Xweda jê Razî be) dibêje: *“Xweda (celle celaluhu) ji Mûsa re (Silavên Xweda lê bin) wiha go: “Ez dikarim di nav dilê ‘ebdê xwe de bi cî bibim, lê belê divê di wî dilî da hezkirineke dinê cî nebûbe. Ew çaq ezê wî dilî bi hûbba xwe tije bikim û wî biparêzim, ji xwe re bikim dost...”*

Qelbê ku evîna Xweda tê de cih girtibe, metîn û zexm dibe. Zû bi zû li hemberê tiştên zor naricife û weş lê nakeve. Elem û mûsîbetê li gor me zor û zehmet, zêde li wan bandorê nakin. Wek Xelîl-ûl Rehman Îbrahîm (Silavên Xweda lê bin) li hember agirê Nemrûd. Wek H.z Asiye li hember zûlma Fîr’ewn. Wek Zuleyxa yê. Pêşî ji bo evîna H.z Yûsif (Silavên Xweda lê bin) gelek tišta dike. Duv re ku îman bi Xweda (celle celaluhu) tîne, evîna xwe her bi bal Xweda (celle celaluhu) dizivîne, îdî li Yûsif nanêre û jibîr dike.

Cuneydê Beğdadî (Xweda jê Razî be) wiha dibêje: *“Gihandina Xweda jî (celle celaluhu) dîsa bi wê riya ku Xweda ferman kiriye dibe. Rêya Xweda jî, bi tabî’iyet û peyçûyîna Pêxemberê Xweda ye ((Silavên Xweda lê bin)”*

Hezkirina Xweda û ta’eta ji wî re, hemî qencî û xêra di nav xwe de dihêwirîne û dicivîne. Gavê riya Xweda (celle celaluhu); meyla bi bal wî ve, îrada di riya wî de, evîna wî, û muhebbeta li hember wî ne.

Riya îxlasê yê herî qet’î û kurt muhebetûllah e. Heta vira em li ser hezkirina ‘ebdayê ji bo Xweda re sekinîn. Gelo nişanê hezkirina Xweda ji bo ‘ebdê wiyê jê hezkiriyê û ku xwe hildipesirîne wî û penaberî wî dibin jî hene? Ku hebin evan ‘elametan çine? Ev mijar jî zêde muhim e...

Xweda hez mirovekî bike, wî, bi xwe dide meşgul kirin. Di vê xisûsê de ev ayet balkêş e: *“Ey ewan kesê ku îman anîne! Kî ji we ji dînê xwe bizîvre, mûheqqeq Xweda qewmekî tîne dewsa wan ku hez ji wan dike. Ew jî hez ji wî dikin. Li hemberê mumîna bi şefqet in, li pêşber kafîra jî xweyî ‘izzet in...”* (Maîde-54)

Resûlûllah (Selat û silavên Xweda lê bin) di hedîseke qûdsî dö wiha dibêje: (Ebû Hureyre riwayet kiriye) Xwedayê Te’ala dibêje: *“Ew kesê ku ji wan ‘ebdê minê ku emrê min hebandine û ji nehyê min jî xwe parastine, û bi van xesletên xwe bi min re bûne dost; ji wan re neyartiyê bikin ezê ji wan re cengê vekim. Li cem min tu tiştê, weke ‘îbadetê ku min ji ‘ebdê xwe re ferz kiriye hêj hîzkirî nîne, ku ‘ebdê min wana dike weşîle û riya nêzîkbûna min e. ‘Ebdê min bê sekin, daîmî bi ‘îbadetê nafilê dixwaze nêzî min bibe. Êdî wexta min hez ji ‘ebdê xwe kir: Ez ji bihîstina wî re dibime guh, ji dîtina wî re dibime çav, ji girtina wî re dibime dest, ji çûyîna wî re dibime pê. Ku ji min bixwaze, didime wî. Ku xwe hilpesêre min, mûheqqeq ezê wî biparêzim.”* (Buxarî)

Di hedîseke din de jî, Resûlûllah (Selat û silavên Xweda lê bin) dibêje ku, Xweda (celle celaluhu) hez ji ‘ebdêkî xwe bike, ewî merivî bi mexlûqatê xweyî din jî dide hezkirin.

Pîştî van xusûsa temamî, rêwiyê riya heq û tekoşînavanê doza Îslamê bizanbin ku hezkirina Xwedayê Te’ala (celle celaluhu) serê her tiştî ye. Ew jî bi sunnet û sîreta H.z Muhammed (Selat û silavên Xweda lê bin) tê pêkanîn... Bimînin di xêr û xweşiyê de.

Ji Mewlûda Sîyer

✍ Mela Abdurrehman Xerxûrî

Destpêk

Hemd ji bo Rebbê me Rebbê îns û cin
Rebbê kewn û masiwa 'erşê mezin

Daye me pir nî'met û fedl û kerem
Em kirin peyda ji wê behra 'edem

Kir nesîbê me Xweda dînê mubîn
Dînê cumle Enbiya û murselîn

Ser Muḥammed bit selat û hem selam
Mislê barana buharê sibh û şam

Aḥmed e sirrê wicûdê her demî
Bûye rehmet ser temamî 'alemi

Serwerê me xatemê pêxembera
Ejdelê mexlûqa tev xeyr-ûl wera

Hem Muḥammed mestirê her nî'meta
Menbe'a deryayê 'ilm û hîkmeta

Rebbê 'alî jê re me kir ummet e
Hemd ji bo wî daye me ev nî'met e

Emrê pêxember kirî Rebbê 'ezîm
Got bibêje ummeta xwe ey helîm

Hez Xweda ger hûn dikin pey min werin
Sîreta min pir bixweynin pey herin

Min bikin her dem Îmam û Muqteda
Hun dibin mezher ji bo hûbba Xweda

Lew nivîsandî me "Mewlûda Sîyer"
Dawe ku em nas bikin xeyr-ûl beşer

Hem bizanin em heyata wî temam
'Alim û cahil hemî tev xas û 'am

Hêvî darim Rebbê me roja hîsab
Me xelas kî pê ji her xewf û 'ezab

Ger dixwazin hûn herin "Daru-s Selam" Her bidin daîm Selat û hem Selam

Dozdehê hîva Rebî'ulewwelî
Nûra Aḥmed der cîhan bû muncelî

Heftê û yek him digel pênc sedî
Bûye tarîxa mîlada Aḥmedî

Hate dunyayê fecara du şemî
Pê muşerref bû temamê 'alemi

Ew Xwedê da Mekkehê erda Herem
Şewqa nûrê daye fexxarî 'acem

Wê şeva kû hate dunyayê hebîb
Têne meydanê gelek tiştên 'ecîb

Wê şevê dunya hemî bû tevde nûr
Ronî daye ta heta Sîna û Tûr

Wê şevê ser dev ketin pût û sanem
Hem tefîya aqirê şahê 'ecem

Wê şevê eywana Kîsra hejiya
Çarde heb bûrcê qewî jê pekiya

Ava behra Tebriyê tev gewwirî
Nav Yehûd bû matem û şîn û girî

Gotine-stêra Muḥammed daye der
Hem ji nav me gû rîsalet rabû der

Wextê çêbûye Muḥammed secde bir
Hem bilind kirbû li esman çav û bir

Çûne mizgîn dane 'Abdûlmûttelîb
Çêbûye bo te sebîkî pir 'ecîb

Tirsiya ‘Abdûlmuttelîb got çima
Secde bir paşî nezer dabû sema

Daye berdêl çûye hewşa mescidî
Got dixwazim ‘alem pesnê wî bidî

Lew Muhammed nav lê danî-b ‘eşq û can
Wê mezin bî şe-nê wî her der cîhan

Çi sebiyê-l Mekkehê ku çêbiba
Wan dişandin nav qebîlên ‘Ereba

Da ji bo jîr û fesîh bit ew weled
Hem cesûr û fêhm û zana mîr û merd

Lewra germa Mekkehê pir zêde bû
Pir ze’îf bûn zarokê kû tê de bû

Çûne Mekkehê qebîla Se’diye
Her yekî bo xwe biçûkek ditiye

Çi kesê rastî Muhammed ku dihat
Wexta zanîbû yetîme rê guhart

Bes Helîma Se’diye wê kes nedî
Çûye gotî mêrê xwe ya Seyyîdî

Kes ji ğeyrê wî yetîmî qed nema
Harisê mêrê wê maye der ğema

Got here bîne Muhammedê yetîm
Kî dizanî qîmeta durra yetîm

Em bibînin belkî jê pir xêr û bîr
Tev hemî zarok û pîrek qîz û mîr

Ketye rê karwanê qewmê Se’diya
Merkeba Haris bezî û da piya

Daye rê lew nûr Muhammed lê siwar
Hêj berê şeht û kulek bû-l nik bixar

Pey Muhammed zêde bû hem şîr û pez
Xêr û bir ket mala Haris pir bi lez

Pir mubarek bû Muhammed nûr-î can
Rehmet û fedla Xweda bû l-ser cîhan

Zû mezin bûye Muhammed roj û sal
Ket meha heşta xeber da pir delal

Ket meha yazde avêt tîr û kevan
Bû du salî çûye ber pez bû şivan

Dûmret û Pêxemberê me bûn şivan
Pez diçêrandin li warê Se’diyan

Rojekî wan dî kû hatin dû nefer
Cil sipî bûn pir xweşik bûn lêv şeker

Destê wana de hebû van cindiyan
Teşteki zêr lê tijî berfa çiyar

Wan dirêj kirne Muhammed her dû wan
Hem qelaştin sînga wî berxê ciwan

Wan deranîn para îblîsê neyar
Şûştine qelbê temîz pê berfa sar

Haris û Dûmre Helîma Se’diye
Gotine tiştê ‘ecêb me jê diye

Wê dema ‘umrê Muhammed bûbû şes
Çû Medîne Amîne l-wir bû nexweş

Ji Medîne wexta rê de hatine
Gundê Ebwa ê wefat kir Amîne

Ma yetîm Pêxemberê bê da û bab
Wî dilê me sohtiyê mislê kebab

Çûye Mekkehê Muhammed dil hezîn
Ket hîmaya kalê xwe ew nazenîn

Kalê wî ‘Abdûlmuttalîb pir delal
Lê dinêrte jê re bûbû wek heval

**Ger dixwazin hun herin Darû-s Selam
Her bidin daîm Selat û hem Selam**

Kîjan Rêzan Rêber e?

✍ Fexreddîn Şemrexî

Ji berê de em merd û serbilind in. Deşt û çiyayê welat, îman û rizgariya civat, ji ‘eşqa mey şeref û azadiyê re şahid in. Merxasê me mêr, gernasê me şêr, feqîr û rebenê me jî, bi xwedî û destegîr bûne. Gir û hûr, biçûk û mezin, bê lome û gazin, hemî guhdar û evîndarê Pêxember bûne. Lewra bereket û şenkayiya şehr û zozana, mizgeft û mabedê hol û şaristana, edeb û gîreta kal û ciwana, zilam û jina, nîşanên dawetê Nebî Nûh û Yûnis Pêxember, rastî û fedekariya Zulkifl û Îbrahîmê putşikendin. Bîr û baweriya me bi Xweda, namûs û terbiya me ji bajara hetta bi gunda jidandiye, xemilandiye ‘eşq û nûra H.z Muhammed (a.s.)...

Rêzanê me çi rêzan bûne. Li ser heqiyê bêtirs, di mêraniyê de fêris, di peyvê de rast û bi heybet, di kar û tevger de, bi gîret, bi cesaret, bi hîkmet bûne. Xwe li ber zor û zalima, li ber gef û gezoka ne tewandine. Peyva xwe bi vir de wir de ne gerandine. Li ba qurre û koledara, xwe ne kirne gulam û şinek. Ber sîtemkar û kafira, nebûne kêfok û henek.

Serdarê me pîşdar, pêşîvanê me pêşeng bûne. Ji bo millet, şivan û hefadê silhê û ‘edalet bûne. Derdê millet, dilşadiya dunya û axret kirne armanc û meqsed. Bextiyar û berxwedariya gellê bindest, ‘izzet û bilindiya însanê bi rûmet, kirne evîna dil, ji ders û şîretê ‘Alî û ‘Ûmerê şêr û ‘adil. Ji xelqê re xizmetkar, xelq jî ji wan re guhdar bûne.

‘Alimê me çi ‘alim bûne. Di ‘ilmê de xwedî ‘ilm, di ta’et de bi teqwa û hîlm, di nav xelqê de bi silh û silm û dujminê neheqî û zilm bûne. Me wesf û şanê qenc û ‘alima, ji Se’îda û Huseyna, ji Xalid û Seleheddîna fêr kiriyê.

Em zanin azadî çi ye. Bi çi hawî. ‘Evdîtiya ji Xweda re, kelîma şehadetê, meriv xelas dike ji koletiya ‘evda û madde û dinyewî. H.z ‘Alî dibêje: “Xweda te hur xuliqandiye nebe kolê tu kesî.”

Soza mirov heqpeşîvana soz e, tahl û tengiyê re xwe nakin miruz tîrş û moze. Ji derda nakin gazin, azadiya gellê mezlûm dixwazin. Xwe dispêrin Xweda, Xweda deryê silamet û serkeftinê ji wan re dike

peyda. Emr û ferzê Xweda bilind kirne, Xweda gav û xebatê wan zexm û rind kiriye.

Piştî herba yekê a cîhanê, zalim û xwînmija, ji bo şêlandina welata bi parsiyonê, pêş kirin bendikên Wilsonê yanî goya her gel, xwediyê mafê serxwebûna xwe bû. Lê ne heqq û maf li ser bala wan bû, ne jî serxwebûn. Derdê wan bû îşgal, bi rengê gumgumok û kefcâl. Ji ber vî, gulam û firotiyê xwey ser mezin, didan pêş bindestên bê mecal. Millet berê xwe dida qiblê, firotiya berê xwe dida meyxañê û tewlê. Hetta bi ‘emelê xwey xirab, gindirîn ser ‘aqîbeta xwey ‘ezab.

Azadiya jin û zilama, ne serbestiya heywanî ye. Ê ku bi çend pirtûkên gîrbîn, lixwe ke cillê Felsefa Marks û Lenîn û çavşîn, xwe li ser filozofa deng û meqamê pêvetir tişteyê nebîn, a soxîn, xwe dihetikîn. Dibe xax û sosret, ji gel û millet re dibe ‘îbret bi hawê di Mehkemê de, li ber parêzgera, ji bîr dike esl û fêslê xwe bi şermîn. Ê ji Xweda dûr be, ji Xweda re bê Nimêj û bi qusûr be, ne di riya Xweda de be, Xweda wî bê xwedî dihêle. Tu dev ji millet berde. Ji xwe re nabe sermiyan. Kesê îmana wî, fedya wî, gîreta wî çû, dunya û axîreta wî çûye. Zalim diçe zilletê, heqqî dighê quwwetê.

Ji pîşdar û pêşîvana, ji sermezîna û sermiyana kesê ne de du rêya Muhammed (s.x.l), ne xebite bi doza Muhammed (a.s) xizmet neke ji millet re xisar e. Ne gell û millet jê hesdike ne jî mezlûm û bindest. Li dunya û axîret, xusran dibe her carê.

Gel û ciwanê Kurdistanê musulman, bi qasî azadî û serxwebûna xwe, berdestî zalim û xwedênenasa nekirye û nake jî. Hewqas bi ‘izzet û serbilind in. Xelq û xortê Kurdistanê bi Quran, ji bo şahî û şerefa dunya û axreta xwe, bi qasî xwe ji Muhammed re (a.s) bikin feda, hewqas ji can û dil li pey wî û evîndarê wî (a.s) nin.

Di salvegera wîladeta te yê pîroz de, me bi Resultî û Rehbertiya te yê ji ummet û mezlûma re, îman û bey’eta xwe nû dikin ey Roniya çavê me û gellê me, Ya Muhammed Ya Resulullah! Li te û li malbata te bin her tim selewatullah...

Bilbil Cewherê Zatê Gul e



Ger çi bilbil cewherê zatê gul e
Lê gulê rewneq ji 'îşqa bilbil e

Guh de zikrê hal û coşa badeyê
Wê bi bilbil ra dixwînit bilbil e

Sosinan sed reng-i avêhtin kemend
Wan ne go dil bendê tayek sinbil e

Sinbilan seywan li dêmê taze kir
Afîtab îro di birca sinbil e

Qet verêkê vê demê hadir dibit
Qisseyâ fêslê ne karê sinbil e

'Erêrên rengîn ji tayên sor û zer
Qumriyan sed reng-i şîrîn xulxul e

Remzeya 'îşqê ji bala hate xwar
Qudsiyan avêhte gerxê xulxul e

Min di dil naşorekê da hestiyân
La cerem hêj neş-eya dağa kul e

Bilbil û perwane ew fêsl û dem înan
Cînsê 'îşqa min tînê derdê "kul" e

Nêrgîza nazîk qed û şehlîya mest
Dîn kirim ez bilbilan sewda gul e

Teb'ê lami' weş zi mînnet bu l-Hesen
Min di dest da Zulfiqar û Duldul e

'Eşqerê bedfî'il-i çî hî kir 'ecêb
"Bareke Allah" xweş bezî espê qul e

Zulf û bîskan pîr ji min dil bir belê
Rîşteya canê Melê ew kaqul e

 **Melayê Cizîrî**



An open book with Arabic text is placed on a dark wooden stand. The stand has a cross-like shape with four legs. The book is open to two pages of text, and the pages are slightly aged. The background is a plain, light-colored surface.

- Kes ji we îman neaniye; heta tiştê ji xwe re dixwaze, ji birê xwe re jî nexwaze.
- Ji her tiştî re mîftek heye; mîfta cennetê jî hezkirina feqîr û miskîna ye.
- Heger zaruwê Adem, weke ji mirinê direve ji rizqê xwe jî bireve, ewê rizqê wî bighêje wî çewa mirin dighêje.
- Ne mumînê îman kamil e; kesê ku musîbeta nî'met û rihetîya jî musîbet hesab neke.
- Ehlê cennetê hesret nakşînin li ser tu tiştê li wan çûbin, ençeş ji geyn wan sa'etê ku tê de zikrê Xweda nekiribin.
- 'Elametê munaşîqa sisê ne: weqtê dipeyive derewa dike, weqta soz bide soza xwe dişkîne û weqta emîn tê dîtin bêbextî dike.
- Berya tu tiştêkî bikî di derheqê wî de bifikire. Heger xêr be bike, heger şer be neke.

- *Dema te xwest ku tu ji ‘eybê xelqê bipeyive, berî wî ‘eybê xwe bibîr bîne.*
- *Dema we dît ku zilamek çûna mizgeftê ji xwe re kiriye ‘adet, bibin şahidê îmana wî.*
- *Kî li dê û bavê xwe qencyê bike mizgîn jê re Xweda jî ‘umrê wî dirêj dike.*
- *Kesê di pişt birayê xwe de jê re alîkar be, Xweda jî di dunya û axretê da ji wî re alîkar e.*
- *Herî qenciya mezin ew e ku, însan tiştêkî bi ‘elime û paşî wî tiştê ‘elimiye, ji birayê xwe yê musliman re jî fêr bike.*
- *Bêguman Xweda dibêje: ez ji ‘ebdê xwe re me; heta zikrê min bike û lêvê wî bi min bileqe.*
- *Hetanî hun karin ‘ilim hîn bikin, wellahî hun xêra wê nastînin hetanî hun pê ‘emel nekin.*

(Wergêr: Mela Kerbela, Ji “Muxtar-ul Ehadîs-un Nebewîyye”)



Ji Mewlana Şêx Xalid

“Muheqqeq di hemî terîqetan de
û xususen di terîqeta Neqşebendî a
bilind de, herî muhimmên edeban ev in;
pêgirtina şerî’eta şerra, ji bona sebra
di zehmetî û tengasiyan de amadehî, di
firehî û şahiyê de heta qewet hebe şukir
kirin, pêgirtina sunneta seniyye û xwe
dûrkirina ji bîd’etan, bi qelbekî şikestî
libergerîna Allah, li dunya û axretê
temîna qelban ku ji mehbûbê heqîqî pêve
‘eleqa qelb bi tu tiştî ve nemîne.” (Ji
Mektuba Pêncan)



Ji Rêber

Helbet divê em teqdîr û qebûl bikin
ku; buhayeke hilgirtina de’wa Îslamê heye.
Razîbûna **“mesuliyet”**ê, hela hela talib bûn,
ji aliyê ferdî ve mehrûm mayîna ji hinek
tiştan, di zehmetiyê de mehrûmîyet, bi tenê
qîmet û buhaya wê mesuliyetê ne. Digel
vêna di esna a îcrakirina wê mesuliyetê de
divê buhayeke layiqî wê meqamê bê dayîn.
Enceğ piştî wî çagî Allah Te’ala mukafata,
temînata ku ji bo wê mesuliyetê hatiye
dayîn, piştî buyîna xwedî wê meqamê,
zehmetiyên ji bona temsîla herî baş
hatine kişandin, li dunya û axretê
dide.

Ji Şehîd Hesen El-Benna

“Ji samîmîbûnê meqseda min ev e: gotinê birayê
musلمان, ‘emelê wî, cîhada wî û hemî tevgerên wî,
divê ji bo razîbûna Xwedê be. Lazim e ku razîbûn û
xelata wî (c.c) ji xwe re bike armanc. Namdarî, nav
û deng, meqam û menşe’et, divê neyê ber çavan. Bi
vî awayî însan, dê nebe bendeyê (kolê) menşe’etê, dê
bibe leşkerê bawerî û raman û dê bigihê van sîfetên
ku Xwedayê mezin ji pêxemberê me re beyan kiriye:
**“Ey Muhammed! Bêje: nimêja min, ‘îbadetê
min, heyata min û mirî na min, bes (sîrf)
ji Xwedayê Rebbê ‘aleman re ye. Tu şîrîkên
wî nîn in. Ez, bi van hatime fermankirin. Ez
misilmanê ewwîl im.”** (En’am 162-163)

“Her tişta kû tu dike û her tişta tu nîyet dike,
Xwedê dizane û dibîne. Tiştên di dilan de, ji wî re
aşîkar e. Wê çagê, di nîyeta xwe de, bi Xwedê re samîmî
be. Bi karê (‘emel) tu dike, razîbûna Xwedê hevî bike.”



“Bazkên Xwe Ji Mumina Re Nizm Bike”

 **M. Muhammedê Bêcirmanî**

Bi navê Xweda û xwedyê ‘alemê. Ê ku layiqî tevê weşên qenc ew e. Lewra tenê Xweda û xwedî ew e. Selat û selam, her û daîm li ser mezinê me, qasidê Xweda, Muhemmed Mustafa be û li ser malbat û eshab û peyrewiyên wan bin, heta hetayê.

Xwendevanên ‘ezîz! Ji bonî em mesûliyeta xweyî li hember gelek tiştê bi bîr bînin, ezê ji we re mesela golikvan bêjim.

Golikvanekî tiral û di xwe re nedîtû hebû. Gundîya wî bi golikvanî girtibû. Serê golikê ribikek havînî pê re qewl kiribûn. Golikvanê tiral jî, qebûl kiribû û diçû ber golikê wan. Qe’îdê golika ye, çirtika didin, moz dikin û direvin herine malê. Golikvan jî wezîfa wî ye, wan vegerîne nehêle herine malê û heta êvarê wan biçêrîne. Belê golikvan ji tiraliya xwe di xwe re nabîne bi pey wan keve. Çiqas golikek moz dike dibêje “*Ribika vê ji min re ne lazim e.*” Bi vî hewayî dewam dike, heta dibe havîn, zemanê heq golik di ber de namînin, tabî ribik jî namîne. Wê havînê tu heqî nastîne û dimîne bê qût.

Gelî birayan! Ji mesûliyeta xweyî Îslamî divê em bi ber însanên xwe û bi ber hevalên xwe bikevin. Divê li ba me pir bi qedr û pir bi qîmet bin. Divê em bi ber dilê wan bikevin. Divê em xwe ji wan re xizmetkar û şivan hesab bikin. Divê em wan maddî û me’newî, terbiye û perwerde bikin. Divê em tehemmûla exlaq û hereketê wanî şaş û ne di cî de bikin. Em nikarin weke golikvan bêjin “*Ribika vê ji min re ne lazim e*” û dest jê bixşînin. Divê em di heqê wan de pir bîn fire û helîm bin. Ku mirov ji hevalê xwe re bîn teng be, “gotin tehl” û “qelb hişk” be ji dora mirov bela dibin. Ku bela bûn pirên cara li dora dujminê mirov dicivin yan jî ew bi xwe ji mirov re dibine dujmin.

Heger em bîn tengiyê bikin, ber însanê xwe nekevin û bi tiştê biçûk em karibin dev ji wan berdin, roj bi roj emê bi xebata xwe ji xwe re dujmina zêde bikin. Bi vî hawayî jî tu carî kes negihaye armanc û mirada xwe.

Divê em ji hevalên xwe re dê û bav bin, henûn

bin, dilovan bin û dilevîn bin. Dînê me yê Îslamê vê ji me dixwaze. Xweda ê ‘alemê ji Pêxemberê xwe Muhemmed re (Selat û selam lê bin) wiha kerem kiriye: “*Bi sedem dilovaniya ku Xweda îkramê te kiriye tu ji wan re (hevalên xwe re) nerm e. Heger tu di têkiliyê xwe de hişkbûnayî û dil sitûrbûnayî wê ji dora te bela bibana. Carê wan ‘efûke, bexşîna wan ji Xweda bixwaz e. Û di dana fermana de bi wan bişewire. Û dema te dilkir xwe bispêre Xwedayê ‘alemê.*” (Suretê ‘Alî ‘îmran, 159)

Gelî bawermend û dozvanê doza heq! Di vê ayetê da Rebbê me; bi me daye zanîn ku exlaqê nerm rehmeteke Xweda ye bi mirov re. Bi nermî û ‘efû kirinê û du’a kirin û şewrandina bi mirova, mirov li dora mirov dimînin û hez ji mirov dikin. Bi exlaqê hişk, mu’amela nexweş, dilsitûriyê, heyf hildanê, dil nexwestin û îstîbdadê mirov ji dora mirov bela dibin, direvin û dibine dujminê mirov. Îdî naxwe divê em van şîreta li guhê xwe kin. Da ku em însan û hevalên xweyî ku me bi sed te’b û ezyetê civandin bela nekin û ji dujminê xwe re neçine aşê.

Gava mirov qedr û qîmet nede heval û însanê der û dora xwe û mirov her roj ji yekî re bêje “*Ribika vê ji min re ne lazim e*” û mirov dev jê berde, çawa xwedyê golika golikvanê bêkêr diguherînin wê xwedyê va însana jî, Rebbê ‘alemê wê mirov biguherîne û hinek însanê din bêxe ciyê mirov de. Wê demê dibe ku şeref û xêra dinya û axretê ji destê mirov here û bifilite. Ev însanê der û dorê me ne bê xweyî ne. Rebbê Kaînatê Xwediyê wan e. Qedr û qîmeta însanê wî li balê zehf e û ji her kesî bêtir li heq û huqûqê mexlûqê xwe dipirse.

Divê em tev zanibin ev heval û însanê me bi te’bek û emekeke mezin bûne hevalê me û li me civiyane. Ji ber vê jî divê em qedran bizanibin û divê ji dil û can em xweyîtiyê li wan bikin. Em emek û te’ba hevalên xwe bi avê de bernedin. Xwedayê ‘alemê me teva bigerîne ji wan şivan û golikvanên mesûliyeta karên xwe zanin û bi heqê wê bi cî tînin. Emanetê Xweda bin.



Ma Emê Çanda Xwe Neparêzin?

 **Abdulkadir Turan**

Belkî roja ku Xweda di Kîtaba Kerîm de go: **“Îqra!”** û piştî vey re bi qelemê sond xwar, çagê çanda bi dev çu, û çaxê çanda nivîsandî hat. ... Lê belê Kurd, qewmekî ku çanda xwe bi dev ava kirine. Pir hez ji çanda bi dev dikan. Belkî di kêman zimana de weke Kurdî çanda bi dev heye. Gotin û sitranê Kurdî bi dev çandeke pir dewlemend aniye wicudê.

Lê Kurdan, ji ber hin sebeba hez ji çanda nivîsandî nekirine. Nivîsandin dîrî çanda me ye. Çanda Kurdî ya nivîsandî di çagê Îslamê de dest pê kiriye. Bi xêr û bereketa Îslamê zimanê Kurdî gihaye çandeke nivîsandî. Lê belê ev, ji geyrî **“Mewluda Nebî”**, hinek pirtukê wek **“Aqîda Îmanê”** û **“Dîwana Melayê Cizîrî”** pir xwedî ji xwe re nediye. Hetta Dîwana Melê jî, ji nivîsandî pirtir hatiye jiber kirin û bûye weke sitranekê û bi wî şeklî belav buye.

Di ‘esra bîsta mîladî de ku, çagê qewmîyetê û çagê ku xwendevana, xwestine çanda xwe li hember dinyayê îspat bikin û pêşveçûna dinyayê bi zimanê xwe bigihînine qewmê xwe di wê çagê hanê de, kî li nivîsandina zimanê Kurdî bûye xwedî ‘adeta poşman bûye. Hinekî ji bê îmkaniyê û pîrê wê jî ji bê hevalî. Qewmê Kurd li nivîsandina zimanê xwe ne bûye xwedî. Û evê ku li Kurdî bûne xwedî dev ji vî karê ha berdane û bi zimanê di karê xwe domandine.

Weke **Ziya Gokalp** li Amedê bi xêr û bereketa **Salih Begê Hênî** (Razîbûna Xwedê li ser wî û tamame şehîdê Îslamê be) bi Kurdî mecmu’ek derxistîye û ji bo elfabeke Kurdî xebitiye. Lê belê kes lê nebuye xwedî. Û Ziya Gokalp piştî ku çûye Selanîkê ew elfabe hûnda kiriye. Û ‘adeta bi ‘inad dest bi qewmîyeta Tirkî kiriye.

Hamîd Aytac... Xettatekî herî mezin e di nav ‘alema Îslamê de... Pir bi nav û deng e. Mizgeftê Tirkîyê hinek jî ji ê dinyayê e nû bi xettê wî hatine tezyîn kirin. Ev **Hamîd Aytac** e bi nav û deng hikaya wî pir geyrî e... Ew **Musa ‘Ezmî** ye. Kî ye Musa ‘azmî? Ewê ku xettê elfaba Kurdî di sala miladi 1909an de li Sitenbolê ji **Xelîl Xeyalî yê Motkî** re çêkiriye. Di tarîxa Kurmancî de ev kêrê hanê, kêrêkî

tarîxî ye. Lê belê kes li Musa ‘Ezmî nebûye xwedî. Û piştî Cumhuriyetê Musa ‘Ezmî ji bê karî û bê xwedîtiyê navê xwe guherandiye, kiriye **Hamîd Aytac**. Û “Musa ‘Ezmî”tiya xwe di paş de hiştiye. Qet ji kesekî re ne gotiye.

Ûstad Bediz’uzzeman (Razîbûna Xweda li ser be) **Xelîl Xeyalî**, ji bo vî karî pir medh dike. Wî wek qehremanekî millî dide naskirin. Ûstad jî hinek nivîsên xwe bi Kurdî nivîsandiye. Lê belê ne dengê Xeyalî maye û ne jî Ûstad nivîsên xwe bi Kurdî devam kiriye. Xwendevanê Kurdî tune bun. Nivîsandinê bi Kurdî man di nav çend însana de.

Lê belê derbê mezin piştî qiyama **Şêx Se’îd** li Kurdî ketiye. Ku piştî qiyamê çanda Kurdî hatiye qat’ kirin. Û piştî vê re ku herfê Îslamî qedege bûn, çand û nivîsandina bi Kurdî em karin bêjin ku di nav Tirkî de xelas bûye.

Piştî mîladî, 1930an de çanda Kurdî bi destê **Bedirxaniyan**, maye ji **“Kurdê laîq”** re. Kurdê laîq, ji bo elfabekî bi latînî xebitûne. Lê belê pir bi pêş de neçûne. Piştî 1980yan **“Kurdê sosyalîst”** ku çûne Îsweç çagêkî nû di çanda Kurdî ya nivîsandî de dest pê kiriye. Îro ku em herin pirtukxanekî Kurdî, emê bibînin ku pirtukê sosyalîst û laîq pirtirin ji pirtukê Kurdî ê Îslamî...

Ma tarîxa sosyalîsta û laîqa di nav Kurda de çi ye? Eviya karekî sun’î ye bi destê weqfên Ewropî... Van çandê geyrî Îslamî kirine pêşiya çanda Îslamî. Evêya ziddê tabî’etê qewmê Kurd e... Qavmê Kurd xwe bi Îslamê nas dike. Şerme ji Kurdê ehlê îman re ku van karê sun’î ji karê Îslamî derbaskiriye... Gerek em pir bixebitin.

Wek **“Kelhaamed”** xebatên nû jî hene. Lê belê car di ev xebatên hanê ji alî xwendevana ve dimêne bêxwedî. Heger em dixwazin dîne xwe ji laîq û sosyalista ra bihêlin, em çanda xwe ji laîq û sosyalista re bihêlin... Di pratîka vê de ferqa va herduya ne pir e. Lewra em çanda Îslamî berdewam nekin, wê qewmê me bi çandekî geyrî Îslamî hemhal bibê û ji dîne Îslamê dîrêrê... Belkî poşmanî sibê feyde nede...

Em Kurdên Misilman in

✍️ Faysal Yaman

Em kînin, ji ku nin û li ku dijîn?

Li me buye ferz ku peşî em cewaba van pirsan bidin. Heta em cewaba van pirsan nedin û bi gelê xwe nedin zanîn em nikarin xwe bi gelê xwe bidin nasîn. Ji ber vê yekê divê em destpêka xwe bi bersiva van pirsan serrast bikin. Da dinya ‘alem bi me û bi koka me yanî bi eslê me bizanibe û bêbextî û telaqreşîya bi me neke.

Em kînin?

Divê em peşî cewaba vê pirse bidin û bi vê cewabê dest bi lêkolîna xwe bikin. Ev pirs bi du şiqqa gere bê cewabdan.

Ewwil

Pey tofana “**H.z. Nuh**”, Însan ji “**Çiyayê Cudî**” xwe di berdine nav “**Mezrabotan**”. Ku îro bi “**Mezopotamya**” tê nav kirin. Faris ji nesla H.z. Nuh in. Kurd jî yek ji wan şagê Farisan in. Qewmê Kurdan, ji şagêkî “**Farisiyê Navîn**” ku bi nav “**Farisiyê Pehlewî**” tên gotin ji nesla wan in.

Li welatê Kurdan Gutî, Hurrî, Kasî, Nayîrî, Lulî, Subarî, Mîttanî, Haldî, Kurtî, Kurtîk, Mardî û wekî dîn bi cî bune. Ji timamê van qewman milletê Kurd hatiye holê. Di dîrokê

de Kurd bi navê “**Medan**” û bi dewletê “**Medya**” hatiye nasîn. Qewmê Medan, Kurd bixwe nin...

Em miletekî ji eslê “**Rojhilata Navîn**”, milletekî ji kevnarên Mezrabotan ku ax û erdên nav nehrên Dicle

û Ferat dijî nin... Em ji tevgera ava Dicle û Ferat, ji axa Mezrabotan û ji eslê rojhilata navîn xwedî Kurdistan in. Em ji qewmek kevnar, qewmek qewîn û ji qewmek bi esl in... Em Gutî bûn, em Hurî bûn, em Kasî bûn, Nayîrî bûn, em Lulî bûn, Subarî bûn, Mîttanî bûn, Haldî bûn û em hem Kurtî bûn û Kurtîk bûn, Mardî û Kardekî bûn.

Wekî din di va erdan de kî bi cî bubun ji timamê va qewmên, afirandê qewmê Kurd in. Em hem Med in, hin ji me Pers in, hin Sasanî û Artuk in. Kî çî bêjî bila bêjî lê heqîqet bi tevan em dibên Kurd in... Di nav Faris û Tacik û 'Ereb de em serbilind in, bi rumet in, tim bi gîret in. Em wekhev in, tim bihev nîn. Em tev jihev in, tevî hev in, di nav hev de nîn. Em pev re dijîn, yek millet in. **Em milletê Îbrahîm 'eleyhîsselam in.**

Em bi navê xwe qewmê Kurd in. Qewmekî bi 'izzet, bi şeref, bi gîret û tim serbilind in. Bi namus in, xwedî heya û 'îffet in. Ji 'eyb û 'aran em pakij in. Tim û tim 'ebdê Rebb in... Ne şakî nîn, ne xwînxwar in, ne şaman in, ne 'abidê heyv û roja nîn. Ne rojperest, ne putperest, cêlekperest û ne jî 'ebdê 'ebda nîn em. Ne ehlê put û lata nîn, ne ehlê şîrk û ne munkîr, ne jî 'ebdê dinya nîn em... Em ehlê heq û ê Xweda nîn, dostê qencî û başa nîn, neyarê "dujminê heq" in, neyarê kafira nîn em.

Pey van gotinan re tê zanîn ku esl û neslê me her çî bin em bi nav qewmê Kurd in û ji beran berê ve em Misilman in bi Îslamê tim bi nav in. Lewra ji beran berê ve em zaroyê Hz. Nuh in. Her tim ehlê dîn û îmana bi Xweda nîn.

Duduyan

Li aliyê dî em Kurd ji "Adem 'eleyhîsselam" in û Adem jî ji ax û rihê Xweda ye. Xweda ji rihê xwe pif kiriye. Em ji zarokê "Habîlê Mezlum", dijmînê "Qabîlê Zalim" in. Zarokê Şît û Idrîs û Yûnis in. Em neyarê puta nîn, tağuta nîn, nemruda nîn, Fîr'awn û zalima nîn.

Em ehlê "Çiyayê Cudî" nîn. Xweyê keştiya azadî û rizgarî nîn. Em zarokê Nebî Nuh in ji nesla ehlê îman in. 'Ebdê rebbê zulcelal in, tabî'ê dînê Xweda nîn. Lewra em di her dewrî de tim û tim misilman in.

Em zarokê serhildêrê li ber Nemrudan, gotinbejê heq li ber zaliman, berxwedanê ji bo tevîdê, xwedî bivîrê putşikan "Îbrahîm" pêxember in... Em zarokê "Îshaq" û "Îsma'îl", dengxweşê "Da-wud", hikimdarê îns û cinan û ba û bahozan "Hz

Silêman" in. Zarokê "Yaqub"ê bi gem û keder, "Usîfê Zîndan" û "Eyyub"ê bi sebr in... Em ji nesla "Musa"yê kalamullah û xwedî asa, hevalê mustez'efa, xelaskarê mezluma, azadkarê bindesta, rizgarkarê 'ebdê 'ebda, serhildêrê li ber Fîrewna nîn.

Em ji nesla pêxemberê şehîd, "Hz. Zekerîya", Nebîyê mazlum "Hz 'Îsa" û pêşkeşê mazlum û mustez'efa "Eshabê Uxdûd" û ji nesla "Eshabê Kehf" in.

Em ji nesla hevalê Cebraîl, siwarê Boraqa ji ba Xweda, xweyê Îsra û Mî'racê, mêvanê dara Tuba, xweyê mu'cîzatê Quran a mizgîn, muhacîrê Medîne, xelaskarê însanan, azadkarê bindestan, rizgarkarê nezanan, xweyê şefqet û rehmetê, mededkarê gu-nehkaran, xweyê seyf û Quranê Pêxemberê axir Muḥammed Mustafa (selat û selam li ser be) nîn... Em zarokê şêrê Xweda Hz. 'Alî, ji nesla nebiyê Pêxember seyyîdê xortê cennetê Hesen û Huseyn û ji nesla ehlê beyta pak û pakij in.

Em qewmê Kurd û misilman in. Em misilmanê Kurd in. Babanî nîn, Hesenweyhî nîn, Deylemî nîn, Dostkî nîn, Rewadî nîn, Hemdanî nîn, Hezbanî nîn, Lorî nîn, Merwanî nîn, Şeddadî nîn, Geylanî nîn û Eyyubî nîn.

Em zarokê "Baba Tahirê Ūryanî" nîn, ji nesla 'Elî Herîrî, Mela Ahmedê Batê, Seydayê eşqê Melayê Cizîrî, ozanê xelqê Feqiyê Teyran, ronekbîrê mezin Ahmedê Xanî û ji zaneyê mezin Mela Xelîlê Sêrtî nîn.

Em zarokê Fatîhê Qudsê şervanê li hember Xaçperestan, Siltanê Kurdan Selahaddînê Eyyubî nîn. Zarokê Mîrê Botan Bedirxanî nîn.

Em ji nesla "Şêx 'Evdilqadirê Geylanî", "Şêx Bahaeddînê Neqşîbendî", "Şêx 'Ezîzê Dîyarbekrî", "Mewlana Şêx Xalidê Şehrezorî" û "Şêx 'Ubeydullahê Nehrî" nîn. Hem Qadirî, hem Neqşîbendî, hem jî Xalidî nîn. Li pey doza "Bedî'uzzaman", "Şêx Se'îdê Paloyî" û "Şêx Zekiyê Cizîrî", "Îbrahîm Xocê Nisêbînî" û "Şehîd Hiseynê Hebizbînî" nîn.

Em li pey da'w û doza Pêxember Hz Muḥammed (Salat û Selam li ser be), ewliya û enbiya û li pey Şêx û meşayixan û dostê Xweda nîn.

Em Misilman in û Kurd in ehlê Îslam û dîn in, xweyê Quran a mizgîn in li pey doza tevîd in... Em mumîn in, muwahhîd in, 'ebdê Rebbê Rehîm in. Bi silavên germ emanetî Xweda bin.



Ma Sûcê Me Çi ye?

✍️ Îbrahîm Êlihî

B *i navê Xweda ê Rehman û Rehîm... Selat û selam li ser Resûlê wî yê Emîn...*

“Xweda ji asîmanan avek nazil kir. Hemî newal li gor xwe bi avê herikîn. Wê lehiyê kefa bilind dibû bi xwe re dianî. Ji bo xemlê an jî ji bo berjewendiyê ew tiştê hûn di agir de dihelînin, li ser wê jî kefeke weke wê heye. Xweda mînaka heq û batilê wiha dide. Kef û qirêj belav dibe ew di erdê de dimîne. Xweda her wiha ji însanan re mîsalan pêşkêş dike.” (Ra’d, 17)

Xweda ê Te’ala gava ku ji asîmana baranê dibarîne, bi şape û lehiya ku gem tije dibin hingê li ser ruyê avê kefika sipî digre û difûre. Meriv dibê qey ne ave, evêna ku diherike tev kef e. Lê belê ya ‘esil ku av e, ew ji bin wê kefê de bê deng û bi sikûnet bi şeklekî ku kes wê ferq nake diherike û ew av, bi vê herikandinê bereket û rehmet dibe ji wan erdê ku di germa havînê de ziwa mane û terikîne.

Dîsa ‘eynî bi vî şeklî gava ku em birçî dibin, ji bo ku em xwe têr bikin hinek xwarina ku em dikelînin kef bi ser wan xwarina dikeve. Lê belê em tev jî zanin ku ew kefa ku bi ser wê xwarinê dikeve me têr nake; hetta em wê kefê ji bo ku

xwarina me bi ta’m be dicivînin û davêjin.

Gelî biraya! ‘Eynî bi vî şeklî mucadela heq û batil jî dişibihe van mîsalê ku me li jorê dan. Lewra carna jê lê dirênin ku batil û alîkarê wê wisa dinepixin, wisa tên pifdan, kibreka wisa li wan peyda dibe ku temamê însana di bin xwe re dibînin. Lê belê em baş zanibin ku batil û alîkarên wê tu ferqa wan û ew kefa bi ser avê ketiye tune ye. Gava ku ‘umrê xwe tijî dike weka wê kefê tê avêtin. Wek termê mirar tên avêtên çopa dîrokê.

Heq jî weka wê ava lehiyê ku di bin kefê de diherike ew jî di bin kefa batilê de sakin sakin diherike kafir jî bi vê sikûneta wê dixapin û dibêjin qey heq nemaye û ji rûyê erdê hatiye rakirin. Lê belê ew ehmeq nizanin ku ewê hetta qiyametê heq hebe û dom bike.

Ji ber ku tiynet û exlaqê kafira teva yeke û tev weka hev difikirin; kafir û murtedê herêma me jî di pey wê musîbeta ku hatibû serê me digotin qey bi vê musibetê koka muslumana hatiye qelandin. Tu kesê din jî ku bi navê Îslamê micadele bide li vê herêmê nemaye lê belê piştî ku di **“Mewlûda Resûlûllah”** (Selat û Silavên Xweda Lê Bin) de, bi

sed hezara musulman civiyan û hatin civandin, ha hingê Xweda ê Te'ala tirsu musulmana xiste dilê wan. Xewê şeva li wan herimîn. Lewra ev kafir û murted misilmana baş nasdikirin. Dîsa dest bi vir û îftûrayê xwe kirin.

Ji Xweda ê Te'ala re bê hed û hîsab hemd û şikir be ku me kir layiqê wê mizgîna Resûlê xwe (**Selat û Silavên Xweda Lê Bin**) ku di hedîseke xwe de gotiye: “Di axir zeman de ewê tirsu musulmana bi qonaxa sê meha ji dûr ve têkeve dilê kafira.” Hemd ji Xweda ê Te'ala re be ku ev mizgîna Resûlullah (Selat û Silavên Xweda Lê Bin) da nîşandan ku, ev tirsu kafira, bi me careke din jî da zanîn ku ev de'we û mucadele li ser heqqiyê ye. Lê belê musulman ji ber ku hînê van îftûra û vira bûne pir ‘ecêb nedîtîn. Lewra pêşîvanê me Pêxemberên Xweda (Selat û Silavên Xweda Li wan be) temamê wan, ji alê wan kafirê ku wan ji zaruyê xwe çêtir nas dikirin ve îftûra li wan dihatin kirin. Ê ku îro îftûra li me dikin jî, me baş nas dikin. Em bawerin ku Xweda ê Te'ala çewa ku wan Pêxemberên xwe (Selat û Silavên Xweda Li wan be) ru sipî derxist ewê me jî ru sipî derxe.

Ji bo ku em dilê neyarê xwe xweş nekin lazim e ku li ser van îftûra û virê wan tu carî di hişê me de di heqqê musulmana de şubhe çênebin. Şeytan û hevalê wî wezîfa xwe dikin weswesa didin dilê mûmina, ku em biya wan bikin û bi wan bixapin emê kefa wan bînin. Lê ku em bi wan nexapin hingê emê kêfa Xweda bînin.

Ma em nabihîzin ev musulmanê hana. Hewqas qîr û nalîn dikin dibêjin: “Ey ewanê ku di heqqê me de di hişê wan de şubhe hene! Werin me ji me bipirsîn û hîn bin me ji devê kafir û murted û neyarê Xwedan hîn nebin!” Lê belê dev ji kafira berdîn, em lê dirênin ewanê ku bi nav musulmanin jî guh nadin vê qîrê. Ew jî weka papağana, kafir di heqqê me de çî dibêjin tekrar dikin.

Em lê dirênin ku gava behsa wan kuştîyê “Fa’îlê wan Meğhûl in” tê kirin, anîne holekî wisa ku ji musulmana pêve tu kesê din nayê bîra tu kesî. Ev jî tev bi propagandayê kafira hatiye vî halî. Sîrf ji bo ku musulman bi kuştinê bên bîra însana. Musulmana li ber çavê însana reş bikin. Kes nabêje; ma ev însanê me’sûmê ku li vê herêma me bi seda bi tevî zarok û xort û qîz û pîrek û ixtiyar bi mezlûmtî, bi îşkenca ji ber ku musulman bûn hatin kuştin, ji alê kî ve hatin kuştin? Ma ew musulmanê ku naylon di şewitandin berdidane laşê wan û çavê wan, di laşê wan de bêrîk vedikirin û tije xwê dikirin kî bûn? Ma ev temam ne ji alê orguta murted û

xayin ve hatin kirin? Ev cema’eta pîrozê ku Rehberê xwe şehîd daye û bi hezara ferdê wê di bin îşkenca de derbas bûne, ketine hepsa, bi seda muhacir û mehkûm bûne û hê jî bi seda xortê wê yê ‘ezîz di hepsa de ne heger wî wextî wê mucadele û tekoşîna pîroz nedana ma îro li vê herêma me kesî dikaribû behsa dîn û Îslamiyetê bikira? Çima çav, vê heqîqetê nabînin û korin! Çima guh, wan zilma nabihîzin û kerrin? Çima ziman, van heqîqeta bi rastî naynin û lalîn?

Kafir ji xwe wezîfa xwe tînin cî. Lê çibuye ji musulmana? Ma hê li pey “aferîm”eka kafira ne. Yan li pey çî ne? Di pey vî qasî hê jî di heqê me de çavê wan li devê kafira be û me di çavê xelqê de di bin zenna de bihêlin bawerkin êdî bi çavê biratî û husn-î niyetê emê jî nikaribin li wan binêrin. Lê belê ji ber ku em xwediyê de’w û doz û fikrê Îslamê ne tu kesî ku ji xwe re bêje ez musulmanim em wî ji xwe re neyar nabînin. Hetta li pey Quran û sunnetê bin ew birayê me ne. Lewra weka ku Ustad jî dibêje “**Ji neyartiyê re wextê me tune ye.**” Em li pey yekîtî û ittîfaqa musulmana ne, em ne li pey tefrîqa û neyartiya musulmana ne. Em dixwazin ku temamê musulmana li dor Quran û Sunnetê bicivin. Hetta ku em musulman li dor Quran û Sunnetê necivin serfiraz û rizgar nabin. Em zani-bîn ku em bi hev re neyartiyê bikin ê ku kar dike wê kafir bin. Ma çima ew toleransa ku em ji kafira re bi navê “Hosgörü- diyalog” ê nîşan didin em ji birayê xweyê musulman re nîşan nadin?

Belê! Piştî van tiştî teva; em baş zanibin ku cema’eta Îslamî yê ku li vê herêma me ye, bi tu orguteka qatîl û karên ne li rê re hevaltî nekiriye û nake. Ji wana qet’ên bi tu şeklî alîkarî nediye. Devdavejin vê mucadelê û cema’eta pîroz, dixwazin ku vê cema’etê li ber çavê musulmana reş bikin û pêşya Îslamê bibirin, bira xwediyê van îftûra baş zanibin ku ev cema’eta pîroz ne dûvikê tu orguteka qatîl û ajan e. Em bi xwe di desmêja xwe de tu şubha me tune ye. Ji ber vê jî di nimêja xwe de jî tu şubha me tune ye.

Di axir de em dixwazin vê Sureta Qurana pîroz bînin bîra xwe û careke dî li ser vê sûreyê tefekkur bikin: “(Ey Muhammed!) Gava ku alîkariya Xweda û fetha (serkeftina Mekkehê) bê û te dît ku wa ye însan fewc bi fewc dikevin dîne Xwedê (hingê) bi hemdê, Xwedayê xwe tesbîh bike û jê re îstîğfar bike. Lewra ew, Tewwab e.” (Suretê Nesr)

Xwedayê Te'ala me ji de’wet û teblîğa ğeyrî Quranê mihefeze bike û me ji prensîb û emrê Îslamê dûr neke. Amîn.



Piştî Zaxo, Duhok, Hewlêr û Silêmaniyê

Helebçe Tê

Li “Kurdistana Iraqê” Çend Roj

✍ Ferzan Muhammed


Dîsa em di riyên Kurdistanê de ne. Dîsa emê di welatê xwe de li sînor, teftîş û pevçûnên di nav bera hîzbên siyasî de rast bîn.


Lê belê gelê Kurdistanê hesretê nas-kirin û hevdîtina hev e. Lewra di nav bera birayan de ji roja ku têlsincik û sînor hatine danîn bi dil rihetî hev nedîne û bi ser hev de neçûne û nehatine.

Em jî bi van bîr û baweriyên sînora derbas dikin û çend roja li Kurdistana Iraqê dimînin. Konağa ewwîl dertê pêşiya me; Zaxo ye. Digel ku ji 300 hezarî bêtir însan lê dijîn û

bajarekî kevnareye jî, Zaxo navçeya Duhokê tê hesibandin. Wek Amêdiye, Akrê, Kanî Masî, Feyda û Bamernê...

Piştî Zaxo em derbasî Duhokê dibin û çend rojên xwe jî li wir derbas dikin. Belê sed heyf û mixabin ku; ji ber li Kurdistana Iraqê zimanê fermî “lehçeya Soranî” ye, “lehçeya Behdînî” (Ku Kurmanjiya Kurdistana Tirkî ye) bi pêş neketiye û digel serxwebûnê jî bajarekî mezin wek Duhokê





nebûye cî û war ji bona çand, huner û edebiyata Kurmancî. Lê belê Soranî ji her alî ve bi pêş ketiye...

Piştî Duhokê em derbasî Erbilê (Hewlêr) dibin û çend roja jî hewa wir teneffus dikin. Ji hêla bajarî ve, Hewlêr pir bi pêş ketiye. Şixwe paytextê Kurdistana Iraq e û herêma Soraniyan e.

Piştî Hewlêr ji bona Helebçê em dikevîne riya Silêmaniyê. Silêmaniye jî bajarekî Sorana ye ku pir bi pêş ve çûye û pir mezin e. Berya Silêmaniyê Kerkuk heye ku; Kerkuk zêde bi pêş neketiye û di wî bajarî de Turkuman jî hene.

Ji Hewlêr wir de herêma Kurdistanê di destê “Yekîtî”yê de ye ku ev partiya “Telebanî” ye. Li Kurdistana Iraqê ji bona “Partiya Demokrata Kurdistan” (PDK) bi kurtasî “Partî”, ji bona “Yekîtiya Nîştimanî Kurdistan” (YNK) jî “Yekîtî” tê gotin.

Yek dikare bêje ku; di ketin û derketina hemî bajar û bajarokan de tefûşa ‘eskerî heye. Heta Hewlêr ev tefûş ji aliyê pêşmergeyên “Partî”yê ve, jê û wir de jî ji aliyê “Yekîtî”yê ve tê kirin... Di ketina Helebçê de em li tefûşa leşkerên Telebanî rast tên. Piştî tefûşê em diçine “Muze”ya Helebçê... Lê gelo berya Muzeyê divê em Helebçê çewa nas bikin?

Helebçe, nîşana zeqqumê fikra “millîyetperestî” û “nijadperestîyê” ye. **Helebçe**

nîşana hêrs û çavsoyîya “rebbîtiya însanê zalim” e. **Helebçe nîşana** dîrketina ji Îslamê ye. Lewra zulma ku li Helebçê hate kirin zeqqumê dara xwedênenasî û fikrên batil e. Belê li aliyekî din Helebçe “mezlumiyeta gelê Kurd” e, “berxwedana Îslamî” ye... Di herba Îran û Iraqê de milletê herêmê ji war û welatên xwe direve, penaber dibe. Dibêjin di wê demê de pirên Helebçeyî derbasî Îranê bûne. Kesên di dema bombardimanê de li wir bûne pirê wan ji der û dora Helebçê bûne ku ew jî di riya revê de bûn û ne pêşmerge bûn. Pîrek, zarok û yextiyar...

Muzeya Helebçê heqîqeten pir bi tesîr e. Zilma ku hatiye kirin xweş nîşan dide û meriv heyrîrî dihêle.

Piştî gera li Muzeyê em diçine nav gorên şehîdê Helebçê. Em fatîheyên xwe teqdîmî ruhê mezlûman dikin û hişyariya milletê mezlûm ji Xwedayê ‘aleman dixwazin.

Belê, axir divê milletê me zeqqumê cehennemê û fêkiyên dara cennetê ji hev ferq bike û nebe alîkarê tu zilm û zaliman. Divê zani-be ku hemî fikr û baweriyên ji Quranê dûr ketine, bi hewakî zilm û te’de ne. Hinek sefahet, hinek Helebçe ne... Me ji bona xwendevanê kovara Kelhaamed çend foto girtin. Hunê hinek ji wan fotoyan bi vê nivîsê re bibînin. Xwe-da me ji zilmê û zaliman biparêze. Sipartî Xwe-da bin...

Sazdehê Adarê

‘Umer Faruq Sîpkani



16ê Adara 1988an... Rojek ji rojê reş û bi şîn ketiye dîroka me Kurda. Di vê rojê de li Helepçe nêzî 5 hezar musulmanê Kurd bi bombê kimyewî hatin qetilkirin.

Sal 1988... 16ê Adarê, serê biharê... Li ser asîmanê Helepçe teyarê Dehhaqê zeman, Seddam, bi kîn û gēzeb difiriyan hê du roj berê; yanî 14ê Adarê gelê Helepçeyî musulman li hember Seddam û artêşa wî bi alîkariya leşkerê Musluman serhildabûn û bi vê serhildanê Helepçê ji îşgala Seddam azad kiribûn. Bi vê azadiyê kêfxweş dibûn.

Lê belê bi dengê teyarê Seddam ku li ser asîmanê Helepçe difiriyan, ev kêfa wan zû şikest. Tirsek xist dilê wan. Lewra Seddam baş nas dikirin. Zanibûn havênê rehîmê di dilê wî de tune ye. Zanibûn ji bo ku Seddam îqtîdara xwe mihafeze bike bi hezara, bi sed hezara zarok, pîrek kal û ixtiyar dikare bikûje.

Gelo suçê van musulmana çibû? Li gorî Dehhaqê Seddam, du sucê wan musulmana hebû: Yek jê ji ber ku musulman bûn. Ya diduyan jî ji ber ku Kurd bûn.

Seddam, di pey ku li hember artêş û leşkerên Îslamê nikaribû tu tiştî bike û meşlûb bubû, musulmanê Kurdê li Helepçeyê jî alîkariya Mucahidên Îslamê dikirin, xwest ku kula van teva di çavê rebenê musulmanê Helepçê re derxe. Teva bi carekî biqeline û ji wan xelas bibe. Lewra hê du roj berê leşkerê Îslamê ketibûn Helepçeyê û vî bajarî ji îşgala Seddam xelas kiribûn. Gava ku leşkerê Îslamê ketibûne Helepçeyê ewan jî leşkerê Îslamê hemêz kiribûn û deriyê xwe li wan vekiribûn. Bi wan re hevaltî kiribûn. Leşker û artêşa Seddam bi rev ji Helepçê derketibûn.

Hetta wê rojê Seddam gelek cara li bajar û welatê Kurda bomba reşandibû. Lê belê 16ê Adarê bombê ku diavête Helepçe ne dişibihîn wan bombê berê. Vê neqlê Dehhaqê Seddam bi navê Xerdel û sarîn bombê Kimyewî bi ser Helepçe de dibarand. Tesîra van herdû bombeya ji bombê kimyewî yê din herî pirtir bû. Di zemanekî hindik de kuçe û sikakên Helepçe bi ceseda tije bû. Însana ji bo canê xwe xelas bikin, xwe ji malê xwe diavêtin derva. Lê nizanibûn ku xwe davêjin mirinê. Ê ku hewa van bombayê kimyewî di kişande nava xwe hema di cî de diket û dimir. Piştî sê roja ku Helepçe hate bomba kirin ji nifûsa wêyê nêzî 75 hezarî nêzî 5 hezar musulman mirin û bi hezara jî birîndar û seqet man.

Ya rastî di vê qetlî'amê da sucê mezin ê 'Emerîqa û Awrûpa bu; lewra ê ku van bombê kimyewî dabû Seddam ewana bûn. Temamê dunyayê di vî qebehetî de şerîk bûn. Lewra li hember vê qetlî'amê bê deng man, guhê xwe kerr kirin. Çewa be ê ku hatibûn kuştin musulman bûn. Lê belê piştî ku 'îşê 'Emerîqa bi Seddam qediya rabû piştî 20 salî henekê xwe bi temamî dunyayê kir! Û go: "Te li Helepçê bombê kimyewî reşandibû, te însanê bê suc û gune kuştibû. Ev jî sucekî mezin e..." Û bi hinek sucnê dî yê ku îsnadî wî kirin wî 'idam kirin. Seddam bi destê hamiyê xwe hate 'idam kirin.

Lê belê Helepçe di dîroka dinyê de û di diroka Kurda de bi wî fotoğrafê ku ewî bavê ku zarokê xwe himêz kiribû û di ber deriyê xwe de bi ser zaroka xwe da ketibû û herdû jî miribûn, ewê di hişê însana de bimîne û neyê jibîr kirin.

Xwedayê Te'ala heqê mezlûma ji zalima bi destê zalima sitand. Xwezî mezlûma heyfa xwe bi destê xwe bistentina...



Seydayê 'Esrê: *Bediuzzeman Seîdê Nursî*

“Mirina Min Roja Newrozê Ye”

 Selamiyê Bilêderî

Ûstad Bedî'uzzeman (Razîbûna Xweda Lê Be) ev cumle berî wefata xwe 50 sal berê gotiye.¹ Weke temamê pêşbîniyê wî ev jî derketiye û di 1960an de roja newrozê wefat kiriye.

Bi wesîla salvegera wefata wî, ji bo ji bereket û himmeta rûhaniyeta wî îstîfade bikin, emê hinekî behsa heyata wî û mucadela wî bikin. Şixwe heyata wî tev bi 'ilm û cîhadê û bi nefî û eşaretê derbas buye... Em 'acizin binivîsin.

Tenê fîhrîsteya heyata wî emê binivîsin
ÎnşaAllah.

Zaroktî û Xwendina Wî

Ûstad Bedî'uzzeman (Razîbûna Xweda Lê Be) di sala 1876an (Hicrî 1293) de li gundê bi navê Nursê hatiye dinyayê. “Nurs” girêdayiyê qeza “Xîzan”ê ye. Xîzan jî qeza Bedlîsê ye. Navê bavê wî “Mîrza”, navê diya wî “Nûrê” ye. Heta 9 saliyê xwe li ba diya xwe û bavê xwe li gund ma. Di 9 saliya xwe de çû medresa “Tağ”ê. Birayê wîyê mezin ‘Abdullah jî li wê medresê dixwend. Bavê wî Sofî Mîrza keçik û kurik, temamê zarokê xwe

dan xwendin. Digel ku Sofî Mîrza ummî bû, zarokê wî tev bûn ‘alim. Gorî mezinbûnê zarokên wî ev in; Durriye, Xanim, ‘Abdullah, Se’îd, Muhemmed, ‘Abdumecid û Mercan e.²

Li Medresa Tağê li ba Mela Muhemmed Emîn dest bi xwendinê kir. Seydayê wî li qabîliyet û merdîtiya wî heyran mabû. Rojekî bi çend feqiyê xwe re çû gundê Se’îdê biçûk... Çû mala wan. Ji diya wî pirsî, go: “We ev zarok çewa mezin kir?” Nûrê xanim go: “Piştî ku ez bi vî zarokî hemle mam, min bê desmêj pêl erdê nekir. Se’îd gava hate dunyayê jî, min tu cara bê desmêj şîr neda wî.”³

Li medresa Tağê zêde nema. Ji ber fitreta wî tehekkuma kesî qebûl nedikir û sozekî biçûkî amîrane jê re bihata gotin tehemmul nedikir... Bi hevalê xweyî feqeh re şer kir... Seydayê wî, wî şande malê.⁴ Hafîza û zeka wî mu’ezzem bû. Dixwest ji şêxekî ‘ilmê şerî’etê bi carekê tevî bixweyne û hîfz bike. Halbûkî di medresan de şêx û Seyda, ders nedidane feqiyê ku nû dest bi xwendinê dikirin. Ya dinê jî; Ewliya û Şêxê ku sebîtiya Se’îd dîtine, keşf kirine ku ev sebî wê bibê Muceddidê ‘esra çarde-

ha.⁵ Ji zeka û *ḥafîza* wî mane ‘*ecêbmayî*. Ji ber vê yekê *ḥurmetekî* pir ‘*ecêb nîşanî* wî didan. Ev rewş jî li zora gelek feqiya diçû û *ḥesûdiya* wî dikirin... Dixwestin lêxin, *hetta* teşebbûsa kuştina wî kirine.

Piştî muddetekî feqeh Se’îd ji bo *teḥsîlê* çû medresa gundê **“Pirmîsê”**. Li wir jî feqiya bela xwe jê nevekirin. Çar heb feqî dibûne yek û wî ‘*aciz* dikirin. ‘*Izzeta* nefsa wî li vir jî *teḥekkumê* qebûl nekir. Derketê *ḥuzura* Muderris... Ku ji meşayixê kîram Şêx Seyyîd Nûr Muḥammed bû. Ji ‘*izzeta* nefsa wî re giran hat ku hevalê xwe gilî bike. Go: “*Şêxê min! Ji van re bêjin, gava bi min re şer dîkin, bira her çar nebîne yek, dido dido werin.*” Ji ber vê merdîtiya wî kêfa Seyyîd Nûr Muḥammed Efendî zêdetir jê re tê. Ji Se’îdê biçûk re dibêje: “*Tu telebê min e, kes nikare ‘elaqa xwe ji te bîne.*” Piştî vê *ḥadîsê*, herkesî jê re digo: “*Talebê Şêx...*”⁶

Piştî muddetekî ji medresa Pirmîsê hate medresa Norşînê. Bi birayê xwe Mela ‘Abdullah re hatibû Norşînê. Rojekî bi birayê xwe re şer kir. Melakî gote Se’îdê biçûk “*Tu çima ji emrê kekê xwe derdikevî?*” Se’îdê biçûk wiha muqabele kir: “*Ezbenî! Ji ber tu jî di vê tekyê de ye, tu jî weke min telebe ye. Naxwe li vê derê heqê weyî seydatiyê tune!*” Pey re bi tenê da rê, daristanekî pir tarî re, bi şev çû medresa xweyî berê.⁷

Du re çû gundê **“Kuḡak”**ê. Ji wir çû Sêrtê. Li vir nexweş ket... Vegeriya Xîzanê... Çû medresa **“Ġeyda”**... Ku ev gund gundê diya wî bû. Li vir feqiyeke hevalê wî pê re şer kir. Xencer lê kişand. Se’îdê biçûk jî rahişte bivirekî. Serê feqiyeke din şikiya. Ji vir jî derket û vegeriya malê. Wê zivistanê li mal derbas kir. Serê biharê, di sala 1891an de xewneke pir ‘*ecêb* dît. Ev xewn di *heyata* wî de wê bibûna serkaniya esrar û enwara. Dît ku qiyamet rabuye û *kaînat* *heşr* buye. Feqî Se’îd difikire ka wê çewa Pêxember (Salat û silavên Xweda lê bin) ziyaret bike. Tê bîra wî ku here serê “Pira Siratê”. Lewra çewa bê herkes wê di wir re derbas bibe, dibê lazime ez jî herime wê derê, li wir bisekinim. Diçe wir û li hêviya *Ḥebîbê* Xweda disekine. Temamê Pêxembera yeko yeko ziyaret dike, du re ziyareta Pêxemberê me *Hîz*. Muḥammed (Salat û silavên Xweda lê bin) muşerref dibe.⁸ Feqî Se’îd di wê esnayê de teleba ‘*ilim* jê dike. Resûlûllah (Salat û silavên Xweda lê bin) mizgîniyê dide wî: “*Bi şertê, ji tu kesê ummeta min sîal neke wê ‘ilmê Quranê bi sûreteke xususî hexşî te bibe.*”⁹

Piştî vê xewnê ji bo *teḥsîla* ‘*ilim* pê re şewq çêdibe. Diçe gundê **“Arwas”**ê... Li vê derê muderrisê medresê, Mela Muḥammed Emîn tenezzul nake ku ders bide Se’îd... Ji feqiyeke re dibêje: “*Tu dersa wî bide.*” Ev rewş li ‘*izzeta* nefsa feqî Se’îd giran tê. Rojekê muderris gava li camiyê dersê dide, Feqî Se’îd îtiraz dike: “*Ez benî! Ne wisa ye.*” Û tenezzulî dersdana wî nake. Piştî muddetekî hindik ji wir çû **“Miks”**ê. Li medresa Miksê jî dersdana kitêbên pêşî ne ‘*adet* bû. Li vir jî zêde nema... Çû **“Westan”**ê (Gewaş)... Li Westanê jî meheke tenê ma.¹⁰

Pênc sala bi vî hewayî li medresa geriya... Ji xwendina Quranê *heta* **“Îzhar”**ê hewqas wext derbas bû. Di sala 1891an de çû Bazîdê, ba Şêx Muḥammed Celalî... *Teḥsîla* wî ya *heqîqî* li vir dest pê kir. Ev *teḥsîla* *gerîb* û bê emsal di sê meha de temam bû. Molla Se’îd, li gorî *usûla* medresên Kurdistanê, kitêba ku tê xwendin bi navê **“Molla Camî”** û kitêbên ser **“Molla Camî”** yê tev û ‘*ilmên* din îkmal kir. Bi vî şeklî hê çardeh salî, bû ‘*alimekî* pir mezin. Di van sê meha de 100 kitêb xwend. Quran û 80 kitêbên di jiber kir. ‘*Îlmê* rêzê ku di medresên Kurdistanê de, di 15-20 salan de encex xilas dibû, wî di sê meha de tev qedandin. Hevalê wî û *millet* jê mane ‘*ecêbmayî*. Navê wî danîn **“Melayê Meşhûr”**. Gîşte şohreteke wisa ku diçû kuderê, xelqê digo: “*Xizir hat, ev zarok welî ye.*” Wê demê, birçî û tazî, bi qiyafetê derwêşa gund bi gund digeriya, riyazet dikir. Ji teweccuha *millet* ‘*aciz* bû. Ji bona *ḥurmeta* ehlê ‘*ilmê* bê girtin û ji teref xelkê ve Se’îdê biçûk ‘*alim* neyê zanîn, qiyafetê derwêşa terk kir, şal û şapik li xwe kir. Xencer girêda. Kete qiyafetên ağaya.¹¹

Di sala 1892yan de çû Sêrtê... Li wê derê Mela Fethullahê ku bi ‘*ilm* û kemala xwe meşhûr bû, ziyaret kir. Mela Fethullah, ew ji gelek kitêba *îmtîhan* kir. Cewaba teva da. Li wir *sehîfêkî* “*Meqamatên Herîriye*” carekî tenê xwend û jiber kir. Kitêba “*Cem’ûl Cewami’ê*” di *heftiyekî* de jiber kir. Seydayê wî jê re go: “*Nadire ku di mirovekî de bi dereca îfratê zeka û ḥîfz bicive. Min evêna bi tenê, di te de û di Mela Xalidê Olekî de dîtiye.*” Piştî ku Mela Fethullah dît ku Mela Se’îd di zeka û *ḥîfzê* de deha ye, Leqeba **“Bedî’uzzeman”** lê kir. Yanî **“Ġerîbêzeman”** “*Kesê ku di vî zemanî de mîslê wî tune ye.*”¹²

Ev *hal* li Sêrtê di cîh de belav bû. ‘*Alimê* mezin

wî de'wet kirin û herî meselê kûr û sûalê 'ilmê jê pirsîn. Bedî'ûzzeman (R. 'Eleyhî) cewaba temamê sûalên wan da. 'Alim tev heyran man. Wî medh û sena kirin. Li Sêrtê millet hurmet û qîmetekî pir da Bedî'ûzzeman. Lê hinek mela û feqî jê hesidîn, wî de'wetî munazerê kirin... Ûstad çû camiya ku wê munazere lê bihata kirin... Nihêrt ku di destê wan de darê wan û kitêbên wan heye... Çi sûala ku ji ustad pirsîn, cewab da. Hesûda nihêrtin ku bi 'ilmê nikarin wî îlzam bikin... Îxtîlaf û şer derxistin... Tev bi hev re bi dar û xencera hicûmî Bedî'ûzzeman kirin. Şerekî mezin derket. Millet pê hesiya û hatin camiyê... Ew ji nav lepê hesûda xelas kirin.¹³

Ji Sêrtê vegeriya hate Bedlîsê... Li camiyekê dest bi we'za û dursa tefsîrê kir... Millet zêde rağbet kir... Şêxekî hesûd ji teweccuha millet hesidî. Emrê kuştina wî da du murîdê xwe. Her du murîdê bi tiving di riya Bedî'ûzzeman de kemîn danîn. Gava Bedî'ûzzeman hate dehma wan, dikin ku gulleya berdinê... Di wê esnayê de milê wan felc dibe, tivingê wan dikeve erdê. Bedî'ûzzeman tê ba wan, destê xwe datîne ser milê wan û dibêje: "Qebehet ne ê we ye ez heqqê xwe li we helal dikim."¹⁴ 'Umrê wî 16 salî bû...

Li Bedlîsê dibihîze ku serxweş li qonağa walî kom dibin û 'eraqê vedixwûn... Bi sîleh girte ser wan û derheqê heramiya 'eraqê de delîlê şer'î ji wan re go... Nehya ji munkêrê kir. Waliyê Bedlîsê wî ji Bedlîsê derxist. Çû Şîrwanê... Ji wir çû Tilloyê. Li Tilloyê kitêba "Qamûs el Mûhît" heta "Babû-s Sîn"ê jiber kir.

Li Tilloyê şevê Şêx 'Abdûlqadirê Geylanî (Quddîse Sîrruhu) hate xewna wî. Jê re go: "Mela Se'îd! Here ba reîsê 'eşîra Mîran, Mûstafa Paşa... Pêşî wî de'wetî riya hîdayetê bike... Tewsiya wî bike ku dev ji zilmê berde... Nimêj bike, îta'eta emrê bîl me'rûf bike... Ku guh nede wî bikûje!" Bedî'ûzzeman çewa vê xewnê dibîne, dide rê... Bi piya diçe Cizîrê. Diçe konê Paşa. Paşa ji ber ku li wir ne hazir e, Bedî'ûzzeman şûrê xwe bi kon ve dadleqîne û rûdinê... Paşa dikeve hundir û kesên hundir tev ji ber radibin... Bedî'ûzzeman ranabe. Ji Paşayê zalim re dibêje: "Ez hatime ku te bînimê hîdayetê. An tê terka zulmê bike û nimêja xwe bike... An jî ezê te bikujim." Paşa li ser van gotina pir hêrs dibe. Dibê: "Bi vî şûrê zengarî?" Bedî'ûzzeman dibê: "Şûr jênake, dest jêdike!" Paşa dibêje: "Li Cizîrê 'alimê min hene. Tu heger teva îlzam

bikî, ezê bi xebera te bikim, heger na, ezê te bavêjime çem."¹⁵ Mela Se'îd cewaben dibêje: "Çewa ku îlzam kirina hemî 'aliman ne heddê min e, avêtina minî çem jî ne heddê te ye. Lêbelê heger ez cewaba 'aliman bidim, ewê xwestekeke min hebe. Ew jî tivingek e. Heger tu di sozê xwe de neskine, ezê te pê bikujim."

Bedî'ûzzeman, wan 'alimên ku tevlî kitêbê xwe hatine teva îlzam dike... Nêzîkî salekê li Cizîrê dimîne. Di medresan de dersan dide feqiya. Feqiyeke Bedî'ûzzeman bi navê Feqîrullah Mollaza-de hebû. Ji 'eşîra Botiya bû. Ustad zehf jê hez dikir. Ew bi xwe dibêje min gelek kerametê Mela Se'îdê Meşhûr dîtîn... Pir ji min hez dikir. Pir letîfe dikir. Rojekî di dema letîfeyekî de ji min re go: "Sed salo! Tê sed salî li heyatê bimîn. Ezê jî li Ruhayê wefat bikim. Lê wê qebra min vekin û wê min ji wir derxin û bibin." Ev meriv dibêje: "Nemiro! Sed salo! Niha 'umrê min 95 e... Li hêviya ecelê xwe me."¹⁶ Ustad Bedî'ûzzeman 39 sal berya wefat bike, di serê kitêba xweyî Lema'atê de, bi remz, tarîxa wefata xwe û xerakirina qebra xwe gotiye. Ji dêvla îmze û navê xwe çend rêzê bi wezn... Bi navê "Eddaî "nivîsandiye. 'Aynî weke nivîsandiye çêbûye.¹⁷

Ji Cizîrê hate Mêrdînê. Li Mêrdînê bi seyyahekî telebê Cemaleddîn Afğanî re hevaltî kir. Muteserriifê Mêrdînê wî nefyî (surgunî) Bedlîsê kir.

Seyda û Cema'eta "Îttîhada Muhammedî"
"Ez hazirim ji heqîqetê şerî'etê re hezar ruhê xwe feda bikim."

Sala 1897an de ji ber ku 'alimê mezin li Wanê tunebûn, çû Wanê. 15 sala bi tadrîsê û bi îrşada 'aşîreta mijûl bû. Dixwest li Wanê, li Bedlîsê û li Amedê bi navê "Medresetû-z Zehra" medreseyekê ava bike. Ji bo alîkariyê ji siltan bixwaze çû Sitenbolê (1907). Li wir di nav cema'eta "Îttîhada Muhammedî" de cîhad kir. Di qezeteyên "Serbestî", "Mîzan", "Wolqan" û "Tanîn"ê de maqale nivîsandin. Bi yek maqalekê gîl hezar însan ketine cema'etê.

Piştî "Hadîseya 31ê Adarê" digel ku tevîbûna wî tune bu, hate girtin. Tevlî rehberê cema'etê 15 'alimê Îslamê hatine daleqandin. Ji paceya salona mehkemê şehîdên ku bi dar ve hatibun daleqandin xuya dikirin. Vê mehkemê di şeş meha de 62 însan daleqandin. Reîsê Mehkemê Xûrşîd Paşa ji Bedî'ûzzeman pirsî: "Te jî şerî'et xwestiye? Vaye, ê ku



şerî'etê dixwazin bi vî hewayî têne daleqandin." H.z Ustad: "Ku hebe, ez hazirim ji heqîqetêke şerî'etê re hezar ruhê xwe feda bikim. Bi kemala îştîyaq ez bendewarim ku herime axretê... Ez hazirim ku bi yên hatine daleqandin re herim." Mudafe'ekî pir dirêj, bê tirs û heyecan... Mudafe'ekî qehremanî kir... Gava ew tehlîye kirin, teşekkur nekir... Dema ji mehkemê derket, hetta "Meydana Sultanahmed"ê bi qêrîn go: "Ji bo zalima bijî cehennem!" û meşiya... (1909)¹⁸ 1910an de vejeriya Wanê. Ji Wanê di sala 1911an de çû Şamê. Li wir li "**Mizgefta Emewiye**" ji 10 hezar kesî re xutbeyek da. Gava çû Şamê, li Amedê, Sewrekê û li Ruhayê ji hinek ma.

Ji bo avakirina "**Medresetu-z Zehra**" ji wir dîsa çû Sitenbolê (1911). Bi Sultan Reşad re çu seyahata Qosova. Ji bo temelê medresê 19 hezar zêr sitand û vejeriya Wanê. Temelê Medresetu-z Zehra li "**Artemît**"ê bi merasîmeke mu'ezzem hate avêtin. Wê demê H.z Ustad Bedî'uzzeman li "**Medresa Xurxurê**" ders dida feqiya (1913). Di qiyama Şêx Selîm (Hadîsa Bedlîsê) de xwest wan bisekinîne. Ji ber ku wê demê di nav leşkerên Osmaniyan de gelek leşkerê Mumin û yên di herba Cîhanê a yekê de bi şehîdiyê bibin ewliya hebûn, nexwest ku xwîna musulmana bê rijandin...

Bedîuzzeman Di "Herba 'Umûmî" de

Di sala 1914an de Herba 'Umûmî dest pê kir. H.z Ustad tevî 500 feqiyê xwe, tevde qumandariya 5000 milîsê Kurmanca kir. Bi hezara zarok, pîrek û ixtiyar ji qetlî'amê xelas kirin. H.z Ustad di kelekela Herbê de nedikete kozikê. Li ser hespekî sipî, dibezand... Tefsîra pir bi qîmet "**Îşarat-ul Î'caz**" li ser piştê hespê xwe, di dema herbê de nivîsand. Bi qehremaniya H.z Ustad û telebên wî arteşa Rus ji Bedlîsê derbas

nebû. Pir Rus û leşkerê Ermenî kuştin. Artêşa Rûs û milîsê Ermenî, li ber vê tekoşîna H.z Ustad û telebên wî, sekinî û şûnde vejeriyan. Tevlî biraziyê wî 500 telebê H.z Ustad şehîd ketin. Di dema herbê de H.z Ustad ji milê xwe birîndar bû û lingê wî şikest. Ew û sê telebê wî hêsîr ketin. Li Bedlîsê di qerergaha Rûs de, li hizûra qumandarê Rûs tevî lingê xweyî şikestî, li ser kursî lingê xwe avête ser lingê xwe. Pir bi hîddet û bi dengê bilind 'erza qumandanê Rus şikand. Xwedêgiravî H.z Ustad anîbûne pirsîyariyê lê H.z Ustad pirsîyariya qumandarê Rus dikir. (1916)

Piştî hêsîr ket wî birne "**Qosturma**", ku herêmekî "**Sibîrya**" ye. Du sal û nîv li wir hêsîr ma. Rojekî serekê Qûmandarê Rûs Nîqola Nîqolovîç tê esîra teftûş dike. Di ber Bedî'uzzeman re derbas dibe, lê Bedî'uzzeman ji berê ranabê. Careke dinê bi bahanayekî di ber re derbas dibe... Dîsa nalebite. Cara si-siya li berê disekine, bi wasîta tercûman sebebê ku çima ji berê ranebûye dipirse. Bedî'uzzeman dibêje: "*Yekî bi îman, ji zalimekî ku Xweda nas nake bilindtir e. Ji ber vê ez ji ber te ranabim.*" Li ser vê Bedî'uzzeman didine dîwana herbê. Hevalê wî îstûrham dîkin ku 'uzrê xwe bixwaze. Lê Bedî'uzzeman bi 'izzet û şeca'et ehemmiyet nade wan, û dibêje: "*Qerara wayî 'îdamê, ji bo seyaheta 'alema ebedî, di hukmê pasaportê de ye.*" "*Qerara 'îdama wî hate dan. Gava ji bo înfaza wî tîn, Bedî'uzzeman musa'eda dû rek'et nimêj bike dixwaze. Dema Nimêjê de Qumandarê Rûs hat, ji Bedî'uzzeman 'uzr xwest, rîca kir go: "Min 'efûke."* Û hukmê 'îdama wî sekinand.¹⁹

Bi alîkariya Xwedayê Te'ala ji Sibîrya firar kir. Mesafeke ku bi meşa salekê bi zor mirov tê re here, bi tenê, digel ku zimanê Rûs nizanibû, di 3 meh û 25 roja de, bi kerametekî pir mezin derbas dike. Ser "Warşova" û "Awûsturyayê" de hate Stenbolê. (1918)

Seyda, Li Meclisa Enqerê ye “Hukmê Xayîn Merdûd e”

Piştî ji esaretê vegeriya li Sitenbolê di “**Darul Hikmet-îl İslamiyê**” de bû endam. Me’aşê ku ji wir distend, di ber cîhada Ingilîza û Neşriyata kitêbên îmanî de serf dikir. Ingilîza hingê Sitenbol îşgal kiribûn. Bedî’ûzzeman li hember serekê keşeyê dêra “**Anglîkan**” a Ingilîz bi navê “**Xutûwatê Sîtte**” rîsaleyek neşr kir. Li hember fetwa Seyxûlîslam jî fetwakî neşr kir. Ji bona cîhada li hember îşgalkera go: “*Ne ‘îşyan e... Cîhad e û cîhad jî ferz e.*” Serekê qumandarê Ingilîz emrê kuştina wî da. Li Sitenbolê digeriyan ku wî bikûjin. Lê Bedî’ûzzeman her roj li semtekî Sitenbolê cîhada xwe dewam dikir. Meclîsa ku li Enqerê bi navê “**TBMM**” hatibu saz kirin, ew de’wetî Enqerê kir, neçû. Piştî hinek israra di sala 1922yan de çû. Ji bo avakirina Medresetûz Zehra texsîsa 150 hezar baqnotî bi Meb’ûsa da îmze kirin. Li meclîsê nihêrt ku aqlebê meb’ûsa nimêj nakin û sîstema nû dixwaze dîn ji nav millet rake. Bedî’ûzzeman beyannameyek neşr kir. Gelekê meb’ûsa dest bi nimêjê kirin. Ew zindîqê ku Ustad bi navê “**Kendal**” behsa wî dike, ji vê yekê nerazîbûna xwe nîşan da, pir qehirî. Bedî’ûzzeman di nav gelek meb’ûsa de pir bi hîddet dibêje: “*Paşa! Paşa! Di İslamiyetê de herî heqîqeta mezin; piştî îmanê Nimêj e. Ê ku Nimêj neke xayîn e... Hukmê xayîn merdûd e! (Nayê qebul kirin)*”²⁰ Kemal ‘uzur jê xwest û serekê wa’iziya Kurdistanê, bi me’aşekî gelek û xaniyek teklîf kir... Bedî’ûzzeman vîna qebûl nekir.

Bedî’ûzzeman, berya ku ji Enqerê vegere Wanê, “**Deccalê İslamê**” sîûqast lê kir. Bedî’ûzzeman li tekya “**Mizgefta Hecî Bayram**” dima. Rojekî çû Meclîsê. Li Meclîsê bi behana êşa Tîfoye “aşî” li meb’ûsa dixistin. Li Bedî’ûzzeman jî xistin. Lê oda aşiyê de jehrêkî pir giran xistine şiringa Bedî’ûzzeman şiringayekî mezin û tijî jehr, di singa wî re li qelbê wî xistin.²¹ Lê Xwedayê Te’ala wî muhâfeze kir. Hetta wefata wî jî birîna singa wî necebirî, pir cara ji berê bi tayê diket, zimanê wî giran dibû.

Seîdê Nû

“Ez Di Cereyana Îmanê De Me”

Di sala 1923yan de vegeriya Wanê. Ji ber Bedî’ûzzeman ji hedîsên Pêxember (Salat û silavên

Xweda lê bin) derxistibu ku bi “**Sufyan**” (Deccalê İslamê) re, bi siyasetê mucadele nabe; encex bi nûra î’cazên Quranê meriv dikare mucadele bike, çû şikeftekî “**Çiyayê Ereke**”ê. Heyata wî ya ew bi navê “**Se’îdê Nû**” te’bîr dike, ji vir dest pê kir. Ji ber vê îstîxracê berî qiyama Şêx Se’îd şigulî ku wî biseknîne.²² Digel vî qasî jî, tağût ji ber ku zehf jê ditirsiya, çagê qiyama Şêx Se’îd dest pê kir, di Adara 1925an de wî nefyî “**Burdur**”ê dîkin. Di Sibata 1926an ji wir nefyê “**Barla**”yê ku Qeza “**İsparta**” ye kirin. Li wir cîhada me’newî dest pê kir û tefsîra xweyê bêhempa “**Rîsaleyên Nûr**” peyder pey neşr kir. 600.000 Rîsaleyên Nûr bi desta hate nivîsandin.

Digel vîna zalim û neyarên İslamê jî nesekinîn. “**Deccalê İslamê**” ku Ustad remzen jê re gotiye “**Kendal**”, 23 cara emrê kuştina wî bi jehr da û du cara xwestin wî bi sîlah şehîd bikin. Jehrê zehf bi te’sîr didanê û kemîn li pêşya wî datanîn, lê Xwedayê Te’ala wî muhâfeze dikir.

Millet bi teweccuheke mezin li de’wa wî xwedî derket. Rejim pir ‘aciz dibû. Ji jê re qebehet didîtin? Qebehetên wî ev bun: Şaşîka wî dikirin bahane... Li mizgeftê çima azan bi ‘Erebî dida xwendin... Çima ayeta ku li pîreka nuxumandinê emir dike, tefsîr dikir... Çima ku ji “**Ata**”yê wan re di Rîsaleyên Nûr de gotiye “**Mason**”, “**Deccalê vî zemanî**”, “**Kafir**”... Çima ji rejma wanî “**Laîq**” re gotiye “**İstîbdada Nemrûdane**”, “**İstîbdada ‘eskeriye a keyfî û Kufîrî**”...²³ Mehkeme di heqê wî de vedikirin, digotin tu dîn dikî alet ji sîyasetê re... Û bi gelek sebebên keyfî zulim lê dikirin...

Tağût dixwest roja İslamê bitefîne... Dixwest roja Rîsaleyên Nûr bitefîne. Lê Xwedayê Te’ala nehişt ku bighêjine vê daxwaziya xwe. Rîsaleyên Nûr li her derê Tirkî û gelek dewleta belav bû. Gelek polis û muxbîrê rejimê hatin ku wî şehîd bikin, lê kerametê H.z Ustad dîtin û tobe kirin. Rejmê çare nedît... Talî ji bo de’wa îmanê bifetsînin H.z Ustad û telebên wî xistine hepsê.

Di 1935an de li “**Eskişehir**”ê, di 1943an de li “**Denizli**”, di 1947an de li “**Afyon**”ê derxistine mehkemê û H.z Ustad avêtin hepsê. Di 1952an de jî li “**Sitenbol**”ê wî derxistine mehkemê. Belê H.z Ustad di hepsê de jî neraza. Navê hepsê quliband, heps bû “**Medreseya Yûsufiye**”... Mehkûmên hepsê teva dest bi Nimêjê kirin û ji guncê xwe

yê berê tobe kirin. Ketin sefê Nûrê...

Rejimê wî nefyî **“Qas-tamonu”, “Emîrdağ”** û **“Isparta”** yê jî kir. Ew 35 sala di xaniyekî bê perde de ku muqabilî qereqola Polîsa bû, hiştin. Ê ku dihatine ziyareta wî, ew digirtin û îşkence dikirin. Ji herkesê ku nefî kiribûn, çend cara ‘efû der-xistin, lê H.z Ustad ji van ‘efûya xaric hiştin. Wî di xaniyê wî de heps kirin. Qezeteyên rejimê di heqqê wî de gelek îftira neşr kirin... Xwestin wî ji çavê millet bixînin. Wekî di jî propaganda dikirin, digotin: **“Se’îd Kurd e,**

hun Tirk in... Li pey wî neçin...” Wî dîgo: **“Milliyeta min Îslam e.”** Îftirayê murteda tev ‘eqîm man, negihîştine mirade xwe. Carekî Polîsa bi yekê serxweş xwestin bidin îmze kirin ku **“Haşa,** van ‘eraqa ji Se’îdê Kurdî re dikirim. Zilamê serxweş ji wan re got **“Haşa, sed hezar haşa... Ez serxweşim lê ne bê îman im.”**

Wî nefyî **“Qastamonu”** kirin. Ji 1936an heta 1943an li wir nefî ma. Piştî hepsa **“Denîzli”** wî nefyê **“Emîrdağ”**ê kirin. Di navbera 1944an heta 1948an li wir ma. Di sala 1953yan de çû **“Isparta”**.

Digel Xebatek Mu’ezzem

Piştî Zulm, Surgun û Hepsan, Wefata Seydayê Hêja

Tarîx bubû Adara 1960an... H.z Ustad Bedî’ûzzeman wezîfa xwe temam kir... Esera xwe yê ku H.z ‘Alî (keremellahû wechehu) û Şêx ‘Abdulqadîre Geylanî (Quddîse Sîrruhu) wesfê wê dane... Ew esera ku 6600 sehîfe ne... Temam kir. Êdî newroz nêzîk dibû... Çagê wefata wî hatibu. Berî 50 sala, weke ku gotibû: **“Mirina min roja Newrozê ye”** Îxtarî qelbê wî yê mubarek bubû ku li Ruhayê wefat bike...

Şevêkê bi dizî ew û hinek şagirdê xwe çûne **“Ruha”**yê. Teqwîma, 20ê Adara 1960î nîşan dida... Pir nexweş bu. 21ê Adarê gihîştine Ruhayê. Milletê Ruhayê weke lehiyê hatin ziyareta Ustadê xwe. H.z Ustad li otela **“Îpek Palas”**ê dima. Hukimeta hingî (Ku hikumeta **“Partiya**



Demokrat”ê bu), ji teweccuha millet zehf ditirsiya. Xwestin wî şunde vegerînin, bibne Isparta... Lê milletê Ruhayê (‘Urfî) xwedîtû li Ustadê xwe kirin û nehiştin wî bibin.

23yên Adara 1960î H.z Ustad ber bi limêja şevêkê wefat kir. Wê rojê asîman girîya... Barana sor bariya. Milletê Ruhayê wê rojê li asîmana bi hezara teyrê ku kesî nedîtibûn dîtîn... Awazê van teyra asîmanê Ruha tije kir.²⁴

Naşê wiyê mubarek li hewşa **“Mizgefta Xelîlûrrehman”** hate defin kirin. Piştî çend

meha (12 Temûz 1960) leşkerên zulmê bi tanq û topa hatin, dora Ruhayê girtin, naşê wî bi dizî ji qebra wî derxistin. ‘Eskerê ku cesedê wî dîtîn mane ‘ecêbmayî... Cesedê wî piştî 110 roja neriziyabû.²⁵ Te dîgo qey nû wefat kiriye. Bi teyarê birine ciyekî meçhûl. Vêga, ji geynî çend şagirdê wî, ji millet kesek, ciyê qebra wî nizane. Rehîma Xweda lê be û me ji bereketa wî û bereketa Rîsaleyên Nûr mustefîd bike. Amîn. Roja qiyametê me bi wî re û bi Pêxemberê me re (Salat û silavên Xweda Lê bin) heşr bike. Amîn.

1-Mufasssal Tarîxçeyî Heyat s. 37, 38, 39, 40, 84

2-Tarîxçe-î Heyat s. 31- Nurs Yolû s. 25- Son Şahîdler s. 73- Emîrdağ Lahîkasis. 63

3-Mufasssal Tarîxçe-î Heyat s. 84

4-Tarîxçe-î Heyat s. 32, Mufasssal Tarîxçe-î Heyat s. 88/ Bedî’ûzzeman Saîd Nûrsî Hayatî Eserlerî s. 29

5-Mufasssal Tarîxçe-î Heyat s. 89

6-Mufasssal Tarîxçe-î Heyat s. 89

7-Tarîxçe-î Heyat s. 33/ Mufasssal Tarîxçe-î Heyat s. 91, 92, 93

8-Tarîxçe-î Heyat s. 36/ Mufasssal Tarîxçe-î Heyat s. 100

9-Osmanlıca Lem’alar s. 879/ Mufasssal Tarîxçe-î Heyat 102

10-Son Şahîdler-3 s. 12/ Mufasssal Tarîxçe-î Heyats. 108

11-Mufasssal Tarîxçe-î Heyat s. 114

12-Mufasssal Tarîxçe-î Heyat s. 116, 117

13-Mufasssal Tarîxçe-î Heyat s. S. 216

14-Mufasssal Tarîxçe-î Heyat s. 321

15-Tarîxçe-î Heyat s. 107

16-Mufasssal Tarîxçe-î Heyat s. 550

17-Mufasssal Tarîxçe-î Heyat s. 559, 560

18-Mufasssal Tarîxçe-î Heyats. 652 heta 697’a

19-Bir Sîrr-î İnnâ A’teyna (Osmanî) s. 11, 12

20-Mufasssal Tarîxçe-î Heyat s. 2167

21-Mufasssal Tarîxçe-î Heyat s. 2195



Metoda Fêma Kirina Rîsaleyên Nûr

Di nav gelê meyî musulman de ku gelekî ji H.z. Ûstad Bedî'uzzaman hez dikin... Lê em dibin şahid ku yek kitêbekî H.z. Ûstad ji serî heta dawî nexwendine. Heta gelek de'wetvanê Îslamê jî hakeza... Ê ku dest bi Rîsalekî kiribe jî yan xelas nekiriye yan jî bi zorê bi nîv fêma kirin xilaskiriye. Ji ber ku ev jimara kovara me jî tewafûqî salvegera wefata H.z. Ûstad dike, ku ew jî 23yê Adarê ye... Ji bo vê yekê me jî xwest ku em çend gotina di heqê teşwîqa Rîsaleyên Nûr de bêjin.

Sebebê nexwendina Rîsaleyên Nûr gelek in... Emê inşallah behsa wan sebebên û çareseriyên wan bikin. Lê berî vê em dixwazin ku temamê bira û xweyê meyî mumin re vîna bêjin; fêma kirina Rîsaleyên Nûr ne li gorî zeka zêde ye. ne fêma kirina wî jî ne ji ber zeka hindike.

Fêma kirina Rîsaleyên Nûr girêdayî ye bi 'ezm, sebir û tîkariya xwendinê ve. Lewra di nav Rîsaleyên Nûr de gelek mijarê ku weke tîkariya xweya dikin hene ku bi rastî ne tîkariya in. Weke pelê gulê çiqas tê xwendin kulîlkê heqîqetê vedibin. Pêşî hindik û hêsanî dibêje... Pey re çiqas diçe dereca mefhûmê fire dike.

Manî'ên li ber fêma kirina vî eserê bê buha ve in;

1. Bi zimanê 'Osmanî ye... Yanî bi Tîrkîya berê ye.
2. Rîsaleyên Nûr ji ber ku ji new'ekî tefsîra Quranê ye, serkaniya temamê war û biranşên Îslamî û pir kelmê bi taybet ku li gorî wan biranşa hatine îstî'mal kirin, di xwe de cem' kiriye.
3. Manî'ek ji xwendin û fêmkirina Rîsaleyên Nûr re, televîzyon û meşgûliyetê pûçê ku geşletê û tiraliyê didin.
4. Qene'etekî şaş di nav musulmana de cî girtiye û millet jî jê bawer kiriye. Ev qene'eta şaş jî eve ku dibêje "Rîsaleyên Nûr pir zor e."
5. Zimanê Rîsaleyên Nûr geş e. Weke muellifê wê jî dibêje: "Lîbasê min û zimanê min geş e"
6. Cumlê(sentaks) û paragrafê Rîsaleyên Nûr dirêjin.
7. Pêşdaraziyê di heqqê Rîsaleyên Nûr de bela bûye ku hinek mumin sebebê nexwendina xweyî Rîsaleyên Nûr bi zennekî pûç ve girêdidin. Dibêjin "Rîsaleyên Nûr, hebûna Xwedê û şertê îmanê tenê îspat dike. Ez bi hebûna Xwedê bawerim, ihtiyaciya min bi îsbatê tune ye."

8. De'wa H.z. Êstad, 'ilmê wî yê weke behr ku ne serî û ne binî jê re heye, kerametê wî yê bê jimar û heyata wî yê ji welidandina wî heta surguna Barlayê di gelekê kitêba de bi temamî nehatiye nivîsandin.¹
9. Dersdana Rîsaleyên Nûr ya bê ûsûl.
ÎnşaAllah-û Te'ala emê van mani'a yek bi yek çareserî kin û cewaba wan bi kurtahî bidin.
1. Rîsaleyên Nûr her çiqas bi zimanê Tirkiya berê, yanî bi zimanê Tirkiya heqîqî hatibe nivîsandin jî gelek Rîsaleyên Nûrê ku nû derketine piyasê hene ku dibinî her rupelî de ferhengok çêkirine. Her kelîmekî zor, me'na wê pêşberê wê de nivîsandine, ku ji van kitêba Rîsaleyên Nûr bê xwendin fêm kirina wê pir hêsanê. Wekî din jî Rîsaleyên Nûr îmana însana xilas dike û heyatekî ebedî dide qezenc kirin... *Xwendina wê tenê, qeza û bela defî' dike, rizîq zêde dike... Her herfekî wê ku tê xwendin pir xêra dide qezenc kirin. Naxwe... Ma ne hêjaye meriv hinekî te'dê bi xwendina wê re bikêşîne?*
2. Kelîmê bi taybet, weke me di çareserîya yekê de go... Di Rîsalên ku bi îndeks û ferheng de me'neyên temamê van kelîmê bi taybet mewcûd in. *Êsûlu-d Dîn di medresa de di 15 salan de tê hînîkirin, lê Rîsaleyên Nûr vî 'ilmî, li gor hewceyîyên zeman di salekê de dide.*
3. Televîzyon şixwe di malekî de hebe... Nexwasing berd û berdan be, merivê wê malê ne dikarin 'ilmekî bixwînin û ne dikarin zarokê xwe ji cehalet û bê edebiyê muhâfeze bikin. Lewra qanalê televîzyona hema bêje tev di destê Yahûdiyê Sîyonîst de ne. Herî meşgûliyetê pûç fericandina televîzyonê, zêdeyî rizqê xwe şîgul e. Tiraliya xizmeta Quranê û xwendina Rîsaleyên Nûr; ji van meşgûliyetê pûç ku me gotin meriv terk bike û dest bi xwendina Rîsaleyên Nûr bike şixwe tiralî jî wê nemîne inşaAllah.
4. Rîsaleyên Nûr ne zor e... Yekî zarok jî bixweyne û yekî 'alim jî bixweyne li gorî dereca xwe ji fêkiyê îmanî bê par namîne û weke ku bi deh hezara kitêbê Îslamî û fennî xwendibe wê 'ilmekî mezin qezenc bike. Belê fêmkirina Rîsaleyên Nûr bi geyretê ve û tîkrar tîkrar, hêdî hêdî xwendinê ve girêdayîye. Ewê ku dibên "zor e" ê ku kêfa wan jî xwendina kîtaba

re nayê ne. Şeytan jî, tevî yê însî û cinnî ji bo millet van eserê pir bi qîmet nexweynin dişugûlin. Bilxasse ka hun xwe bi xwe tecrube bikin. Rajîne Quranê yan jî Rîsaleyên Nûr û bi xweynin... Şeytan pêre pêre wê 'acizbûnekî bide. 'Îşekî li gorî nefse xweş were û gîfletê bide, wê bide ber meriv. Lê ku we televîzyon vekirana û bernameyekî beradayî û pişgûk bi sa'eta temaşe bikirana şeytan û nefse 'aciz nedibûn. Belê nefse neyarê meriv bixwe ye. H.z. Êstad Bedî'uzzeman dibêje: "Rîsaleyên Nûr weke qezetê nexweynin." Dîsa dibêje: "Xêr di tîştê zor de ye." Şixwe ê ku nû dest bi xwendina Rîsalê bike ne hewceye tevî fêm bike. Weke hinek însan tîkevîne baxçekî bixwazin fêkiyê bi dara ve bixwin... Her yek wê li gorî bilindbûna xwe fêkiyê bilind û nîzm wê jêke, lê kesek bê fêkî namîne. Rîsaleyên Nûr jî weke bexçeyekî ji fêkiyê se'adetê û fêkiyê me'newî ne. Hetta gelek 'ilm û mijarê Êsûlu-d Dînê hene ku muçtehidê mezin wan mijar û pîrsgîrêka pîr duvedîrêj nivîsandine û bi tenê 'alimê mezin ji wan fêm dikin. Hinek mijarê ku di kelamê de hene jî gelek 'alimê mezin gotine: "Di derheqê vê de (weka behsa heşrê) em bawerî tînin lê belê bi aqil nayê îsbat kirin..." Lê Rîsaleyên Nûr vana hem bi aqil îsbat dike û hem jî temamê şertê îmanê bi hêsanî hetta bi zaroka jî dide fêm kirin. Ji îmana teqlîdî digêjîne îmana tehqîqî. Rîsaleyên Nûr gelek fesîh û wecîz e. Qîmeta soz; di î'caza wî û kinbûna wî de ye. Ê ku nû dest bi xwendina Rîsalê kiribin, ciyê fêm nekin were pêşîya wan bira dev ji xwendinê bernedin. Lewra H.z. Êstad dibêje: "Seydayê Rîsaleyên Nûr; Rîsaleyên Nûr e." Wê di pêş de daxûyanî û tefsîra wê meselê mûheqqeq were. Bes meriv bi sebir xwendinê bidomîne.

5. Belê zimanê Rîsalê gîrîbe û bedî' e. Bi Tirkiya berê, Kurmancî, 'Erebî û Farisî gîrîftar e. Ji ber ku wehbî ye, orjîнала wê sûndûs mîsal e. Tercûme û sadekirîyê Rîsaleyên Nûr weke orjîнала wê lezzetê nade. Lewra Rîsale jî weke muellîfê xwe Bedî'e.
6. Di heqîqetê de Rîsaleyên Nûr, pîr wecîz û fesîh e. Cumlê wê wecîz, paragrafê wê weke dantêlê mijara bi hev ve girêdide û nabe mani'ê fêm kirinê. *Hetta bi navê Mîchaél Hopkîns ku ji 'Amerîqa ye û 'umrê wî 90 kusur sal e... Ê jê re dibêjin "Bavê Psiqolojîyê" ev Pro-*

fesor şagirdê Freûde û çend sal berê hatibû Stenbolê. Pêşberê sa'etek dersa NLP (Proğram-kirina hucreyê mêjî) 2000 dolar pere distand. Yanî dersê hîpnoterapiyê dida. Doktorekî li wê derê Rîsaleyên Nûrekî şanî wî Profesorî dide. Lê dinêre, hinekî dixweyne... Pir bi heyirî dimîne... Û dibêje: "Evê ev kitêb nivîsandiye kî be... Temamî Paragraf û cumleyê wî li gorî hîpnoterapiyê ew xistiye rêzê. Muellifê vê kitêbê bi hîpnoterapiyê baş zane. Û ê ku vê kitêbê bixweyne, ku jê fêm neke dahî hucreyê mejiyê xwendevan verast bike, wê (jêrhişa wî) îstîfade bike. Ev heqîqet... Em bi çavê xwe jî dibînin... Ê ku Rîsaleyên Nûr dixweynin, herî musîbetê mezin jî têne serê wan, qet'en nakeve depresyonê. Bilakîs tim kêfxweş in. Hê li dunyayê heyata cennetê dijîn."

7. Rîsaleyên Nûr ne tenê baweriya Xwedê îsbat dike. Rîsale ji ber ku new'ekî ji tefsîra ye, behsa temamê mijar û biranşên Îslamê dike. Nexasim ji pirsgirêkê ayet û hedîsa... Şertên îman û Îslamê, me'rîfet û muhebbeta Xweda, metodolojiya Tefsîr û Fiqhê û Kelamê... Li gorî ayet û hedîsa zikir dike. Tefekkur û teqwa... Metodolojiya mezheba (Kelamî, Fiqhî û 'Eqîdewî), tarîxa Îslamê heta bi ziman û tarîxa Osmanîyan... Behsa tesewwûf û cîhadê... Van 'ilma teva bi şeklekî mu'ezzem hîn dike. Rîsaleyên Nûr ne tenê îsbata Xwedayê Te'ala û heşrê dike. Me'rîfet û Muhebbeta Xwedayê te'ala hîn dike. Ma ev yek jî ne hêja ye ku meriv Rîsaleyên Nûr bixweyne? Hetta **"Nukta Huweyê"** rîsaleyeka çar pele. Ser nivisandina vî **"Nukta Huweyê"** mehkema tağût, de'wa 'îdamê lê vekir.

H.z. Ûstad dibêje: "Ê ku vê Rîsalê bixweyne û jê fêm bike wê bigêje dereca welîtiyê."

8. Belê H.z. Ûstad bi heqî nayê naskirin ji bo H.z. Ûstad bê naskirin pêşî Lem'a 26an û Tarîxçeya Heyatê gere bê xwendin. Duv re jî kitêba Necmeddîn Şahîner bi navê **"Son Şahîtler Bedîüzzeman'ı Anlatıyor"** (6 cild) û kitêba Kek Abdulqadîr Badîllî bi navê **"Mufasssal Tarîxçe-î Heyat"** (3 cild) bê xwendin. Duv re jî ji Rîsalê wî yê berî surguna Barlayê ku nivîsandiye û Kulliyata Rîsaleyên Nûr bi temamî bê xwendin. A hingê hê nû emê wî hinekî nas bikin. Emê nas bikin ku H.z. Ûstad ne 'alimekî ji rêzê ye. Emê fêm bikin ku muceddidê 'esra dawî ye, şagirdê

H.z. 'Alî (Kerremellahû Wechehu) ye. Li gor baweriya min di Tarîxê de piştî Sehabîya qehremanek weke wî, ebdal, qutub û ewliya... Û 'alimê weke 'ilmê wî kûr nehatiye dîtin. Ewliya û 'arifekî pir mezin e H.z. Ûstad. Kerametê wî nayêne jimar. **"Sufyan"** 23 cara wî jehr kiriye... Gelek cara Sûûqast lê kirine. Lê bi hîfza Xweda nikaribûne zirerekî bidinê. Di Rîsalê de di gelek ciya de ji dêvla îmzê beytek bi navê **"Eddâî"** nivîsiye. Ev beyt berî wefata xwe bi 40 kusûr salî nivîsiye... Kerametê wî em nikarin tevî binivîsin. Ji bo vê yekê divê kitêbekî bi serê xwe bê nivîsandin.

Sebebê vê gelek in. Emê çend heba tenê bi kurtahî bêjin. Heyata Ûstadî yê berî surgunê wî bi xwe ji ber îxlasê zêde îfşa nekiriye. Lewra heyata wî yê heta hingê, 1925a tev bi qehremanî, serhildana wî yê li hember zordesta, bi arîkariyê geybî û kerametê pir 'ecêb derbasbûye. Weke çar qumandarê bi dehşet; Niqola Niqolavîç, Mustafa Paşa (Mistoyê Keçel), Xurşîd Paşa û Sufyan Paşa... Li hember van zalima pir bi şiddet û 'izzet rabûye û bi 'egîdî di ruyê wanê tune de sozê heq gotiye... Wan îqaz û tehdît kiriye. Ji Her yekî re kafir bûn, fasiq bûn, zalim bûn û murted bûna wan ber ruyê wan gotiye. Ji bo naskirina H.z. Ûstad wan kitêbê ku me li jorê gotin... Gereke bêne xwendin. Bilxasse ji ya Kek 'Abdulqadir Badîllî ku neyê xwendin kêmahî îlla dimîne. Tev bi fotoğrafê şahida û ciya behs kiriye.

9. Ev dersdana Rîsalê yê bi ûsûl, pirsgirêkekî pir mezin e. Lewra ê ku dixwazin Rîsaleyên Nûr guhdarî bikin, ji devla wê meselenê dinê ji wan re dibêjin. Hişê guhdara belawela dibe û ji Rîsalê 'aciz dibin. Halbûkî H.z. Ûstad pir li hember vê bû. Ew bi xwe di "Sozler"ê de dibêje: **"Rîsalê Nûr meselê Îmanî dereca lizûmê de îzah kiriye. Seydayê Rîsalê Nûr, Rîsalê Nûr e. (ji bo hînbûnê) Ne hewce ye meriv ji hinekê dinê dersê bistîne, Rîsalê Nûr ihtiyacî bi vê nahêle. Herkes li gorî îstîdada xwe, bi xwe wê jê îstîfade bike..."**

Mixabin hinek kesên ku îro bi navê îzahê Rîsaleyên Nûr bi dersîtî dibêjin, ji fêm kirina rîsalê re dibine perde...

Bi vî hewayî em gihîştin dawîya nivîsa xwe. Xweda xwendin û fêmkirina Rîsaleyên Nûr tevî me'rîfet û muhebbeta xwe bike nesîbê me teva. Amîn...

Bi Peyvên Hindik Nezîkî Xweda Bibin

 **Muhsîn Canan**

Xwendevanên delal! Emê dîsa behsa peyvandina zêde û xesarên wê bikin.

“Kurê Adem ji geyrî emirkirina qencyê, meni’ kirna xerabiye û zikrê Xwedê, çi her tiştê dipeyve di ‘eleyhê wî de ye û ne di lehê wî de ye.” (Ibnî Mace)

“Kesê bêjê wî, peyvê wî pir be, şaşî û xetayên wî jî ê pir bin.” (Ebu Nuaym)

“Sê tişt hene qelbê însana dimrînin: Pir xwarin, pir razan û pir peyvandin.” (Malîk bîn dînar)

Ji van peyvên weka durr û mercan tê fêm kirin ku peyvandina zêde hişkbune dide dil û qelba û wan dimrîne. Kesên dilhişk û dilmirî jî ê herî durî Xweda ne. Şixwe kesên durî Xweda bin ciyê wan cehennem e. Peyvên zêde her tim di ‘eleyhê mirov de ye. Wek çewa hatiye gotin: “Ji peyvandinek hindikî mirov hindik, ji peyvandina zêde, mirov zêde poşman dibe”. Tê fêm kirin ku peyvandin tovê şaşî û xetayan e. Şaşî û xeta jî tovê poşmaniyê ye. Peyvên zêde şaşî û xetayên zêde diwelidêne. Xetayên zêde dibe rêç û şop ji bona xetayên mezin, bê şubhe xetayên mezin jî mirov diherikêne bal cehennemê. Çewa xwediyê gotinê zêde, bi cehennemê tê tirsandin. Kesê ji peyvên zêde durr bin ji wan re jî bi vê galgala şêrîn mizgîn heye: “Mizgîn li kesê ku, ji gotinê zêde di xwe bigre û nebêje û malên xweyî zêde jî di rêya Xwedê de xerc bike.” (Bezzar) Şixwe berê jî me behs kiribu ku kesê li zimanê xwe xwedî derkeve, nivê cennetê ji xwe re sewgirandin dike.

Loqmanê Hekîm jî di şîretê ku li kure xwe dike, dibê: “Peyvandinê zêde û dirêj û bela neke; Lewra peyva zêde şeref û rumetê dide hunda kirin.” Wek vêya gelek galgal li ser peyvên zêde hatine gotin.

Dîsa Şêx Sadiyê Şîrazî jî dibê: “Mirov heta bi zimanê xwe bigre nepeyve, kêmanî û qusurên yekê jî veşartî dimîne. Kesên zêde bêje guhê wî xetimandiye. Nesîhet, şîret encex li

kesê hişbuyiye feyde dike. Ger tu li ser hev bêje jî, kes kêfê ji bêjê te nastêne. Tu ji şêrîniya wê bêjê fêde nastênî. Bêje di şexsê însan de Kemalîyek e, gehîştîyeke. Ew çaq xwe bi bêjê biçuk neke. Kesê hindik bêje qet şermezar û fedîkar nabe. Bi qasî cehekî mîsk ji lodek herî xêrtir e. Ji gotina qasî deh zilama xwe biparêzin. Weka ‘alîma, zanyara bêje belê pîr bêje. Te set tîr avêt, li boşê çû. Ger tu zanabî, bi hiş û bi aqil be yekî bavêj; belê bila bigheje armanca xwe.”

Şixwe wexta mirov li jiyânê jî dinêre, kesên zêde dibêjin bêj di serê wan re narê û xwe li ber gotinê naxin. Hingî dipeyivin ya li şîreta nahîsênin, ya jî di guhekê derbas dibe di guhê dî de derdikeve. Gotina li ser hev bêqîmet e, bê rumet e. Dev ji galgalê beradayî jî berdîn li jiyana xwe binhêrin şîret jî û tiştên pir hewce jî wexta tê dirêj kirin, xewa mirov tîne û însan jî ‘aciz dike. Erê însan wek kaînetek, gerdunek biçuk e. Heyfa însane ku ji bo peyvekê biçuk bibe pêkenok û qirdikê ‘alemê. Him şermezarî û fedîkariyê peyvên zêde diwelidêne. Bila peyv hindik be bila bi qîmet û rumet be. Bê şuphe kîlok zêr ji tonek demir bi qîmettir e. Ya zêdeyî xwe nepeyve ya jî tu peyivî heqê peyvê bide. Ji guhê we re bila guhar be peyvên zêde dilê mirov hişk dike, reş dike û dimrîne.

Ew çaq gelî dozvanê hêja! Bêjê dawî, mirov kare bi quttikî bêje; peyva zêde ji ber xeta û şaşîtiya pir dike, mirov bêqîmet û rumet dike. Mirov dike pêkenokê xelqê. Mirov ji şîreta bêpar dike. Mirov dike ji nezana; Lewra kesê nezan peyvê zêde dikan. Mirov bê fedî û be’ar dike. Mirov ji ber çav dixê. Mirov dike lîskê îblîs û hevalê wî. Welhasil dawîya van teva mirov ji Xweda durr dixê. Bi vê jî ji cennetê durr dixê, nêzîktirî cehennemê dike.

Bi hêviya ku em xwe ji ‘emelê ziman ku nebaş û malayanî ye rizgar bikin. Ez we dispêrim Xweda ê Rebbê ‘alema. Xweda yar û alîkarê me teva be.

Bihar e... Lê Dîsa jî Tu Tune ye

 Muhammed Şakir

Biracan!

Ev nameya min ya diduyan e. Bi rê dixim...
Huzn û mizgîna min xemla wê ye. Silavên min jî tê de
Halo. Du carê di rêya de me ji bo te
Lê çi feyde. Cihê te nizanim hîna
Ji bo vê. Tu bê warî li ba min. Bê hêlîni...
Qebûl dikî, an na! Tu dizanî
Lê fikra min ev e..
Îcar. Çar û neçar
Nameya xwe li ser avê dinivîsînim
Kağeza min heyat be jî biracan. Hibra min hîcran e
Bila qe! Halo. Hevalev bim ez

Gotin li min nakeve belkî. Lê dîsa jî bibêjim
Dê tu dizanî av. Bi eslê xwe jîn e, rûh e
Av û ba. Bi hev re bibin yek. Wê çaxê
Dê meş be. Pêl be. Rabûn û rê be
Rêber û roj yanê...
Loma li ber avan û di rêya de me zemanêke
Zemanêke berevîm e ji bo te
Car bi reqa re. Car bi beqa re. Mar û mişka re mijûlim
Halo.

Biracan!

Hê jî bi hêvî me ez. Dê te bibînim. Bi cîh bikim belkî...

Zivistanek xerîcî çavê min. Demsalek hate çû
Seqem û cemed. Bahozen herî giran derbas bûn. Tu tune
Tu tune lê. Cemedê ez tevîzandim. Tînê ez qemirandim
Tîna rojê û cemedê zivistanê bi hev re ez şewitandim
Şewitîm. Kizirîm. Birijîm. Bû me xwelî. Tu tune
Tu tune cemed heliya. Berf bû av û zivistan çû
Tu tune cemre ket. Erd sincirî "Be'sû be'del mewt" an çêbû
Du cara şewitîm

Biracan!

Cara dî ji kerba bû. Îcar ji kêfa
Cara dî ji Huznê bû. Îcar ji husnê
Cara dî ji qehrê bû. Îcar ji nesrê
Hemd li ser hemdê tekbîr û secde jî pê re...

Careke dî, bû bihar... Hemd. Bihar e îdî!
Xumexuma 'ewran û gurmînên tavan e
Xuşexûşa çeman û wîçewîça çûkên koçvan e
Wexta cota. Kela kaniya. Kesk bûna mêrgan e
Mizgîn!

Biracan!

Mizgînê bide gundiya
Bide navçeya. Bajara û hetta serê çiya
Kom bin. Bikin dîlan. Xort û qîz û zarokan...
Mizgîn!
Şivanên malê hatine berdan
Şivan. Hatine berdan. Xwiya bûn û hunda bûn dîsa...
Çavê min! Lê dîsa jî tu tune ye!

Em Kî Ne? Qebhetê Me Çi Ye?

✍ Ammar Eyyubî

Ev ji mehekî vir de ye, dîsa leşkerê zulmê bi temamê quwwet û îmkânên xwe bi ser muslumanê ku ji geyn xizmeta Îslamê nakin ve digrin. Wan digrin, hepis dîkin û dixwazin wan di çavê însana de bi her new'ê îftîra â reş bikin. Lê ew dîsa viya ji bîra dîkin ku Xweda alîkarê mumîna ye. Ev çend tofanin ku bi ser muslumana de derbas dibin lê musluman, lê Rebbanî, piştî xwe dane Xwedayê ewhed. Wan ji xwe re ev ayeta hanê şî'ar girtine: **“Heger hûn arikariya Xweda (dîne Xweda) bikin wê Xweda ji arîkariya we bike û wê piyê we sabit bigre (hun naqulbin li hem-ber bayê kufrê)”** Mezinê me çî gotine: **“Derbên ku meriv nexînin bêguman quwweta meriv zêde**

dîkin.” Em îro ê ku xizmeta de'wa Xweda ji xwe re kirine hêz û kefen; bi van derbê ku nû li me hatine weşandin û wê werin weşandin pê quwwet û gîyreta xwe nû dîkin, zêde dîkin. Neyarê Îslamê bira qet kefxweş nebin em nakevin bi îzna Xweda û ‘elametek zilletê ewê ji me nebînin.

Qebhetê me berî niha çî bû? Dersdana kîtaba Xweda, emê îro jî vê xizmetê berdewam bikin, welêw di ber de serê me jî here.

Qebhetê me berî niha çî bû? Teblîgkirina dînê Xweda, jî qiz û xorta, jî zarok û pîra şîyarkirina van însana jî xewa gîfletê, derandina wana jî nav şîrk û bîd'eta û xelas kirina wana jî ‘ebdîtiya ‘ebda û ver-

Doza me sulh û aşî ye
Rêz û riya me rastî ye
Hîzba xwedayê ‘alemê
Me bi dîne wî her girtiye

Zanîn me kirye rehber e
Azadî armanc ji me re
‘Edl û heqîqet kember e
Barê ketiyan piştê ye

Rabûne em wek her demê
Dîsa ji bona ‘alemê
Derxin ji bin zulm û jîmê
Lew zilmê ‘alem kuştîye



Quran û sûre Zulfîqar
Dîsa wekî her wext û car
Hildane xortê cengewar
Fecra sibê avêtiye

Waye serî me li her ciya
Hildaye wek eshabîya
Jar û ketî rabin piya
Dewra ‘ezizyê hatiye

Ev berxwedan û kêferat
Ev xwîn û cîhad û xebat
Sancî û birin e ji bo felat
Mizgîn dema dîlşadî ye

gerandina wana bi bal ‘edîtiya Xweda ve. Emê îro jî vê xizmetê berdewam bikin welew di ber da mal û can û malbata me tev jî here, bira feda be.

Qebhetê me berî niha çi bû? Arîkariya feqîra, musted’ef û mezlûma têr kirina wana maddî û me’newî. Îro jî emê dev ji vê xizmetê bernedin. Emê çewa ku ayet dibêje *“heta feqîr nebin Xelîfê Xwedayê li ser ruyê erdê”* jî emê neseकिन.

Doza me sulh e, aştî ye, **doza zulm û kufrê** zulm e, te’de dayina mezlûma ye, **rêz û riya me** rastî ye, **rêz û riya zulm û kufrê** derew e, em musbet in, ehlê çêkirinê ne, ew menfî ne ehlê xirakirinê ne. Ew xwedîyê meşrebek batil in, em xwedîyê meşrebek heq in. Ji ber vê yekê her kesek bi hawayê ku meşreb û mesleka wî îcab dike dixebite. Ew xira bikin, divê em çêbikin. Ma ji meşreb û mesleka çêkirinê qenctir çi meslek heye?

Di ber çavê me muminên Rebbanî de, xettika di navbeyna zillet û meşrep musbetiyê pir xetteka ku divê were rî’ayet kirin tu car musbet meşrebî bi zillet re nayê kêleka hev. Divê em weka ku di bala hinek însana de xwuya ye zillet û musbetmeşrebiyê karibin ji hev veqetînin. Îslam ne dînê zulmê ye. Bi vî re ne dînê zillet û sertewandina ji zalima re ye jî. Dîroka muslumana yê berî niha daîm bi serfirazî bûye ‘alem ji me muslumana hînê şeref û ‘ilmê, teknîk û hunerê, çandî û pêşveçûnê, ‘izzeta li hem-ber kafira, û henûntî û rehîma li hember mumina bûye. Selehaddînê Eyyubî ji me ye, Muhammed Fatîhê ‘Osmanî ji me ye. Farabî û Îbn-î Sîna ji me ne. Em giran in ne sivik in, em xwedî rûmet in ne bêşeref in.

Belê em jî îro dixwazin di ‘izzetê de Selehaddînê Eyyubî bin, di huner û edebiyatê da wek Melayê Cizîrî bin. Teknik û Tibbê da wek Îbn-î Sîna û Farabî, wek Ğezalî û Ebul ‘îzz El Cezerî bin. Em vê dixwazin û ji bo vê ğaya bilind em dixebitin. Em dixwazin ummetta Îslamê bivegerînin serfiraziya wan a berê. Ji ber vê yekê ye agir girtiye kirasê neyarê me û bi temamî quweta xwe dixwazin me mihû bikin. Kafir û zalim û xayinên welatê Kurdistan û Turkiyê dibînin ku muslumanê Rebbanî ji bo vê ummeta jar û belengaz roj bi roj dibin hêviyek û deryê necat û xelasîyê. Ev wan dibe’cîne, difurîne û ji hesedê dîkin biteqîn. Emê nivîsa xwe dîsa bi şî’reka seydayê Mela Mizgîn biqedînin. Hun emanetê Xweda bin û di bin hîmaya Wî de bin.


Kelha ‘Edaletê Ava Bikin!

“Mewlana Bahaeddîn Weled” di 22 saliya xwe de rojekê bi bavê xwe re diçe bajarê **“Qonya”**. Li bajêr mişwarekî dimîne. Û bi ‘ilm û zanîna xwe, bi zuhd û hişê xwe bandoreke mezin li gelê bajêr dike. Ji ber vîna meta sultanê bajêr bi navê **“Hudawendîgar”** jê re medresekê li Qonya ava dike. Sultanê Qonya **“Alaeddîn Keykubat”** ji Mewlana hez dike, hurmetê didîyê û qîmeta wî digre. Di vê hengamê de sultan kelheke bi rewş li dora bajêr lêdike.

Dema kelha xwe diqedîne gazî Mewlana dike û wî li ser kelhê digerîne. Sultan dibêje: *“Seydayê min! We Kelh çewa dît?”* Mewlana jê re wiha dibêje: *“Bi rastî kelha te ji bona avên lehiyê û êrîşên hespê dûjmin berbestek e herî qewî ye. Bes ez difikirim ev berbest gelo wê çewa ji nîfirê mezluma reyî mînak tîra re bibe berbest. Gelo hun qet fikirîn li wan nîfirê mezlumayî bi sed hezaran birca derbas bike û hemî derê bişewitîne û were we. Ey Sultan! Kelha ‘edalet û wekheviyê ava bikin, lewra di vîna de xweşî û rihetîya dinyeyî herî bi xêr heye.”* Ev şîreta Mewlana bandoreke girîng li Sultan kir.

Belê, serok û rêzanê dewleta lazim e Kelha ‘edalet û wekheviyê ava bikin da ku xwe ji nîfirê mezlum û mustez’efa bistirînin. Çungî pêxemberê me Hz Muhammed (s) dibêje: **“Xweda heya dike ku destê mirovê mezlum dema jê re vebe vala vegeirîne.”** Heger hun alîkariya mezluma nakin zulmê jî li wan nekin. Lewra di nabîna Xweda û kesê mezlum de perde tune ye.

✍ **Wergêr: M. Mahmud Tibyatî**





Tew Dinyayê

Li Ser Kilama Koçbûna Êla Hesenana Ber Bi Îranê Ve û Şîna Şêx Se'îd

✍ Cevdet Karaman

Pîştî vemirandina serhildana Şêx Se'îd, damezrandoxê komara nû dest bi komkujîn û kokbirîn û surgûna dikan. Li Kurdistanê nexasim li war û meskenên dijrabera, çî dar û dehl û devî û heywan, çî jin û mêr û zarok û sebî û hemî însan, tu jîndarek ji ber gezeba serdestan xelas nabe. Yên ku dimrin yan jî tîn kuştin şixwe xelas dibin. Yên ku dimînin jî, hinek ji wan ji bo parastina mal û canê xwe dibin hevalbendê neyaran, hinek bê deng ker û lal dibin. Ne dibînin, ne di bihîzin. Hinek jî ji bo 'izzeta xwe serhildanê hildibjêrin. Û şer didomînin.

"Eşîra Hesenana" jî yek ji wan 'eşîretên bi gîretbû ku di serhildana Şêx Se'îd de bê xewf cih girtibû. Ji lew "Malbata Hesenana" bêtir bi ber bayê gezeba neyaran dikeve. Lê ev 'eşîret ji ber xwe naxwe û şer didomîne.

Di serhildanê de hinek kesên wek "Xalid Begê Hesenî", "Keremê Qolağasî", "Silêmanê Ahmed" û lawê wî "Ferzende Beg" û "Evdilbaqî" pêşvantiya Hesenana dikan. Bîlxase di dorhêla "Xinûsê", "Kopê" û gundê "Mela Mistefê" de şerê pir dijwar diqewime. 'Eşîra Hesenana naçar dimîne. Lakîn teslîm nabe. Pêşvanên Hesenana li hev dicivin. Û

Pîştî şêwr û mişêwrê biryar didin ku derbasî Îranê bibin. Û xwe bispêrin "Eşîra Îsma'îl Ağayê Sîmko".

Armanca wana di vê biryarê de ev e: Dixwazin ewil zar û zêçên xwe ji ber komkujînê xelas bikin. Û li cihê ewledar bi cih û war bikin. Û paşê jî hêza xwe kom bikin. Û bizvirin ji bo azadiya xwe û gellê xwe şer bi domînin. Ji bo vê armancê jî cihê herî bi kêr û bi ewle li gor wan Îran bû. Lewra "Eşîra Sîmko" hem li dervayê Tirkîyê, li Îranê dijiya. Hem jî 'eşîrek giran û bi hêz bû. Ji aliyê din ve jî Kurd bû. Û ji wan re eqreba dihat hesibandin.

Ji bo vê armancê "Êla Hesenana" zar û zêçên xwe digrin û dikevin rê. "Şêx 'Elî Rîza" jî bi wan re ye. Ewî di "Gundê Kanîkorkê" ve bi ser "Ava Muradê" re derbas dibin. Da ku herin "Patnosê" û alîkariya "Kor Huseyîn Paşa" bixwazin. Lê mixabin Huseyîn Paşa hem vê daxwaza wan bi cih nayne. Hem jî ji wan re dibe mani'.

Ji bo ku "Şerrê Xwe Bi Xwetîyê" dernekeve, û bira xwina bira ne rêje. Bi ramana "Silêmanê Ahmed" 'eşîra Hesenana rîya xwe diguhere. Bi ser "Geliyê Zîla" ve ber bi alî "Dûtaxê" ve dikê. Lê sed heyf û mixabin di vê rê de jî hevkarên neyara ji

wan nagerin. Bilxase li dorhêla kirê **“Tendûrekê”** ‘eşîra **“Keskoîyan”** rê li wan digre. Û Dîsa şerrê xwe bixwetiyê diqewime. Piştî şerreki giran Êla Hesenan derbasî Îranê dibe.

De ka werin em guh bidin sitranbêjê xwe bê ka rewşa vê rêwîtiyê bi çi hewayî dinuhurîne. Di vê sitranê de pêşîvanê me dengbêjê heja **“Mihemedê Canşa”** ye. Ku bi ‘eslê xwe ji **“Qereyaziya Erzeromê”** ye. Li ser daxwaza wî ya di bandên wî de em ji xwendevanan dixwazin ku fatîhekî ji ruhê wî û hostayê wî **“Mistefayê Xelloyê Heyran”** re bixwînin. De keremkin guh bidin sitranbêjê xwe.

Di vê sitranê de hal û ehwalê gellê Kurdê musluman û diywariya neyarê wan, bêbextî û hevkarîya hinek Kurdan bi neyaran re, diywariya erdnîgariyê, perîşanî û halxirabiya muslumanan û demralîzasyona wan çêtir xwiya dibe. Rewşa herbê wek belgefilmekî di ber çavê mirov re derbas dibe.

Wê wê... Li minê wê wê wê...

Heyla lo lo lawo dimirim

Şerrê giran zor qewçe ye

Li min rebbênê qanûna kemal rabûna teze ye

‘Eskerê **“Birincî Ordîyê”** ji wê de tê tam firqe ye

Gişkî li serî şewqe ye, **“qizilbaş”** û **“çarego”** zalim **“don-me”** ye

Gazî dikirin li **“Ferzende”** digotin:

Lo lo Ferzende **“Kemalê Mistê”** bi sivê re wê bîne werfa me ye

Ferzende ba dikir digo:

Ez keleka pêşîya we me, kuştina me ji devê heft bavê Kemal zêde ye

Nuha bi sivê re wê di hewariya me bê apê min **“Hezretî Hemze”** ye

Siwro hê hû hû hû hû...

“Silêmanê Ahmed” dikire gazî digo:

Lo lo Ferzende lawo dimirim **“Geliyê Zîla”** teng e **“Zozanê Şînegê”** ber bi baye

“Fêrîgê Kemal” ji sivê da şandiye pêşîya me

Hezar û pênsid mêrê **“Celalî”** ya ye

Firqa **“Osman Nurî Paşa”** ji êvar de li ser piştî me agir dadaye

Kesekî xwedanî xêra tune cihabekî bide nêriyê mala **“Seyid Taha”** ye

Bi vê zulma vî gawirî gihîştîye ersê di ‘elaye

De lêxin bavê bavê mino lêxin

Bi sivê re xwe bighînin tixûbê Îranê ocağî şaye

Yê ku li pêşîya siwara diqelêşe

Kerem û Ferzende Evdal û Nusret, bexê mala efendî

Ez bimirim bi himmeta bavê **“Şêx Elî Rîza”** ye

Siwro hê hû hû hû hû...

“Silêmanê Ahmed” dikire gazî digo:

Lo lo Ferzende lawo ez bimirim qanûna Kemal mala me xirav kir

Li min rebenê bi serê me teresê Erzurumya kir

Lawo wexta me terka wetanê xwe kir

Me ji malê giran, ji cihêzê bûka yek yek siwar kir

Evdila birîndare di sûrê da, **“Nusret”** barê xwe li dar kir

Bi dîyarê goşê **“Xînusê”** bi degirmanê korta **“Melazgirê”** diketim

Hukumatê malê me kiriye mîrî

Le ‘erz û ‘eyanê me di nava dest û piya da payîmal kir

Siwro hê hû hû hû hû...

Silêmanê Ahmed dikire gazî digo:

Lo lo **“Keremê Qolaxasî”** Xalisê Ûsiv

Belkî bira mala we xirav be

Ma mi ji we re nego

Hunê qasekî runên li serê tîl û tîlgirafa li kavila vê Îranê

Têle kî berê bidin li **“Tewrêzê”** kavila Dînyeman ê

Yekî bidin wêrana Sitenbolê mala Bedirxan Begê ne bi xêr bû bavê Kurdistanê

Yekî bidin deşta Nêriyê mala Seyid Taha

Bêjin mala we mîrat be hun çi sekinîne li kela nêriyê li vî gelberî

He la rabin bi dardakirin bavê Şêx Elî Rîza dîreka dînê Îslamê

Di gel ehlê şerî’etê pêra **“Xalid Begê Cibirî”**

Ezê rabim pêş dîrekê herim wêrana **“Diyarbakir”**

Di bin çardara bavê Şêx Elî Rîza de rûnên

Ji bona şêxan û melan û Kurdistanê babokim ter bigirîm siwro hê hû hû hû hû...

Heyla lo lo lawo bimirim şerrê me bû şerrê anayê

Li min rebenê navê me belabû li dinyayê

Kemal li me bûye **“Noşîrewan”**

Şerrê me bû şerrê qereman û qatîl û dêwan

Siwro hê hû hû hû hû...

Hela li minê li minê li minê wê wê... Li minê wê waaaa...

Ax ayî ay

Gelî xwendevanên hêja! Em li vir dawîya rêzenivîsa xwe a li ser sitranan ên nêzdîroka me a benda pêncan tînin. Heger Allah te’ala îzna me bide em dê di benda şeşan de derbasî alî Îranê bibin. Bê ka li wî alî çi qewimiye. ‘Eşîra Hesenan gihaye armanca xwe an jî negihaye...

Hinek Lîstikên Me

✍ Ferhad Bagasî

Serê biharê ye, wextê gul û kulîlka ye... Mijara me “Lîstikên Me” ne. Yanî: Di kultura gelê Kurd de lîstik. Bi rastî di kultura hemî gela de lîstik hene. We guhê xwe dabiye heta vêga aqlep orf û ‘adetê gelê Kurd me raxiste ber çava. Lewra heger îro em li derziya xwe xwedî derneyên sibê çêlek jî here ne gema me ye. Dibê: ku te girt, bernede: ku te berda jî pey nekeve. Yanî em îşê xwe serî ve mezbut bikin. Bi rastî ji kulturê ve gelê Kurd pir dewlemend e. Ew jî ne kêrî va gelê di ye. Dest vekirîne, mêr in, merd in.

Mijar jî lîstik e. Belkî ev ‘adet û lîstik di hemî gela de hebin. Lê belê tiştekî ku me bi çavê xwe di nav xwe de dîtîbin emê nivîsênin. Ev lîstik di nav xwe de jî tene veqetandin. Hinek jê havînî, hinek jî ê çilehî ne. Hinek jê aqlep pîrek, hinek jê zilam dileyizin. Di nav me de li gora wextî lîstik jî hene. Bi rastî xortê vêga belkî navê wan nizanibin. Lê belê tu ji ê berê bipirsê wê xizînî bi qirqa wan kevê. Lewra ji piçukayiya xwe heta meznatiya xwe di jiyana wan de lîstikê wan ev bun.

Lîstikên me ev in: Birrê, veşartok, tuştê, darpelk, heftok (pîncok), hingulîsk, binîk, girê devehê, ‘ilç, gulaşê (afra), xesk, tevş û gok, ferşik, girk û pez, kap, berdiwar, gar û pere. Bi rastî kî bixwazê karê teva bileyzê. Lê belê pîrek aqlep darpelk, heftok, hungulîsk, xesk, tevş û gok, fer-

şik dileyizin. Zilam, veşartok, tuştê, girê devehê, ‘ilç, gulaşê dileyizin. Ev lîstik: Di nav diduwa û berjor dileyizin. Bê çewa dileyizin emê bi kurtî ji we re nivîsin.

Birrê: Di nava di gruba de tê leyizandin. Hinek di-revin, hinek jî hem kevrê ku hebandine diparêzin hem jî didine pey ê dî. Kî hate zeft kirin dişewitê. Ê ku di-revin ku xwe bighinine kevrê ku hebandine kar dîkin. Kalekî li ê pêşper dîkin.

Veşartok: Aqlep di axuwa de tê leyizandin. Yek dikevê berê, êdî xwe diveşêrin. Kevîrek ji xwe re dihebin, kî tê dîtî baz didê nigê xwe dideynê ser kevir. Lê belê havînî hingî ku kêç hene yastar nayê leyizandin. Axur bela ku tev ziblê heywana ye tev kêç û gen û kijnik in. Lê belê dîsa em dileyistin.

Tuştê: Du grub in. Hinek diçin xwe diveşêrin hinek jî li wan digerin. Bi şev tê leyizandin. Ê ku diya wa ye, bukekê jî ji xwe re dineqênin, di nav xwe de. Wexta ku li wanê dî digerin lazim e ku bûka xwe jî pir biparêzin. Ku bûk bê girtin, wê tev bişewtin. Wexta ê pêşber xwe bibînin, wê bêjin tuştê, tuştê, tuştê... Hingî buk wê bazdê kevrê ku hebandine wê bê lingê xwe deyne ser. Ji bonî ku kar kin.

Darpelk: Darekî kin e û yekî dirêj e. Bi ê dirêj li ê kin di-xin, heta devera kû



herê. Ê dijî dirajiyê darê kin dadikê ba ê dirêj. Navbera ê kin û dirêj dijmêrin çiqas bê ewqa kale. Bes (koşu) kulkulî (sekeseke)

Heftok(pîncok): Bi pênc kevira tê leyizandin, bi şeş cara re xelas dibê. Bella, doko, sêko û deppo, kullo û ser desta. Her carê kevirekî tu dirakê hewa û ‘eynî bi wî destî kevira dideynê erdê. Pêşî kevirekî ji erdê dirajiyê peytir de dido, pey re sise, pey re hemiya. Di kullo de: kevir dirakê hewayê hebo hebo di bin tilyê xwe de derbas dikê. Di hemi ciya de jî kevir dirakê hewayê ‘eynî bi wî destî dileyizê.

Hingulîsk: Di grup li pêşber hev in: rexik hungulîskê diveşêrê êdî jî gereke pê derxin ku hunglîsk bi kêre ye.

Binîk: Ev jî weke hunglîskê dileyizin.

‘Îlç: Darê tuj in. Di nav heriyê weya li ser tînga (sergo) a dileyizin. Dara li hev dixin, ê kê kete erdê ew dişewitê û darê wî jê diçê.

Ferşik: Heft ferşika dideynine ser hev ya bi gokê ya jî bi kincekî girover tê leyizandin. Yek dikevê berê ê din jî bi dorê kinc diferşika wer dikin. Ku ferşik ketin, ê di ber de dirajê kinc di wa wer dikê. Ku ferşik ne danîbine ser hev kinc li wa kevê dişewitin. Ku ferşik temam bikin kar dikin.

Kap: Ev kap ji lingê bizinê pêş çêdibê. Wexta ku dermale me dugrand, bi wa kaba em dileyistin. Çar ruwê wî hene her yekî navekî wî heye. Li rexkî ji diza, li rexkî ji mîra, li rexkî ji kera, li rexkî ji sofîya. Me dadikire erdê kîja rex dihat me ew nav lê dikir. Wexta ku koklanî dihat kê maçkîra kabê xwe wî kar dikir.

Girê devehê: Dido heb serequnkî xwe dirêj dikin lingê rastê tavêjine lingê hev, kê kê rakir.

Topizk: Bi tiliyê desta topizka li serî dixê, dibê kîja tiliye? Heta ku tê derxê derba dixwê jî desta

Ka ew dewra berê ku yek li civatekê bistirênê, çîrokekê bêjê, êdî lê bihîsin. Bi şev tev werne ba hev bi hev re bileyzin. Ka lîstîk, çîrok, sitran, ‘adet û kultura me? Hema hema me tev jibîra kiriye. Heger aqilmend îro xwedîtîyê li kultura xwe, li din û diyaneta xwe nekin di nêz de wê tev hunda bibin. Lê belê werin em ji serî ve zemkin. Ku em diketne nav ciya ê ku çîroka zanibun ji me re digot heta ku em dirazan. Carna çîrokek heftûkê dewam dikir. Çîroka dîk, ker, rovî, pîrê û dîk, ya sê bira, ya Mîrze bihemed, gezalok, kîso, feqîr û zengîn...

Di civatê gunda de ciyê melê jî pir bilind bu. Qedr û qîmetê wî zêde bu. Civata ku dihatiyê ew der dikire ronahî. Ji gundiya re alîkar bu. Gotina wî li ba gundiya yek û yek bu. ‘orf û ‘adetê me ev in. En tiştê xweş ku ê yekî ne.



Dilevin Botî

Ey dil!

Ma te ne bihîst? Çi bûye?

Ew kêfxweşiyên wek hêlma ‘Îsa heyatdar
Çilê zivistanê

Weka nefesek ji meltema bêhna “*Bayê Seba*”yê
Pêl bi pêl belav dibe li dilên dilxwaza; ev
kêfxweşî

Êdî elzem e hemd û şukurdarî, li ser me
Nebêje ma çilê zivistanê kulîlk dibişkuve?

Nebêje ey Dil!

Ma te ne bihîst?

Kulîlkên bişkuvîn çilê Zivistanê da
Çagê ew bixwaze çêdike sebaba...

Bi emrê “*Kûn*”...

Ey dil!

Eva serê çend sale di bexçê dilê me
Hatibu reşandin huzn û gem û êş û elem
Çar demên salê, her me Payîz dizanî;

Heya îro salên me bê demsal derbas bûn...

Bi meşeqet û zorî û zehmet, ji kêfxweşiya dûr
Perçeyek ji jiyana me bu êdî huzn û gem û êş û elem

Me jibîr kiribun ‘îd û sersal, weka sêwiya;
situxwar...

Lê çagê ew bixwaze payîzê jî dike bihar;

Diherikîne ji çavkaniya rehmetê gem û avên sar
Kêfxweş bin; lewra îro kêfxweşî heqê we ye...

Barana Rehmetê!

📖 M. Tahir Soranî

Bibare! Bibare li me!
Ey barana rehmetê!
Ji kaniya heq bibare!

Geh bibe hêstirê çava
Dila nerm bike,
Hinariya bilind bike.
Û geh bibe hêviya mezluma
Dila xweş bike,
Aşiqa serxweş bike,
Bibe ava hîdayetê!

Bibare! Bibare li me!
Ey dilopa çavê muhacira!
Ji Zemezma Hacer,
Bibare!

Îsma'îla av de,
Heciya av de,
Yetîmê şehîda,
Û zarokê girtiya,
Av de!
Û bibe milkê alê Îbrahîm
Hewara kerwanê nû!

De bibare! Bibare li me!
Ey barana zelal!
Ji 'ewrê 'izzetê
Bibare!
"Nîl"ê mezin çêke!
Fîr'ewna bifetsîne...
Tofanê mezin rake!
Erda xwedê paqij bike.
Û bibe teselliya dilê min!

Zû bibare! Bibare li me!
Ey barana zelal!

Ji hewdê Kewserê
Bibare!
Bibe ava destlimêjê.
Nûra serçavê mumina.
Qelbê hişk
Lêvê qelişî.
Û qiriqa ziwa
Av de!
Gula Muhammedî

Nêrgiza xoşamedî
Û sosina Huseynî
Av de!
Û bibe milkê alê Muhammed
Ruknê meşa nû!

Ey barana pîroz!
Weke xunafa serê sibê,
Bêxuşxuş
Bêmişmiş,
Were!
Hêdî hêdî!!

Nerme nerme!
Bibara!!!....
Kêfa cotkariyê mizgîn!
Kêfa rêncherê dilovan!
Werîne!
Bizr û tovê çandî
Dendik û sîsikê reşandî
Şîn werîne!

Û du'aya pêxemberê min
Qebl bike
"Allahumme esqîna!
Ğeysen muğîsen
Henîen merîen..."

Doza Me

Ez dinhêrim! Va çi hal e, li welatê min giran,
Pir çûne pêş digerrîn, dek û dolab û virran.
Serweriya me, xistine destê xwe bi dagiran,
Hêz girtine ferman didin, ji ber kêfa zordaran.

Bes çi bêjim îro ferman, li destê dagirkeran,
Demek dîtir çû mêtokan her warê kirin talan,
Lê dîsan bo mêtinî wan, li gellê me kir lêdan,
Bes koletî! Êdî çû çû! Dema wan koledaran.

Êdî xwaş xuya bû zeman, ji bo evîndarên me,
Gund û bajar li her deran, lew di meşe eşqa me.
Roj bi rojan, meh bi mehan, bilind dibe doza me,
Dewran li me vegeriye, wê sal dibe dora me.

Dengê jar û perîşanan, êdî gellek rabûye,
Dubendî ji bo çeplusan, tim û tim ne kar bûye.
Bes bû! Ji dengê bindestan, lew tevgerê saz bûye.
Cîh nema jê re, ev me re nîşan bûye.

Tîrêja ronahî îjar, ji aso ve va tê der,
Dîsa evîna gellê jar, li cîhanê seranser,
Deşt û zozan, gund û bajar, li her warê alîker,
Dest dane dest, mil dane mil, doz geş bû bes li her der.

Diyar bûn ev xortê cîwan, bo Xweda bûn leşker e,
Xebatkarin xwedî exlaq, hemî li pêş me te re.
Rêç û şopa dilşadî, pêk anîne ji me re,
Bes çavan veke ka were doza me bû eşkere.

📖 Dilşadî

Dilo Rabe

✍ **Şêx Munewwer Berwarî**

Dilo rabe veka çavan
Were seyr û temaşayê
Derê herbê vebû dîsa
Kûrê baban xwe kêşayê

Ketin rêzê li ser dîzê
Kîşan hev şubhenê bîzê
Hemû fikrê xwe wek tuzê
Bi mirnê dane ber bayê

Berê xwe dan rexê Ke'bê
Hişê xwe dane ser qelbê
Bi hûbbê ber birîn kerbê
Werandin xwe li kimyayê

Birin qebrê xewf-ul halî
Hemû halî ewî çalî
Kîşan yek yek ji her alî
Xwe lê danîn li dinyayê

Demê hat rehniya çavan
Cefa hilda ji wan navan
Sefa rête wekî avan
Hilanî zor û nûr dayê

Ji hubb û heybetê lerzîn
Heta qafî seran derzîn
Nevîn got îdî naterzîn
Xwe kîşandin ji e'daê

Li hev wer bûn wekî bayê
Li ser hevdû bi ta tayê
Xwe dan ber hestî û rayê
Li nav polan melûl mayê

Şerîta mermiyê sed yek
Bi destê rastê dan her yek
Birin ber zû bi zû tek tek
Tila şehdê ve weşayê

Xwarin ket bedenê tev da
Bi qur qur ket di nav hev da
Nevînan xwe ji cih berda
Bi taîra digel bayê

Kî zakûlî ji nav pûlî
Reşandin wek reva holî
Di her yolî ketin çolî
Ji têhn û bêhnê gewgâê

Ji bin keşîa wekî şêşan
Pirêza duşminan kêşan
Çiqa-d bê zêdetir êşan
Xelas bûn halê dunyâê

Beden bûn kûp ji bû çae
Serî bûn tûb li ber bayê
Bibû gâzan şeqan dayê
Heware tev ketin tayê

Hinav lê biçîçên nav da
Mejî lê qîç qîçên gav da
Demaran xwe li hev tevda
Welî ji zewq di furhayê

Ji ser dinyayê rabûn hiş
Di destê wan xelas bû gîş
Bi têhn û bêhn vegirtin xwiş
Reşandin li şirîna yê

Ketin mislê xewa şîrîn
Gihane suhbeta dêrîn
Cesed mane digel qêrîn
Meded ya gewsê Beğdayê

Li pê bêhnê li pê tihnê
Melek hatin bikin dihnê
Kirin gazî gelô wernê
Xeber dan Heq Te'alayê

Civîn ser da ji her 'erda
Ji erwahî nefes serda
Kîşan eqtab ji piş perda
Leya feyzê xwe şîn dayê

Ji ehlê nîsbeta hazir
Bi hindî himmeta hadir
Bi govê her wekî çadir
Li dor wan bûne pêçayê

Bi ceryana di her rûhî
Bi hev re ji-alî sibbûhî
Fitûhê geyb li her rûhî
Bi qas wî bû feqethayê

Digel kil kilt û hil hiltê
Ji bêhna kezeb û dil tê
Bi rengê mirnê ser hiltê
Çiya çû wek xwe qet nayê

Kesan dîne bi dû çavan
Xwe dan hîmmet li etrafan
Heqî nas mayî hindavan
Ekabîr jorî dûr çayê

Ji derda Xalidê Samê
Selam dayî xwe da damê
Di pê yek yek ji Xweda mê
Ku Şêx Salih şefeq dayê

Wiha heta Şêx 'Abdûllah
Rijaye meclîsê wellah
Bi tîrêj û şû'a heyhah
Kemer girtî li gewgâê

Qirara ehlê îmanê
Bi her kil kiltekî hanê
Nimêjek xêr di mîzanê
Dibî peyda di 'ûqbayê

Ji yumna qutbê "Vêlas"ê
Ebed namînîte 'asê
Kesî xwarî ji vî tasê
Xwelî li min vê nezanayî

(Malavahî ji bona kekê Mezher)

Dîz: Diz

Bîzê: Îp

Xewf-ul halî: Naas, Ceset

Zakûlî: Arî yuvasına çomak sokmak

Gewgâê: Inleme

Dêrîn: Derin

Gewsê Beğdayê: Abdulkadir Geylani

Şêx Salih: Şêx Salih Sêpkî

Şêx 'Abdûllah: Şêx Muşerrefin Dedesi

Vêlas: Şêx 'Abdûllah'in köyü

Tuzê: Toz

Şex Munewwer: Şêx Eshedin en büyüik ikinci oğlu, Şêx Muşerrefin kardeşi

Çiroka Berfînê

 Mamoste Çiyayî

Bi navê Xwedayê ku demsala li pey hev diherikîne...
Di zivistanan de, li çiyayê me, Çiyayê Mazî, pir zêde berf dibariya. Sala ku herî kêr bibariya, gongekî dibariya. Gelek salan, navekî, salna jî bejneke berf diket. Jiyan gelekî zahmet bu. Ji ber ku em tunebu, zêde ajalên me û ên gundiyan dimirin û gelek ajalên kuvî jî telef dibun. Çavên me yên ku li arê ku di tifikê de dişewitî dinihêrîn, bi xeyala bihara ku ewê were zelul dibun. Çi zivistanên gedar. Temamê benderuhan, perîşan dibun. Weke evî zivistana kufr û nezaniyê, gunehan û jibîrkirina Xweda (c.c) û zilm û zordestiya neyarên Xweda (c.c) ku li me tê kirin.

Ya Reb! Çi zivistanêke bê dawî. Çi sitemeke giran. Çi te' de û ezyetên pir. Çi perçiqandin û qelandineke dijwar. Çi kêmxistin û bipaşdehiştina mezin. Ev çend sed sal derbas bun ku ji her hêlî ve neyaran dor li me pêçane û dajon ser me. Em li hember wan tekoşîn didin jî dev ji me bernadin, em nadin jî dev ji me bernadin. Îslam û baweriya pê, buye bizota agir. Ku yek bigre destên wî dişewitin, ku bavêje dihere. Ev hezar û çend sed sal derbas bun ku me bihara 'esra seadetê winda kir. Ne havîn me dî û ne jî payîz. Çewa ku bihar qediya, ev zivistan bi ser me de hat. Her me hêviya biharê dikir, belê evî zivistana gedar, bandora xwe ya qerisîner her li ser me zêde dikir.

Di çiyayê me de temamê cureyên kuviyan dijîn. Kew, quling, sîsark, başuk, gèzal, ruvî, kêroşk, gur, hirc, çî kuviyên ku bêne bîra we tê de hebûn. Ji dar û ber, gul û giha jî çî cureyên ku bêne bîra we dîsa tê de hebûn. Her darek mazî, ku çar meriyan destên xwe bidana hev, encax li dorê wan bihatana hev. Ji te' ew û guhîjan, ji berru, guz, qeresî û qizwanan, rê tunebu ku meriv bimeşiya. Îjar ji giha û pincaran jî, çî tiştên ku bêne bîra we hebûn. Belê ji vana teva cudatir tiştêkî din hebû. Berfîn hebû berfîn.

Berfîn, kulîlkek e. Belê ji kulîlkên din teva cuda ye. Temamê nebatên ku hene, ji boy ku jiyana xwe bi domînin, hewcedarê rojê ne. Ku rojê nebînin, dimirin. B erfîn jî evîndarê rojê ye. Belê ew, cuda ye. Ew, ku rojê bivîne dimre. Weke pîrpirîkê

ku 'aşiqê mumê ye û li dora evîna xwe dizivire heta ku baskên wî dişewitin û dikeve ber lingê evîna xwe û li wir jiyana xwe ji dest dide. B erfîn jî 'aşiqê rojê ye. Dema ku ji bin berfê derdikeve, evîna xwe, yanî rojê dibîne, û bi bandora tîna rojê, ew jî dimire. Belê disa jî ji derketina ji bin berfê nareve, tevî ku dizane ev derketin, sedema mirina wê ye.

Tiştêkî din jî heye ku divê bête gotin. Ew jî eve ku berfîn, nîşana yekan e, ê hatina bihara rengîne. Hecî Musa Beg, mezinê gund bu. Ew jî weke temamê gundiyan ji dirêjiya zivistanê adis bu. Ji ber vê yekê 'adetek rast kiribû. Li gorî vê 'adetê, ji zarokên gundiyan kê berê berfînek ji wî re anîbaya, mirîşkek bi xelatî dida wan. Ji bo vî pêşbaziye, hema ku meha sibatê dihate, zarokên gund tev bi çolê diketin û li berfîna ewwîl digeriyan, tevî ku xetereya êrîşa guran hebû.

Êdî hemd ji Xweda (c.c) re ku em, gihîştin biharê. Zivistan bi dawî bu. Me hêvî heye ji Xweda (c.c) yê mezin û bê heval ku, ewê bihara Îslamê ê pîroz jî, di demeke nêz de bi ser me de bîne. Qasidê Xwedā (s.s.x.l) cara pêşî çewa ku di bihareke rengîn de hate û bihar ji me re anî, dîsa ewê bi tevî temamê şewq û şemala şer'a xwe yê pîroz, weke rojê li me hilê. –

Mela Zibêr digote; "Ey Qasidê pîroz! Bi tevî temamê şewq û şemala xwe, bi ser me de were. Lewra em dizanin ku rohnayiya-rojê bi qasî zikata rohnayiya te heba, ewê bi dehan gerdunên din weke vê gerdunê rohnî bikra û bêtir. De ka were! Jê bigere, bira ji hesûdî dev li canê xwe bikin Leyla û Zînê. Çiqas Memo û çiqas Mecnûn hene tev 'aşiqê te ne."

Erê weke min çiqas Memo û çiqas Mecnûn hene tev dixwazin ku te û reng û rewşa te û şer'a te yê pîroz bibînin. Digel vê dîtîne, weke dîtina berfînê yê rojê, heye ku bibe sedema windakirina jiyane. Çi dema ku tu were gelek dilda hene ku di xelata hatina te de ruhê xwe bidin.

Bira agirê di dilên we de qet sar nebe. Heta hevdîtina di jimareke din de bimînin di xêr û xweşiyê de, sipartiyê Xweda Te'ala bin.

Baran Jî Nesekînî

 Hasan Sabaz



- Baran jî nesekînî.

Bi gavê bêzar rêveçûna xwe domand, di nav heriyê de gavê xwe pir bi zehmet davêt. Hêdî hêdî nêzî hewşa Mizgeftê bû. Dema kû kete hewşê baş li ber baranê şil bibû.

Li ber derî lingê xwe li erdê xist û şekala xwe paqij kir. Hêdîka derî vekir û biguhnedarî li ber dîwarekî runişt.

"Li pêşiya me zivistan e." Go di dilê xwe da. "Çiqas diçe dunya sar dibe. ÎnşaAllah wê êzing têr bikin." Keniya li halê xwe. "Tu dibê qey min jibîra kiriye, ez ji bo çî hatime."

Le'net li şeytan anî û rabû ser piya. Gavek avêt û sekinî. Ji nişka ve berê xwe da milê çepê. Hecî Şemseddîn bi me'dekî tîrş lê dinêrt. Recfek ji piyê wî dest pê kir heya serê wî. "Guh nede li karê xwe binêre." Go di dilê xwe da. Destê xwe bilind kir. "Ya Rebbî ez niyet tînim çar rik'et mêja... Mêja 'esrê... Esteğfirullah... Mêja nîvro, berê min li qiblê, ji Xwedayê Te'ala re eda dikim. Allah-û Ekber." Destê xwe girêda û biqasî deh saniya sekinî. "Ez ji bo mêja nîvro hatime, lê belê! Niyeta mêja 'esrê tînim. Hiş nemaye. Lê tu mêj ne wekî sibê ye. Mêjî jî rehet e, beden jî. Esteğfirullah, ev îro çiyê tê serê min."

Dest bi Fatîhayê kir. "Elhemdulillahî Rebbûl 'alemîn. Er Rehmanîr Rehîm..." Hecî Şemseddîn jî çavê xwe naşkîne û li min dinêre. Di cilê min de jî tiştêk 'ecêb xwuya nake. "Maliki yewmiddîn." "Sibhanallah... Çavê wî li min e... Ez li kur mabûm? Ha temam... Îhdînessîratel musteqîm..." "Pira selatê jî rêyekê zehmet e. Rojê çend cara di mêjê de navê wê derbas dibe. Weleddallîn, amîn. Allah-u Ekber."

Xwe tewand û çû rikû'ê. "Hêjî li min dinêre Hecî Şemseddîn. Kurik jî sê mehe çûye 'eskeriyê. Nizam ciyê wî başe yan nebaşe."

Bi hinek lezîti dom kir mêja xwe. Silav da û destê xwe bilind kir. Ji bo çend kelîma du'a bike. Destê xwe li ruyê xwe da û rabû. Berê xwe da deriyê camiyê, ji bo kû here.

- Muhemmed!

Hecî Şemseddîn bi dengê bilind gazî wî kir. Dilê Muhemmed recifî.

- Bêje Seyda!

- Here, carekî dî limêj ke!

Muhemmed dengê xwe nekir û dîsa zivirî ciyê xwe yê berê. "Dibe kû min di hinek erkanê limêjê de jêletî kiribe."

Carekî dî niyet anî û dest limêjê kir. Lê vê carê bala xwe baş dayê û hêdî hêdî mêja xwe temam kir. Silav da û berê xwe da deriyê camiyê.

- Muhemmed!

Piyê wî tu dibê qey hişk bûn bi vî dengî. Sekinî û bi me'dekî zer berê xwe da Hecî Şemseddîn.

- Libê Seyda!

- Here carekî dî limêj ke!

Weka ku qofek av bi serê wî de vala kin. Laşê wî cemmîdî û zimezim ji guhê wî hat. Du gav avêt û sekinî. Ne çû ciyê xweyê berê. Destên xwe hilda, lê bi dengê bilind go:

- Ez bi niyetim çar rik'et mêja nîvro, ji Hecî Şemseddîn re eda dikim...

- Tu çî dibêjî 'Ehmeq!

Tu dibê qey şeqşeqa 'ewra bû dengê Hecî Şemseddîn. Lê Muhemmed nericifî vê carê. Bi nihêrtineka cemîdî berê xwe da Hecî Şemseddîn.

- Min du cara ji bo Xwedê kir te qebûl nekir. Ya sisiya ji bo te dikim îdî dibe ku tu qebûl bikî.

Muhemmed, Hecî Şemseddîn di nav behra şaşîtiyê de hişt û berê xwe da deriyê mizgeftê.

Sebêb Virastîş Însun

 Cîhan Bozaba

Zamun vêrîd yo merdim mun topikê sîlîd yo heywunêk vînen. Tira vun gulal. Binêk unyen tira o xwîr xud îna vun: Ya Rabbî! Tu ina çi virašta o ešta mun îna sîl, in sil şunena ra?

Bad in vatîş xu, in merdim rojêk zaf ben nîweş. Yo nîwêşîyêka girun musallat ci bena. Îna nîwêşîyê xu ser xêlyek hekîmun gêren. Lê belê nîwêşîyê xur yo dermun nîvînen. Pênîyê pênîyunid yo hekîm eşna-won. Tira vun Loqman-i Hekîm. Dun puri şin vêr yi.

Hekîm nîwêşîyê yi tira persen. Nîwêşîyê xu hekîmra vun. Hekîm hetun pênî gues nun ser. O vun dermun ina nîwêşîyê tu ino: Ti şin mun sîlra gulalu dun arîye. Bêna kîyed tehnên. Çoras ruej pîser ti her ruej in dermunra wên. Huma bîyar wêrî ti îna bikîr, ti bêna weş wihar.

În merdim, qêdok hekîm tira vun, êynî otir ken. Şin mun sîlra gulalu vîjnen. Un kîyedi pê sîrkutîk tehnên. Ruej ruej binêk wen. O pê emîr Humêyî şîfa vînen o ben weş wihar.

Êynî in merdim yo ruej nişen gêmî cê hêtya şin. Gêmîd bî yi taynê merdîmîz êst. Wextog gêmî rase-na mun behrî, firtinêko şiddetlî yen o mun behrîd konî tengunî. Ay merdîmîg hê gêmîdi qarî nun xu ser, kon yo teşqelo welweli. Her yo yo heta şino yen.

În merdim cara cêy xura berz nîben.

Yunê mudi firtini nişen o behr beni asun. O wext ay merdîmîg hê gêmîdi in merdîmra persên, vun: “Ya merdim! Ti sênî yo însun? Yunê bini ma pîyer fatîsyên o helaq bîn, tu gêm tu nîw.”

Merdîm vun: “Qusur nîmunî. Mi xur xud sund wend. Mi vat ez êra têpya qarîş gurun Humêy nîbena. Ez hîkmetê yira sual nîpersena. Yo hew ez qarîş gurê yi bîya, mi semêd gulalê mun sîl va, “ina çi umêya viraştîş?” Humêy çoras roj ina gulalê mun sîl da mi werdiş. Ayêra ez hîn qarîş gurun Humêy nîbena.”

Gelê wendexo!

Îna mesela rašta yun gîlafa, ma hol nizun. Lê belê ina yo heqîqetêka, in kaînatid yo mexluq çînyu kî, bîla sebeb bîyer viraştîş. Însunra bîger hetun heywunu, darunra bîger hetun koyu, kerunra bîger hetun estaru... Çitag yen şima vîri, pîyer pê dêst Huma Tealay, qê yo sebêb, qê yo hîkmet umê viraştîş.

Viraştîş Humêyîd yo qusur, viraştîş Humêyîd yo betalî, viraştîş Humêyîd yo nebaşî qet çînyu. Çiqêdik yo deva o yo munga bîla sebeb o bîla faydî nîumê viraştîş, êynî oqêdi yo mîyeso yo merjulazî bîla sebeb o bîla faydi nîumê viraştîş.

O zamun ma gereka semêd viraştîş însun bipers o vaj:

Însun çi umo viraştîş? Rî êrdîd wazîfê însun çitawa? Huma Teala însun ra çita wazen? In sual sualêk zaf muhîm. Mara cevab o îzahkerdiş wazên.

Ma him pê aqîl xu, himîz pê kelum Humê Tealay êşkên in sualun xwîr cevabêko raşt bivîn.

Huma Teala yo ayetê kîtabîd îna vun: “*Wema xeleqtu’l cînne we’l înse îlla lîye’budune...*”¹ Me’nê ina ayet îna: “*Mi cîn u însun başqi yo sebeb ra nîviraşt. Mi yi viraşt kî, wa mîr ‘îbadet bikîr...*”

Îna ayetê Qurunîd sebêb viraştîş însun zaf hol umo bêyunkerdiş. Ma xewerê Humêy xura inê fum kên:

Însun qê şinasnayîş Humêy xu umo viraştîş. Însun qê zîkîrkerdiş Humêy xu umo viraştîş. Însun qê îbadet o teât umo viraştîş. Însun gereka xu bişinasn. Hed xu, o wazîfê xu bizun. Însun xu nêzunse,

Humêy xuz nizun. O semedra gereka în سوالun ser
ço gellêk tefekkur bik. O ço xura bipers:

Ez kuma? Ez çara umêya? Ez şin ça? Dê bunî şaîr
semêd viraştîş o wazîfê însun çi weş vun: Humêy ti
hin nîviraşt, tu ra zîkro teât waşt, bar girun tu kerd
xu paşt, hayê xu biw êy însun.

Ti viraştê Allayî

Ti qîj Adêm Hawayî

Ti xêlîfê dunyayî

Înê bizun êy însun

Hemi heywuno nebat

Seraser in mexluqat

Humêy semêd tu viraşt

Şukur bikir êy însun

Gelê bisilmunu!

Însun xêlîfê sêr êrdo. Rî êrdîd pê numê Humêy
êmel ken. Pê hukum Allêy o pê êdalet muameli
ken. Êrd Allêyî pê aqîl o pê îstîdat xu ken ma'mur
o ken şênî. Ce'dê Heq, ce'dê êdalet o ce'dê xelasîyê
dunyaw axrêt muejnen însunu.

O semedra wazîfê însun gellêk zora. Bar însun
gellêk girun. Huma Teâla vun mi ina emuneta gi-
run (De'wê Îslumo Qur'un) na sêr qilluna nîşkê
berzîk o qebul nîkerd. Lê belê însun emunet qebul
kerd. Bar girun guret sêr mîl xu.

Yunê ayetê Qur'unîd Huma Teâla derheq
însunîd inê bêyun ken: "...Leqed xeleqne'l însane
fî ehse'nî teqwîm. Summe redednahu esfele's-
safîlîn..."² "Ez qesem ken, mi însun zaf hol yo su-
retid viraşt. Bajê (qîymêt xu nîzuna, xu xeripna) bi
pîs pîsu. (Bi rêzîl rêzîlu.)

Ma ina ayetra îna yo ders gê: Însun wextog xu
bizun, Rab xu o Xalîq xu bişinasn, vatê Humêy xu
biker, o wext ben însun. O wext ben wihar qedro
qîymêt. O wext ben Eşrefî mexluqat. Lê belê însun
hed xu nizun, wazîfê xu nizun, Rab xu o Xalîq xu
nîşinasn, goştarîyê qisun pêxemberu nîkir, pê vatê
şeytun o pê vatê nêfs xu ce'dira şîyeri, o wext însun
daîre însuntîra vêjyen. Qedru qîymêt xu ken vîn.
Ben cahîl, ben asî o ben gunahkar. O wext (Huma
muhafaza bikir), le'netu êzab Humêyîz sêr yid ben
heq. Pê tabîr Qur'un ben esfelî's-safîlîn.

Huma Teâla in însunra îna persen, vun: "Ya
eyyuhe'l însanu! Ma çerreke bîrebbîke'l Kerîm.
Ellezî xeleqeke fesewwake fe êdelek. Fî eyyî suretîn
ma şac rekkebek..."³

"Êy însun! O çîg qarşî Rab tuw Kêrîmid tu ken
asî, o tu ken gunahkar o çito? O Humag ti xelq kêrd.
Wasîl tu êdaletî viraşt. Suretêko hol do tu..."

Huma Teâla ma, taîfê asîyun o gunahkarun-
ra dur tepiş. Ce'do heq ser, ce'do raşt ser, rîye
pêxemberun o salîhun ser şîyayîş nasîp ma bîker
înşaallah. (âmîn.)

1- Zarîyat, 56

3- İnfitar 6, 7, 8

2- Tîn 4, 5

Ey Nûr

Wexta ku tu çînêb dunyad, her cad zulumat
Înson û cin tarîdîb, 'asî bîb her cad
Tu ersawyêy sêr 'erdo, hemi xelesyay
Mexluqat pêr yow sowtra tori on selat

Hem Înson û hem cino tori ard îmon
Eshab û hewalon to mari sêy esteron
Heskerdîş to mîn komdîb hîn tim ena vat
Heta roca qeyom con ma tor qirbon

Ey pêxembêr Humay pêr to ra heskên
En semed ra 'erd û 'ezmo to qalkên
Roca ku tu omêy dunya heta ena roc
Ma heskerdîş to ra çiray çik vîn nêkên

Qatêy 'ezmonod nomêy to ra von Ahmed
Sêr 'erdodiz nomêy to ra von Muhammed
Tu her cad û her waxtid tacêy serêy may
Heme rind pê to kamil bîv en semed

Kelom Humay von ek şima mi ra heskên
Muhammed teqîb bikîn şima heq vînên
Kîtabid ma ra von heta roca qeyom
Ayu ku hî dima şêrî zirar nê vînên

Ey Nûr! Ma ena dunyad herçî 'er verda
Mal, ewlad û meqam ma pêri tor feda
Heta tu ma ra hes bik û şefa'at bik
Ey Nûr çimon ma may ma pî ma tor feda

 **Muhammed Hênî**

Înson

 Mela Faruq Dimilî

Înson mîyon mexlûqan Homêd en pîl, en qiymetin. ‘ilm, însôn meleketonraz pîl kerd. (Beqere-31, 3) Pawa îna însôn biqusûr nîw. Çunkî bî Homê bîqusur yo, çin. Homa têna bîqûsûr, bî’eyb. Gwrî ma vêrîn in: Ma xwi pê kemonîyonxwi bişinasn, reyo mîyoncîn, orteyin bivîn, çi weqt ma însônêkdr ‘eybek bivîn ma bizon in ‘eyb, qusur madirîz est. La kemoniyawxi qebûl kerdiş însônîr zaf zor yen. Çunkî herkes xwi ra hesken, in heskerdişiz nîverden merdûm qusuronxwi bivîn, xwi bişinasn.

Ma ina heqîqet qebl bik: kom yo çîkeki ra zaf hesbik in heskerdiş vînaye yi kê m ken, ça biv însôn ken kwar. İn halid însôn neêşken xwi kemonî ra bifelitn, xwi elever ber wa zerrêxwi hîra bik. Pê zerr hîrayî têna ma însônondir vîyernên, pê çîkeko bîn nê.

Eger însôn bîn mar yardîm nîkenê ma neêşken xwi bik însôn kamil. Qê însôn, qas xwi bes vînayîş, xwi biqusur vînayîş çîkek xetayin çin. Înay Qur’oniz von. Zafî dor xwi bes vînayîş, îhtîyaç însônôn bînon nîvînayîş sebêb heddi ra vejyayîş, şîyayîş dalalet. (Êleq:6-7) Aco ra însônîr lazim gweştariye Homê bik. Wa ina hol bî zonayîş . pîl biyayîş însôn Allah’îr nîz vindertişid.

Ma însôn, hêt viraştîşî ra çiqas holî ra nizdiv, o qas ma xiravîraz nîzd. Holîzî xiravîzî zerê mara vejyena. Zerê mad çendêk fîkr hol biven, o qas xiravîz, şeytonîz esta. (ŞEMS-7) însôn eger çi muqeddes qebûl nîker yira holî nîna, her tewir xiravî yena. Xiravî kerdiş her zeman holî kerdiş ra rehet. Çunkî însônêk vaj; ez bena merdim xirav, pîs, çiqmez, çikut qê in merdim geyretêk gerek nîken.


Bînamûsî namûsî ra zaf zaf rehet. Aco ra merdimekid dert exlaq o geyret çinîû, zonayîş yi têna yi hol nîken. İn sebeb ra qê însôn îmtîhon pîl, derheq exlaqîd.

Îna mucadeled însôn eşken biv pîlî pîlon, meleketon xwir heyron bik; weyaxud xwi bik rezîl rezîlon. (Tîn: 4-5) İn di meyl yanî halî wo xiravî

her însônîd esta derheq inyonid Allah û Te’ala ma serbest verda. Maç i perr biwaz Allah ma hewelnen a perr. (Nîsa:115) Peynîd, pê ‘emelon xwi ya ma xwi elever bîn yazî ma xwi tepa verdên. Îna mucadeled eger ma perr hol, xêr tercîh bik ma bizon Allah her daîm mar yardim ken. Cara eger yardim o Rehîmê Allah çinî bu ‘emrêk hol vîyarnayîş, xiravî ra dur vindertiş zaf zor. (Yusuf:53)

Îna mucadelê însônîd derba pîl inawa: însôn diravyê zerê yida, nîşinasn, sêr a xiravî biqefiln, bisetirn her daîm xwi me’sûm bivîn, vaj; xetêmi çinya. Zafî Însônôn ‘emelon holon nîsbet kên însônôn bînon (Nîsa:178) Dor hewali ken Homê (Fecr:15-16), doriz hewali ken şeyton (Îbrohîm:22) İn şekî zerrê xwi rehet ken. Heqîqetid sebêp in gwrîyon zafin însôn xwi bi xwiw.

Ma inay hol bi zon: Tebî’et mad holîz esta, xiravîz. Hetta ma inayra şermayen, ma xwi weş bişinasn, qusuron xwi bivîn tedawî bik daha hol ben. Ma xwi çendêk terbiye bik, o qas xuzur vînen, Homêr ben nîzd. Mad holî bi bû zîyed, ina holî mad bena exlaq daîmî, mendi. O weqt çe yo neêşken ma biçarn a hal xirav. Xiravî, çad holî çinî bû, o cad yena meydon.



Mela Ahmedê Xasî

✍ İbrahim Çabakçurî

Miyan millete mad gelek merdim pîl est. Labele pe seran û sera waxton xebatkarî yin çimon ra dûrî menda. Kayilti ma, ma in merdim û pîl alim û zonayi biyar ver çimo. Va yi xebatkarî, amelkarî, şuguliyayiş xwu ser biyen zonayiş. Alim mar sey çilay, yi raşnayı don nêzonayiş ma ser. Şeyh û alim ma dinê Huma'y ser gelek xebatye. Rej û şeb nêvat, dew dew, bajar bajar gêre û holi ser millet kerd şa; xirabî ra na millet dûr depeşt. Gera ma qedr u qiymet na pilon xwu bizan. Na merdim û alimon ra yew Mele Ahmedê Xasî'v.

Mela Ahmedê Xasî, demê peyinê paytaxtê Osmanli'd qeza Lije'd dewê Hêzan'id çim xwu ke a ina dunya'r. Tayê çimo'nid bahs Ahmedê Xasî'd yen vatiş: "Yi Palu'ra vejîye omey Lije. Vaxt ma'd dewê Xelon'id yev kiye est. Yin ra von "Key Xasûn"

Kijti xwu ra dersê Qur'an gurewt, yi cey babî xwu'd dest pêke dersê Erepkî. Medresa'd ilmê Îslam ser şuxulya. Yi icazê xwu Amed'id dest Seyda Xaci İbrahim ra gurewt. Waxtê Sultan Abdulhamid'id Amed'id Comi pil'id imamî kerd. Pasur'id miftiyî kerd. Bad inay ra şî Çabakçur. 1909'id vu û 12 heval yi pê dest İttihatçî semed tay çî diyê Divan-e Harp. 3 sêr Rodos'id fetilnayî mend. Labelê padişah newê (Vahyeddin) omay paytext, semed ina'ra gêrya a.

Derhaqê Ahmedê Xasî, ma des'id zaf melumat çinya. Ma ina eşkên vaj: "Mela Ahmed, zaf zonay'iv. Amrê xwu reya haq ser rêwîyarna. Âlim û amil'ib. Çî rey dawê Îslam'ra wet yew dawê'r ni xebatya. Ziwan Zazaki ser eser en verên yi nuşt. Yi Erepkî, Tirkî, Farskî, Kirmancî, Zazakî pi ser ponç zon zonen pe in zonan şîrî'z nuştê. Tayê eser pê dest mebusê Urfa Kemal Badilli semed tersê çend merdi-

mon xwu omey vinkerdîş. Temame virastişê Mewlidê Zazakî pe yardimê Xaliqî û feyz û bereketê pêxember ma (sellelahu 'aleyhî we 'ela alîhî we selem), pe destê Ahmedê Xasî Hêzanîj hezar û hîrê sey û şîyyes serre bi tarîxê Erebkî."

Mewlidê Xasî destpêkê edebîyatê Zazakî yo. Bi yew zono fesîh û sade omay nuştus. Bê mewlidî sewbîna zî eserê ey estê. Na mewlid şîyes qisim û hîrê sey hotay ponç beyte ra bi peya. Her rezê mewlid yondes hece'v.

Manaye Mewlid, ameyîşê dunya yê Hz. Muhammedî yo. Ê şîrê menzûmê ke eşqê ameyîşê dunya yê pêxamberî ma ser o nusîyey, înan ra von mewlid. Nizdî hezar ser ra nat mîyanê zafê milletanê Musluman'an de mewlid nusîyay. Mîyanê Kurdan de zî nusîyay. Mîyanê Kurdan de mewlido tewr namdar Mewlidê Mela Hesenê Bateyî yo. Zafê kirdan Mewlidê Bateyî wonenê. La mewlidanê Zazakî ra, yo tewr edebî û xorîn Mewlidê Zazakî yê Xasî yo. Hol bizon ey ra dima zî 4-5 hêb mewlidî nusîyay. Qismêkê yin binê tesîrê Xasî'd nusîyay. La heme hember yid ni mendê. Mewlidê Usman Efendî zî tede, çî mewlidêk bi qasê Mewlidê Zazakî'yê Xasî namdar nibiyo."

Xasî vatij xwu pe yew zono mîstîk sembolî şuxilnay. Mewlidê Xasî'd zaf zî xeyretê îsbatkerdişê Zazakî esto. Wazeno nîşan bido ke Zazakî çend dewlemend a. Xasî de hem eşq esto hem îrfan. Mesela, Xasî zaf qedr dano qeleme.

Homa en vernî qelem virazeno. Qeleme de qisey keno. Îna'ra dima qeleme don qiseykerdiş û pê qelem don nuştîş. Pe ina qayde Xasî, ma'z don zonayîş ki ma qedrê qeleme gera bizon. Mucadele pê qeleme, mucadele tirkewon'ra ver yena."

Nome in kitab, Mewludê Nebî. 1899'id Amed'id Matbaa-yê Litografya'd yen çapkerdiş. Mela Ahmedê Xasî 1951'd rasen rehîmê Huma'y, Huma yir zaf zaf rehîm bik.

Mewlîdê Nebî' ra yew qisim:

Ez pe bismîllahî îbtîda kena
Razîqê 'aman û xasan piya kena
Rebbî, hemd û şukrî ancax to rî bê
Kîbr û medh û fexrî pêro tor î bê
Çende rey bê ma sewabê hemdê ma
Labelê nêrê hîsaban çendê ma
Hemd û şukrê to eda qet nêbenê
Ma sera rebbî, tî zanê vînenê

هَمْ لَوْرَا اَمَ ژَبُو ژِيَانَا اَبَدِيَا بِي دَاوِي، ژِيَانَا آخِرَتِي رَه چِي بُونَه. هَاتِنَا مِيَا دُنْيَايِي ژَبُو يَدَسْتِخَسْتِنَا آخِرَتِي يَه. لَوْرَا دُنْيَا مَزَرَعَتَا آخِرَتِي يَه. اَمَ نَه ژَبُو ژِيَانَا دُنْيَايِي ژِيَانَا فَاِنِيَا بَدَاوِي رَه چِي بُونَه. وِي دَمِي نَه لَايَقِي مَه يَه كُو اَمَ ژِدُنْيَايِي حَسَ بِيكُنْ و لِرَحْتِيكَه تَمَامَ بِيكِرُنْ و دَمَا كُو ژِدَسْتِي مَه هَرَه لَبَرَبَكْفُنْ. نَحَاسَمَ كُو اَمَ ژَبُو وِي دِلِي اِنْسَانَا بِيهِيْلَن. بَلِي ژَبُو حَيَات و ژِيَانَا اَبَدِيَا آخِرَتِي هِيژَايَه كُو اَمَ هَر تَشْتِي بِيكُنْ، حَتَا هِيژَا يَه كُو اَمَ خَوَه فِدَا بِيكُنْ، وَلَوْ تَمَامِي اَهْلِي دُنْيَايِي بِيغِيْدَن.

لَوْرَا ژِيَانَا دُنْيَايِي قَلْبِه، وَكَه فَجَرَا دَرَوِيْنَه وَكَه رُونِي خُوِيَا دَكَه بَلِي كَلَك كَنَه وَ دِي پِي دَه طَارِيْتِيكَه دِژَوَار هِيَه. لِي بَلِي ژِيَانَا آخِرَتِي حَقَقِي يَه، وَكَه فَجَرَا صَادَقَه كُو بَرَاَسْتِي شَقَقَه يَه وَ بَرَاَسْتِي رُونِي لِي پِي تِي، رُوژَا حَيَاتِي لِي پِي هَلْتِي، بَشَرَطِي كُو عَمَلِي فَتَحَ هَاتِيَه كِرُنْ و بِيهَشْت هَاتِيَه حَق كِرُنْ.

هَمْ كُو اَمَ مُسْلِمَان بِن دِفِي كُو اَمَ حَاَزَر بِن هَر دَمَ ژَبُو هُجُومَا نِيَارِيْن اِسْلَامِي، كُو بَقُوتَا هَشَكَبَرِي بَسَر مَه دَه وَرَن و اَزِيْت بِيْدَن مَه؛ بِيَوَه كُو مَه بِيكِرُنْ و بِنَجَاف بِيكُنْ و زِنْدَانَا ژِمَه دَاكِرُنْ و مَه بِيكِرُنْ، دَا كُو مَه ژَقِيْمَت بِيخِيْن و دِشَخَصِيْن مَه دَه هِيْبَتَا اِسْلَامِي بِيشَكِيْن، هَمْ كُو هُجُومِي مَه بِيكُنْ بِيَزْمَان، بِيَوَه كُو اَفْتِرَا وَ نَبُوبِيژِيَا مَه دَه بِيْن و مَه لَبَر چَاْفِي عَامِي رَش بِيكُنْ.

چَوَا كُو ژِسَرِي سَر دَه اَمَ فَاْنَا تَقَا دِيْبِيْن و دِكْشِيْن. اَرِي، ژِدَسْتِيكَا تَارِيخَا اِنْسَانِيْتِي بِيَاْفِي مَه آدَمَ عَلَيْهِ السَّلَام مَه هَر جَوُر و جَفَا دِيْتِيَه ژِدَف و دَسْتِيْن شَيْطَانَان و هَقَالِيْن وَاْن. دِي هَر قَرْنِي دَه تَعْدَه وَ اَزِيْت لِه كِرَنَه نِيَارِيْن اِنْسَانَا وَ اِنْسَانِيْتِي؛ بَقُوتَا چَك و سِلَاحِيْن خَوَه وَ بِيَزْمَانِي خَوَه؛ بِيْدَرُو و اِفْتِرَا وَ نَبُوبِيژِيَا خَوَه وَ بِيحِيلَبَارِيْن خَوَه حَتَانِي اِيْرُو.

يَانِي اَمَ نَه غَرِيْبَن ژَفَان دَرْد و جَفَا وَ سِتْمَان رَه. اَو بَر دَوَامَه. هَر رُوژ اَمَ تِيْنَه گَزْتَن و هَر رُوژ اَفْتِرَائِيْن نُو لِه دَبَارَن و دَك و دُولَايِيْن نُو لِسَرِي مَه تِيْنَه بِيچَان. چَوَا كُو دَقَان رُوژِيْن بِيهَرِي دَه دِيْسَا پِيلَكَه دِژَوَار ژُظْلُم و دَرَوَا هَاتَه لِدَار خَسْتَن و بَسَر مَه دَه هَاتَه شَانْدَن و بَارَانْدَن. كَلَك لِحَالِي مَه تِي گُوتِنَا سِيْدَايِي سِيْدَ عَلِيِي فِنْدِيكِي رَحْمَةُ اللهِ عَلَيْهِ كُو گُوتِيَه:

مِنْ چِه دِيْتُ و چِه نَدِيْتُ و دِفِي عُمَرِي خَوَه بِي كِنْ
عَسْكَرِي دَرْد و غَمَا هَر دَمَ هُجُومَا تَه لِيْن

اَو وِي بَر دَوَامَ بَه حَتَانِي قِيَامَتِي، لَوْرَا - وَكِي كُو مَه گُوت-
اِمْتِحَان بَر دَوَامَه.

لِي بَلِي نَبِي نَبِي! تُو جَارَان غَمَكِيْن نَبَن! بِي اَمِيْد نَبَن!
نَبِيژَن: «مَا حَتَا كُنْگِي وِي وَهَابَه؟» وَ «كَلُو وِي چَوَا بَه حَالِي
مَه غَرِيْبَا؟» لَوْرَا خُدَايِي عَزْتِي وَهَا فَرْمَان دَكَه: «سِسْت نَبَن و
لَبَر نَكْفُنْ! كُو بَرَاَسْتِي هُون مُؤْمِن بِن اِي بِلِنْد و سَر دَسْت هَر
هُونَن» «آلِ عِمْرَان: ۱۳۹»

هَمْ لَوْرَا بِيغَمَبَرِي عَلِي جَنَاب عَلَيْهِ الصَّلَاةُ وَ السَّلَام كَرَم
كِرِيَه گُوتِيَه: «جَهَنَّم بِلَذْتُ و شَهْوَتَان، جَنَّت ژِي بِنَخُوشِيَان
وَ اَزِيْتَان هَاتِيَه نَحْمَانْدَن و هَاوِيَرَكِرَن» «بُخَارِي وَ مُسْلِم» هَمْ
گُوتِيَه: «دِيْنِي اِسْلَامِي غَرِيْب دَسْت پِي كِرِيَه وَ وِي غَرِيْب
فَكْرَه، مَزَكِيْن ژَغَرِيْبَان رَه يَه» «مُسْلِم»

بَرَاَسْتِي اَف هُجُومِيْن نِيَار و دِلْنَخَوَازِيْن اِسْلَامِي لَاهَلِي
اِسْلَامِي گَر چَقَاس جَان و دِلِيْن مَه دَايِشِيْن و كَزِيْن مَه
دِشَوْتِيْن، بَلِي بَاذْنَا رَبِي عَلَمِي نَتِيجه وَ دَاوِيَا وِي خَوَشَه. لَوْرَا
ژَوَان رَه شَرَه، گَنَه وَ جَزَائِيْن وَاْن پِي زِيْدَه دِيْن و عَذَابِي وَاْن
لِجَم خُدَايِي قَهَار دِژَوَار دِيَه، اَو ژِمَه رَه خِيْرَه؛ لَوْرَا يَان وِي بِيْنَه
كَفَارَتِيْن گَنَهِيْن بُهَرِي يَان وِي بِيْنَه وَ سِيْلَه ژَبُونَا مَرْتَبَتِيْن بِلِنْد
لِجَم خُدِي تَعَالِي وَا يَزِي وِي بِيْنَه وَ سِيْلَه ژَبُو هَشِيَارِي وَ لِحَوَه
هَايُونَا ژَغَفْلَتَان. بَرَاَسْتِي رَحْتِي جَارَانَا مُسْلِمَانَا سِسْت دَكَه وَ
بَرِي وَاْن دَدَه دُنْيَايِي كُو تَالُو كَا هَرِي مَرَن ژِمُسْلِمَانَا رَه آقَه، چَوَا
كُو اَبُو اَيُوبِي اَنْصَارِي رَضِي اللهُ عَنْهُ اَيْتَا ﴿وَلَا تُلْقُوا بِاَيْدِيكُمْ
اِلَى التَّهْلُكَةِ﴾ وَهَا مَعْنَه كِرِيَه.

وِي دَمِي اَف هُجُومِيْن بَدُزْمَنِيَايِي وَ غَدَار ظُلْمِيْن ژَالِي دِلْنَخَوَازَان
قَه، بَلِي فَضْل و كَرَمَن ژَالِي خُدَايِي عَادِل قَه، چَوَا دَمَا خَو لِيكِي
گِرَان دِيَه وَ شُغْلِيكِي وِي مِهْم و كَلَك گِرَنگ هِيَه دِفِي كُو وَرَه
هَشِيَار كِرَن. يَان نَا وِي اَو شُغْل بَقُوتَه، اَو كُو يَك وِي هَشِيَار بَكَه
ژِي دِفِي كُو وِي بَاش بِيهِيْزِيْنَه، دِيَه كُو خُدِي تَعَالِي ژِي فَا كُو مَه
هَشِيَار بَكَه، ژَبَر وِي قَاسِي هَنَكِي مَه هَزَانْد دَا كُو اَمَ بِيْتَر لَشُغْلِي
خَوَه بِي كَلَك گِرَنگ كُو حَيَتَا سَر مَدِي يَه بِيژْدَن. نَخَوَه:

«اَمَ طَالِبِي جَنَّتِيْن كَافِر تَف بِي مَنَّتِيْن»

اَو اَمَ هَر دَمَ دِيْژِيْن و اَمِي دِيْسَا بِيْژِيْن: «خُدَا هِيَه غَم تَنَه يَه»،
«الْحَمْدُ لِلّٰهِ عَلَى كُلِّ حَالٍ» وَ «الْحَمْدُ لِلّٰهِ عَلَى نِعْمَةِ الْاِيْمَانِ
وَ الْاِسْلَامِ»



إِيمَانُ بِزُوتِي آگَرِه

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

ژَدَسْتِي مَه هَرَه. دِفِي كُو آم ژِيرَه حَاَزَر بِن. هَم كُو زَارُو بِن مَه هِن لَبَر دِلِي مَه كَلَك شِيرِين، اَو بَتَرِيَا وَانْ وَ نَفَقِي وَانْ رَه، نَخَاسَم بَدُنِيَا وَانْ رَه آم كَلَك لَالِزِي بِن، ژُبُونَا وَانْ مَه بِي حَد مَحْنَت كِشَانْدِيَه وَ بَهَنَكِي دِن ژِي دَابَه كِشَانْدِن، حَتَا كُو ژُبُو وَانْ مَه دِلِي دِي وَ بَاف وَ بَرَا وَ مَرَفَان ژِي هِشْتِيَه! هَر دَم دِيَه كُو آم وَانْ وَنَدَا بِيَكِن، دِفِي كُو آم ژِيرَه حَاَزَر بِن. اَو هَر دَم دِيَه كُو آم بَهَاوَ اِكِي وَ بَسْبِيَكِي ژَسْبَان كُونِي حَيَاتِي ژَهُولِي رَاكِن وَ ژُفِي دُنْيَا بِي بَار كِن.

دِفِي كُو آم هَر دَم ژِفَان تَفَا رَه حَاَزَر بِن وَ لِكَار بِن. لَوَرَا آم نَزَان قَاصِدِي خُدِي وَ چِه كَافِي وَرَه وَ اَمَانْتِي وَ بَسْتِيَنَه. يَانِي كُو آم ژِي مُؤْمِن وَ مُسْلِمَان بِن دِفِي كُو تُو دَمِي آم كَيْفَا خَوَه ژِدُنْيَا بِي رَه، ژُزِيَان وَ سَرَوَت وَ پَرَتَالِين دُنْيَا بِي رَه نَبِن، بِيَجَافِي وَارِي دَائِمِي وَ مُلْكِي حَقِيقِي لِدُنْيَا بِي وَ پَرَتَالِين دُنْيَا بِي نَبِرِن. دَا كُو مُصِيبَت وَ قَوِيَتِي بِيَن كُو بَسَرِي مَه دَه وَرِن زِيدَه مَه ژِحَال نَخِن وَ لِهَق شَاش نَكِن.

لَوَرَا مَال وَ جَانِي مَه هَر دَم آمَادَه دَه ژَهَلَاكِي رَه چَوَا كُو نَبِيِي دِي شَان مُحَمَّد مُصْطَفِي صَلَّي اللَّهُ عَلَيْهِ وَسَلَّمَ گُوتِيَه: «لِدُوا لِلْمَوْتِ وَابْنُوا لِلْخَرَابِ. يَانِي بُولِدَن دَا كُو هُون بَمِرَن وَ آفَا بِيَكِن دَا كُو خَرَا بَنَه» هَم چَوَا كُو پِيشِيَا گُوتِنَه «إِنْسَانُ بَزُرِي مَوْتِي يَه!»

خُدِي تَعَالَى فَرْمَان كَرِيَه وَهَا گُوتِيَه: ﴿لَتَبْلُوُنَّ فِي أَمْوَالِكُمْ وَأَنفُسِكُمْ وَلَتَسْمَعُنَّ مِنَ الَّذِينَ أُوتُوا الْكِتَابَ مِنْ قَبْلِكُمْ وَمِنَ الَّذِينَ أَشْرَكُوا أَذًى كَثِيرًا وَإِنْ تَصْبِرُوا وَتَتَّقُوا فَإِنَّ ذَلِكَ مِنْ عَزْمِ الْأُمُورِ﴾ «آلِ عِمْرَان ١٨٦»

«(گُلي وَانْ كَسِين كُو اِيْمَان آيِنَه!) مُحَقَق هُونِي دِ مَال وَ جَانِين خَوَه دَه وَرِن اِمْتِحَان كِرِن، اَو مُحَقَق هُونِي ژ وَانْ (يَهُودِي وَ فِلَه ثِين) كُو كِتَاب هَاتِيَه دَا بِن ژَوَان رَه دِ بَرِيَا وَه دَه وَ ژُشْرِيَكَا كَلَك اَزِيَت بِنَهِيَزِن. كُو هُون صَبِر وَ تَقَوَا بِي بِيَكِن مُحَقَق أَفْ ژَحَقِيَقَتَا اِيْمَانِي يَه.»

اَو چَاغ كَسِين مُؤْمِن، ژَوَان رَه رَحْتِي وَ خَوَشِي دِدُنْيَا بِي دَه تَنَه، اَو كُو آم مُؤْمِن بِن ژَمَه رَه ژِي تَنَه. دِفِي كُو آم هَر دَم ژَهَر تِشْتِي رَه، ژَهَر تَالِي وَ نَخَوَشِي بِي رَه حَاَزَر بِن. لَوَرَا دُنْيَا وَارِي اِمْتِحَانِي يَه، وَ هَر دَم مَال وَ جَانِين مَه هَدَفِن ژَامْتِحَانِي رَه، كَنِكِي وَ بِيَجَه هَاوِي وَ اِمْتِحَان چِي بِيَه آم نَزَان;

مَثَلَا كُو خَانِيَكِي مَه هَبَه وَ بِيَكَلَك اَزِيَت وَ جَفَا مَه ژَخَوَه رَه لِيگُورَا دِلِي خَوَه آفَا كَرِيَه، وَ مَه ژِي حَس كَرِيَه، هَر دَم دِيَه كُو بَهَاوَ اِكِي ژَدَسْتِي مَه هَرَه، دِفِي كُو آم ژِيرَه حَاَزَر بِن.

هَم كُو تِجَارَتَك مَه هَبَه وَ بِيَكَلَك كُل وَ كَدَر مَه وَ سَرَرَا سَت كَرِيَه! سَاژ كَرِيَه، ژُبُونِي وَ مَه بِيَكَلَك اِنْسَانَا رَه پَشْچُون كَرِيَه! ژُكَلَك يَار وَ هَفَالَان دِلْسَار وَ دُور بُو بِن! هَر دَم دِيَه كُو بَهَاوَ اِكِي

لَسِنْ اَهْلِي اِيْمَانِي

اَمِنْ اَهْلِي اِيْمَانِي اَمِنْ اَهْلِي قُرْآنِي
 مَه نَافْ دَايَه لَجِيهَانِي مَه دَنُگ دَايَه لَجِيهَانِي
 اِسْلَام اَمْنِيَّت اِي كُفْرُو ظُلْم هِلَانِي
 هِدَايَه شَفَقْت اِي عِدَالْت هَات دِيَوَانِي
 پُرسَامَه ژَشَامِي بِيكُن تَارِيخِي تَفْتِيش بِيكُن
 عِدَالْتِي كَفَش بِيكُن بِنِي عِلْمُو عِرْفَانِي
 مِصْرُو عِرَاقُو لُبْنَان پُرسَامَه هُون كُن ژَوَان
 اَم زَانِن اَهْلِي اِيْمَان حَق اَيْنَه مِيدَانِي
 خُونَامَه اَرْض عَزِيز كَرشِيْدَان جِه قَمِيَز كَر
 شَرَعِي عَالَم تَسْلِيْم كِرْمَه حَق اِي عِيَانِي
 مَه بَان كَر اَهْلِي دُنْيَاژَهْمِي اَقْطَارُوجِيَا
 دَرَكْتَن هُون ژَبَن پِيَا بِيَن تَسْلِيْم قُرْآنِي
 اِسْلَام مُسَاوَات دَانِي عِلْمُو عِرْفَان بُوكَانِي
 رَحْمُو عِدَالْت اِي وَقْتِي ظُلْمُو طُغْيَانِي
 مَه دِل سَاغَر بَايْمَانِي مَه عَمَلَكِر بَقْرَانِي
 عَدِل رَابُو مِيَزَانِي وَقْتِي تَعْدَاو عِصْيَانِي
 اِيْمَان قُوْتَامَه يَه اِسْلَام عِزَّتَا مَه يَه
 رَبِّي مَه لِيْشْتَامَه يَه مَه دَسْت اَقِيَّت قُرْآنِي
 مَه نَفْسَاخُو هَفْسَار كِرْمَه تَسْلِيْمِي قُرْآن كَر
 مَه تَقْوَى ژِدَل پِيْدَا كِرَام بُون اَهْلِي وَجْدَانِي
 مَه چَاڅِي خُوَه گُوَهِي خُوَه زِمَانِي خُوَه دَسْتِي خُوَه
 لِنِگِي خُوَه هَم قَلْبِي خُوَه مَه دَايَه دَسْت اِيْمَانِي
 اِمَامِي مَه قُرْآنَه شَهَادَت ژُخُوَه ژِيَانَه
 رُوحي مَه هَر قُرْبَانَه ژُبُوَا سِلَامُو قُرْآن

اِبْرَاهِيْم تِيْمُوْر تَاش

بَلَاغَتَا زِمَانِي خُوِيَه. قُوْتَا بَيَانِي بِيْهِنْد كَاي قَانْدِي قُوْتَا
 سِيْلَحِي يَه. تَمَامِي زِمَانَان اَيْتِي خُوْدَانَه اَوْ قُوْتَا جَذَب كِرْنِي
 دُوَاْنْدَه هِيَه. خُوْدَا زِمَانِي كُرْدِي دَايَه مَه ژَبُو اَم بَقُوْتَا فِي
 زِمَانِي خَذْمَت بِيكُن. گُوْتِنَا «مَقْصَد گِهَانْدِنَا مَسَاژِي
 يَه، پِشْتِي گُو اِنْسَانَا ژَمَه فَاَم كَر زِمَان جَوَابَه ژِي دَبَه» نَه
 فَهْمَبَرِيَكِه رَاسْتَه. مَسَاژَا مَه چِه قَاس رَاسْت و حَق بَه ژِي
 گُو اَم بَزِمَانِيَكِي نَه خُوَشِكُو پَرْتِي بِيژِن، لَالِي دِن مَسَاژَا
 بَاطِل بَزِمَانِيَكِي بَلِيغ وَرَه اِفَادَه كِرْن وِي اِنْسَان بِيْتَر مِيْلَا
 وِي بِيكُن. يَك ژ مَشْكِلَاتِي دَعُوَا اِسْلَامِي ژِي اَفَه. گُو
 جَاژِيْتِيَا زِمَانِي كُرْدِي دِدَسْتِي غَيْرِي مَه دَه وَرَه بَكَار كِرْن
 وِي بِيَه سَبَبِي شَمِطَانْدِنَا اِنْسَانِي مَه. دِدَايِنَا اخْلَاقِي،
 طَبِيْعَتِي، هِيْنَبُونِيَكِي ژَانْسَانِيَكِي رَه گُو اَم تِيْدَه دَتَعِيْن
 بِيخُوْنْدِنَا بَرَهْمِيَكِي اَدَبِي وِي اِنْسَانِي فِي اخْلَاق و طَبِيْعَتِي
 بِيْبِرِي كَسْب دِكِه و دَخَه حَيَاتَا خُوَه. زِمَانِي كُرْدِي نَه
 بُوِيَه رَوَاج لِي بَلِي نَه هِنْدَك مِيْنْدَكِه ژِي. حَتَا -چَوَا گُو
 هُنْمِنْدِي زِمَان دِيْبِيژِن- گُو ژِمَانِي فَاَرِسِي نَه لِيْشْتَر بَه نَه
 لِيَاشْتَرَه اَوْ ژِي زَنگِيْنْتَرَه ژِي. بَرَهْمِي كُرْدِي دَانَه نِيْشَانْدَان
 گُو زِمَانِي كُرْدِي زِمَانِي عِلْم و اَدَبِيَاتِي يَه. وَك دِيَوَانَا مَلَاي
 جَزَرِي، قَصِيْدِيْن فَقِي طَيَرَا، مُم و زِيْن اَوْ مَوْلُوْدَا بَاتَهِي و
 سَاْعَز اِي گُو مَشْهُور نَه بُونَه. دُوَسْت و دُژْمِن تَف لِفَانَا
 حَيَرَان مَانَه اَوْ هِنَك خِيَر نَه خُوَاژ و مُرْتَدَان دَحِيْبَتِن ژَبُونَا گُو
 فَاَن بَرَهْمَان ژَبُو مَقْصِيْدِي خُوِي شَيْطَانِي بِيخِيْطِيْن.

لَالِيَكِي شَعْر و بَرَهْمِيْن هِنَك اِنْسَانِي نَه قَنُج بَسَبَب
 گُو بَلِيغِن اَم دِنِرُن كِيْفَا گَلِكِي مُسْلِمَانَا ژَوَان و بَرَهْمِي وَاَن
 رَه تِي، بَسَبَب گُو شَعْرِي وَاَن دِيخُوِيْن دِيْفَكِرِي وَاَن مُسْلِمَانَا
 دَه تَقْلِيْهِي ژِي چِي دَبَه. لَالِي دِن وَك مُم و زِيْن و بَرَهْمِي
 وَك وِي اِسْلَامِي اَدَبِي لَبَا تَمَامِي اِي عِلَاقَدَارِي بَزِمَان هِنَه گُو
 هِنَك ژَفَان كَسَا مُخَالِفِي شِيخِي خَانِيُو هَقَالِيْن وِي نَه ژِي.
 حَتَا فَاَن بَرَهْمِي اِسْلَامِي لِيْگُوْر بَاوَرِيَا خُوِي شَاش تَاوِيل دِيْكُن
 و دِيْن سَبَبِي خَرَابُونَا فِكْر و عَقِيْدَا اِنْسَانِي مَه ي هَامِي تَام.
 گُو اَم لِيْشِي مِيْرَانِي خُوْدِي دَرَنَكْتَن، زِمَانِي گُو خُوْدَاي تَعَالِي
 گَرَانْدِيَه ژَايِيْتِن خُوَه اَم ژُقُوْتَا بَلَاغَتَا وِي غَاْفِل بِيْمِيْن وِي زِمَانِي
 مَه بِيْتَمَامِي بِيَه وَاسِطَا فِتْنَه و فَسَادِي دِدَسْتِي مُفْسِدَاَدَه.



زِمَانِي كُرْدِي

ژ چە ره دبە

عبدالصمد حلمي

كُلْتَرَا مِلَّتَانِ فِيمُ وَ هِينْ بِيكُنْ كَلَكْ خَبَاتُ وَ مَسْرَفُ كِرَنه
أَوْ آرَشِيْقَا چِيكِرَنه. چَوَا كُو أَم دَبِينْ هِنَكْ إِنْسَانُ ژُبُونَا
أَدَبِيَّاتُ وَ تَارِيخَا مِلَّتِي خُوَه هِينْ بِيكُنْ دِجَن لَأَوْرُوبَا يَانْ
ژِي لَعَمَرِيْقَا مَاسْتَرُ وَ تَخْصِيْلَا أَقَادَمِيكْ دِيكُنْ، ژِعَالَمِيْن وَانْ
دَرَسَا زِمَانِي خُوَه دِسْتِيْن.

چَوَا كُو زِمَانِ دِيْنُ وَ كُلْتَرِي هِلْدِ كَرَه عَكْسِي فَيِ ژِي
مُمْكَنه، يَانِي كُلْتَرُ ژِي زِمَانِ هِلْدِ كَرَه أَوْ لِكُورُ خُوَه زِمَانِ
دَخَه عِيَارَكِي أَوْ مُحَافَظَه دَكه. زِمَانِي كُرْدِي زِمَانَكِي
كُلْتَرَا إِسْلَامِيَه، وَقْتَا كُو بِيْزِمَانِي كُرْدِي كُلْتَرَا غَرِيْبَا وَرَه
نَفِيْسَانْدُنْ وَ كُلْتَرَا إِسْلَامِي نَه يِ نَفِيْسَانْدُنْ وَ يِ زِمَانِ بَبَه
آلَتِي هُجُومِي دِدَسْتِي غَرِيْبَانْ دَه، وَكْ أَوْلَادِي كُو بَافِي
خُوَه ژِيْبِرَكِرِيَه نَاسْ نَاكَه بَطْنَا كُو دِزْمِيْنِي وَيَه ژُبُو كَشْتِيْنِي
هُجُومِي سَر دَكه. حَتَّانِي اِيْرُو زِمَانِي كُرْدِي دِكُرْدِسْتَانِي
هَاتِيَه آخْبَانْدُنْ، لِي بَلِي خُوَشِكِرْ دِمْدَرَسَا وَ نَافْ أَهْلِيْن
مَدْرَسَا دَه هَاتِيَه آخْبَانْدُنْ، چِمَكِي جِهِي كُوتِيْدَه هَاتِيَه
سَارُومَانِكِرْنْ مَدْرَسَه بَتِيْنِه. بَفِي جِهَتِي ژِي كُرْدُ وَ زِمَانِي
خُوَه مِئْتَدَارِنْ ژِ مَدْرَسَا رَه.

مُعْجَزَا رَسُوْلُ اللهِ صَلَّى اللهُ عَلَيْهِ وَسَلَّمَ قُرْآنَه كُو بِيْيَانْ
وَ بَلَاعَتَا وَ يِ كَلَكْ إِنْسَانِي وَ يِ دَوْرِي وَكْ حَزْرَتِي عُمَرُ
مُسْلِمَانْ بُونَه، كَلَكَا ژِي بَسَبَبْ كُو پِيْر دَرَنه كَتِنه
سَرِي دَسْتُ آفِيْتِنه شُور. مُعْجَزُوبُونَا بَلَاعَتَا قُرْآنِي دَدَه
نِيْشَانْدَانْ كُو وَ يِ دَاخِرْ زِمَانْدَه بِيْيَانْ وَ بَلَاعَتْ دِرَوَاجِي
دَه بِن. پِيْشَقُچُونَا إِنْسَانُ وَ مِلَّتَانْ بَرِيَا هَر تَشْتِي بَهِيْنِكِرْنَا

زِمَانِي هَر مِلَّتِي چَانْدِي وَ كُلْتَرَا مِلَّتِي خُوَه هِلْدِ كَرَه
أَوْ دِنَافَا خُوَدَه مُحَافَظَه دَكه. بَفِي جِهَتِي زِمَانِ چَانْدِي
وَ عُرْفُ وَ أَخْلَاقُ وَ طَبِيعَتُ وَ تَارِيخُ وَ فِيمَبَرَا مِلَّتِي خُوَه
دَدَه نِيْشَانْدَانْ وَ مَه پِي دِحْسِيْنه. قَانْ خُصُوصِيَّتَا دِبَرَهْمُ
وَ كِتِيْبِيْنْ هُنَرْمَنْدِي زِمَانْ، نَفِيْسَكَاَرُ وَ عَالِمَانْدَه پَر خُوَشِكْ
جِي كِرْتِنه. هَر مِلَّتْ ژِيْرَهْمُ وَ كِتِيْبِيْنْ خُوَه هَمْ عِلْمُ وَ
أَخْلَاقُ هَمْ ژِي زِمَانُ وَ أَدَبِيَّاتُ وَ تَارِيخَا خُوَه هِينْ دَكه.
وَقْتَا كُو زِمَانِ بَهِيْنَكِي يَانْ ژِي بَتَمَامِي وَرَه ژِيْبِر كِرْنْ يَانْ
ژِي كَلِمِي وَي وَرَنْ گَهَرْتِنْ يَانْ ژِي بَدَرَبَاسُوبُونَا زِمَانِ ژِيْر
إِحْتِيَاْجِيَا بِيْشَقُچُونُو خُوَه نُوكِرْنَا دِزِمَانْدَه أَسَاسِيْن وَي نَه
بِيْنْ مُحَافَظَه كِرْنْ وَي كُلْتَرُو فِيمَبَرُ وَ عُرْفُ وَ عَادَتِي فَيِ
مِلَّتِي ژِي خَرَابَه يَانْ ژِي وَنْدَا بَبَه. اِيْدِي زِمَانِ نِيكَاَرَه
وَظِيْفَا خُوَه بِيكَاَر بِيْنه، نَسْلَا كَشْنُ وَ نُو نِيكَاَرِنْ مَقْصِدِي
خُوَه بَهْفُ بِيْدَنْ فِيمُ كِرْنْ، هِيْدِي هِيْدِي وَي ژَهْفُ بَقُطُنْ وَ
مِلَّتْ بَقْلِيْشَه. چِمَكِي زِمَانُ وَ چَانْدِي وَكْ گُوشْتُ وَ نُنُوكِي
دِنَافَهْقَدْنَه، مَرَفْ وَانْ ژَهْفُ بَقُطِيْنه وَي هَرْدُو ژِي وَرْگِرْنْ.

زِمَانِي كُرْدِي زِمَانِي كُلْتَرَا كُرْدَايَه، كُلْتَرَا كُرْدَا ژِي
إِسْلَامَه. كَافَا بِيْشَقُچُونَا زِمَانِ مُسْلِمَانْ عِلَاقَه نَه كِنْ
بِيْشَقُچُونَا زِمَانَقَه أَوْ فَي صَحَايِ ژِغَرِيْبُ وَ غَرِيْبَا رَه قَالَا
بِهِيْلِنْ وَي كُلْتَرَا مَه يِ إِسْلَامِي ژِي وَرَه گَهَرْتِنْ بَا غَرِيْبَا.
چَوَا كُو دَهَر تَشْتِي دَه نَافَكَا نَزْمُكْ وَ نَقْطَا زَعِيْفْ هِيَه
دِمِلَّتَادَه ژِي نَافَكَا نَزْمُكْ هِيَه، أَوْ ژِي زِمَانَه. لُومَا وَكْ
دُولِيْنْ أَوْرُوبَا دُولِيْنْ كُو بِيْشَقُه چُونَه ژُبُونَا كُو زِمَانُ وَ

BEXÇÊ



Zozan



Asîman



Deşt



ZAROKA



Behr



Heyv



Tav



Çiya



Îslam Hat Vî Diyarî

✍ Zînnûr Zivingî

Pey şevê reş û tarî
Kerema rebbê barî
Rabu zulm û zordarî
Îslam hat vî diyarî

Destê eshabê kîram
Îyaz bu j-wan re îmam
Heşt hezar bun Musluman
Îslam hat vî diyarî

Piştî pênc meh sekinîn
Sebirkirin ne fitlîn
Xweda ew dane kenîn
Îslam hat vî diyarî


J-destê Romiyê geddar
Agirperestê neyyar
Azad bun hemî gemxwar
Îslam hat vî diyarî

Millet naskir rebbê xwe
Raziq û xwediyê xwe
Qasidê xaliqê xwe
Îslam hat vî diyarî


Êdî bû kêf û şahî
Bi tekbîra felahî
Hate sulh û selahî
Îslam hat vî diyarî

Çîreta teyrê bazan
Bilind bû dengê azan
Şiyar bibin bes razan
Îslam hat vî diyarî

Îslam tu bi xêr hatî
Ser ser û çava hatî
Ji me ra tu xelatî
Îslam hat vî diyarî



Rebbê me yek e.



بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

Ez ketim nav xîl û xeyala
Min xwe berda guhê bajara
Min pirsî ji sofî û dîndara
Teva gote min: Rebbê me yek e.

Rebbê me yek e rebbê me yek e
Rehma wî pir zehf û gelek e

Min pirsî ji gulên biharê
Min pirsî ji reşa êvarê
Min pirsî ji fêkiyê darê
Teva gote min: Rebbê me yek e.

Rebbê me yek e rebbê me yek e
Rehma wî pir zehf û gelek e

Min pirsî tava nav rojê
Min pirsî dilê disojê
Min pirsî agirê dojê
Teva gote min: Rebbê me yek e.

Rebbê me yek e rebbê me yek e
Rehma wî pir zehf û gelek e

Min pirsî j-pitikê şêrîn
Min pirsî ciwanê-b evîn
Min pirsî-j kalê-b yeqîn
Teva gote min: Rebbê me yek e.

Rebbê me yek e rebbê me yek e
Rehma wî pir zehf û gelek e

Min pirsî-j sitêrê ezman
Min pirsî-j masiyê çeman
Min pirsî-j kuliye çolan
Teva gote min: Rebbê me yek e.

Rebbê me yek e rebbê me yek e
Rehma wî pir zehf û gelek e

Furqan

✍ Azad Rébiwar

Di spêda temenê xwe de
Xwîn nîqutî
Temberiya teyî nûşehkirî.
Ji çî re qurnêfilek sorçilmisî
Li hawîdor divedê
Da geş bikê bangewaziya teyî
Her heyî.

Ê ku ji dilpakiya te
Şikê dîkin
Ê bêjin
Tu çî çivîkekî sersarî
Û her tim dixwaze li têlsincika wenise.
Nizanin ku hişyarkerekî heşkere hatiye
Guleke ji êgir berdaye kefa destê me

Tu bişînek e
Dimilmilê aniha
Bi ava Bahra Spî re.

Li Ser Me

✍ Mustefa Rêzan

Dengekî heqiyê derket ji Pîran
Qîr da ser av û axa gulîstan
Mirov hinek ker û kor man wek hovan
Girtibu wan eşqa meqam û peran

Li ser pêşeroja xwe nefikirîn
Armanç çibu bêje birayê şêrîn

Fikirandin karê aqilmenda ye
Ne ji hov û bêujdanê wiha ye

Ev xebata vî de'wa pir giran e
Berxwedana Seîd û Eyyuba ne

Li şevreşekî ez ketim xeyalan
Her der geriyam sikûr û newalan

Tîrê şevreşê me kir parî parî
Girte me her dor neteweperwerî

Ser ummet girte ewrê reş û tarî
Bes e ev halê feqîrî û jarî

Bihara ummetê hat li her warî
Bi rehma Xweda rabe koledarî

Ser Way û Birayê

✍ Ūnis Pîronî

‘Elîyu welîyu, derzey telîyu. Nonê gēlîyu, sifrew sînîyu, zeynetî keyiyu teli veşa e’lî kişya moneymî kerefya mi şikrî xu alayra e alla’y kederî mîd ona kerd ez ik vono laîlaheîllallah mihemmed resullalla dînyaymi bena heray. Ez roj bermeno şew dîşmîş beno ez ik şew rawkeno hewn ‘î xu di yew hewn veyneno ez von kay ez ha hewara fireno e cay e’lî xu veyneno. Cay e’lîmî rindu e zav keyf keno. E şew roj derî die’y keno ez rojonî xu paweno veyno key heqîyaymî yena. Ez pabey rehmay alay vîndeno ez herkesra helaley wazeno ez e’zab hesabra terseno . ay hewaru way hewaru rehmay Alla’ marî y varu . ma nîmonî bîkesu bîwarî Alla tî ma nî finî peynîyay şarî tî ma nîkî mîşaketî îmbazo. e venday Alay corînî dono. Alla bîdu ma axîre tu îmonu e feqîro nezono e çî nîzono venday Alay dono. şew şona nîmey şewono ez kkuweno hewno mîyonu . ez hewnî xu şewra nî vono Alay mî Alay mî ez heyrono tî akî berî xeyronu .bîra venday wayxu donu. Bîraymî vonu ma şîrî fekî berî xestonu bîraymî heyron çî zemonu payîz dîreyau zimistonu va u varo ver pî donu bîraymî heyro çî wextonu von atew e şenîko nîzono e e’n tura perseno tura vono. Mî va bîraymî zonî zimistonu gunekî warî derdonu şewî zimistonî sey seronî derdu kulî kî ver pî donî şîrîney yay way biray çî dî çînyu

Ustad Bedî'uzzeman

Dengê Ûmmeta Îslam

Ey 'alimê qehreman
Ey dahiyê bar giran
Ey rewşena ser cîhan
Ustad Bedî'uzzeman

Mizgîn li te ey betil
De'wa teyê bê misil
Me xistine can û dil
Ustad Bedî'uzzeman

Rîsalê wey tevde nûr
Me-d vê rîya zor û dûr
Pê girtiye gir û hûr
Ustad Bedî'uzzeman

Ew tovê ku we reşand
Şin bûye sumbul derand
Zana teva ew heband
Ustad Bedî'uzzeman

Medresê Yusufî tev
Me tije kir ta bi dev
Dersa dîkin roj û şev
Ustad Bedî'uzzeman

Mizgînê ku we dida
Wek rojê yek yek veda
Îslam bû en gur seda
Ustad Bedî'uzzeman

Ew Bolşevîkên ğedar
Ji hevdû bun tarûmar
Zistan çû va hat bihar
Ustad Bedî'uzzeman

Em Se'îd û Hemze ne
Mizgîna peyvê we ne
Ev gul ji wer hedyê ne
Ustad Bedî'uzzeman



Salat Ser Nebiye Xatem

Mela Mizgîn

*Bi qasî zerreyên 'alem
Melek cinn û ben-î Adem
Ber û dar û giya û lem
Salat ser Nebiyê Xatem
Selam ser Rehberê 'alem*

*Salatullah selamullah
Bibarin ser resulullah
Salatullah selamullah
Bibarin ser hebîbullah
Salatullah selamullah
Bibarin ser nebiyullah
Muhammed nebiyê xatem
Reîs û rehber û heq şah*

*Bi qasî pêlê deryaya
Bi qasî 'ilmê seydaya
Bi qasî meqsed û ğaya
Salat ser Nebiyê Xatem
Selam ser Rehberê 'alem*

*Bi qasî derd û dermana
Ken û şîn û xebardana
Kul û nal û ğem û jana
Salat ser Nebiyê Xatem
Selam ser Rehberê 'alem*

*Bi qasî girtiyên hebsa
Bi qasî xwendin û dera
Bi qasî de'we û pirsar
Salat ser Nebiyê Xatem
Selam ser Rehberê 'alem*

*Bi qasî durr û mircana
Perî hurî û wîldana
Firaq û tas û fîncana
Salat ser Nebiyê Xatem
Selam ser Rehberê 'alem*

*Bi qasî masiyên behra
Bi qasî sîlika sehra
Jimar û tevgera zerra
Salat ser Nebiyê Xatem
Selam ser Rehberê 'alem*

*Bi qasî herfê kîtaba
Sahîfe kağız û qaba
Jimar û mebhêş û baba
Salat ser Nebiyê Xatem
Selam ser Rehberê 'alem*

*Bi qasî zikrê ên zakir
Bi qasî şukrê ên şakir
Bi qasî ni'metên Qadir
Salat ser Nebiyê Xatem
Selam ser Rehberê 'alem*

*Bi qasî gul û gulzara
Kulîlk û gulşen û xara
Devî û dehl û satara
Salat ser Nebiyê Xatem
Selam ser Rehberê 'alem*

*Bi qasî berfa zistana
Pelên gull û gulîstana
Petîxên werz û bîstana
Salat ser Nebiyê Xatem
Selam ser Rehberê 'alem*

*Bi qasî çûkê nav dehla
Kulî zerzurê ser dexla
Temamê teyrik û şekla
Salat ser Nebiyê Xatem
Selam ser Rehberê 'alem*

*Bi qasî ba û barana
Libê teyrok û şarana
Sitêr û peykê ezmana
Salat ser Nebiyê Xatem
Selam ser Rehberê 'alem*

*Salatullah selamullah
Bibarin ser resulullah
Salatullah selamullah
Bibarin ser hebîbullah
Salatullah selamullah
Bibarin ser nebiyullah
Muhammed nebiyê xatem
Reîs û rehber û heq şah*